

ABONE ŞERHATI		
MÜDDET:	1 SAHİL İÇİN	BASIK ÜÇÜ
Senelik	1400 Kr.	2700 Kr.
6 Aylik	750 Kr.	1450 Kr.
3 Aylik	400 Kr.	800 Kr.

Neşası her yerde  
= 5 Kurastur =

## İrânîler Daralıyor

### Şakiler ihata ediliyor!

Alınan tedabir tam ve mükemmeldir

İrân hudut amirleri eşkiya-ya her türlü yardımı göstermekte devam ediyorlar



#### Vaziyet

Ankara 7 (Telefonla) — Bu rıza gelen son malûmata göre Ağrı dağıdaki tenkil barekâtı müddetli devam etmektedir. Saha tarafında tekefil ediler tayya ve silahların bombardımanları ve kışkırtmaların yürütüldüğü anda şakiler mütemadiyen göçmeğe ve çok telefât vermekteler. Bunların bulundukları ve askerlerimiz tarafından ihata edilmiş olan saha mütemadiyen köçülüşte, muhasara çemberi altına girmiş durumda kalmıştır.

Vaziyet tavarruza doğru gidiyor, iki güne kadar kat'î bir şekilde ahısınan yoldaki tedbirler tamamile inkişaf etmiş olacaktır.

Alınan tedabir tam ve mükemmeldir. Bütün eşkiyaların tenkil kat'î edediliyor.

Van 6 (A.A.) — (Hususî me-)

İrân hükûmeti notamıza hâlâ cevap vermedi



# Naverok

Sal 4 • Hejmar 14 • Havîn 1998

---

Peydabûn û bingehê nasyonalîzma Kurd li Îranê II 3

Dr. Ebbas Welî

Bi Kendal Nezan ra hevpeyvîn 11

Laleş Qaso

Edebiyat û teorî 23

N. Zaxuranî

Dîsa 28

Lezgîn Salih

Sed sal têkoşîna nivîskî 29

Malmîsanij

Însanek tê dinê 36

Maksîm Gorkî

Ji bo her pirtûkekê gulek 47

Mustafa Aydogan

Kurd di berhema Îbn Xeldûn de 55

Emîn Narozi

Mitîngên sala 1967an 65

Zinar Soran

Di medya tirkî de karîkaturîzekirina serhildana (1930î) 78

Rohat Alakom

Helbestek Cegerxwîn î veşirtî 93

Hemît Kiliçaslan

Sal 4  
Hejmar 14  
Havîn 1998

Xwedî

Komeleya Nivîskarên Kurd  
li Swêdê

Redaksiyon

Laleş Qaso  
A. Gernas  
Zinar Soran  
Cemal Batun

Şertên abonetiye

Salek: 200 SEK  
Niv sal: 100 SEK  
Hejmarek: 50 SEK  
*Ji bo welatên din mesrefa  
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan

Rûpelek: 1 000 SEK  
Niv rûpel: 500 SEK  
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan

A. Gernas

Rismê bergê pêşî

Ji rojnameya Cumhuriyet  
8.7.1930

Postgiro

46 32 31-1

ISSN

1400-528X

Çap

Apec-Tryck

---

Navnîşan • Adres • Adress:  
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

karakterê dualîtî yê rêvebiriya Pehlewî eşkere kir, yanî awa û bîçima sermayedarî û tebî'eta berê sermayedariyê ya hêza dewletê zelal kir. Santralîzm, xwedamezirandin û xweqahîmkirina (ra û rîşavêtina) hêzên dewletê ciyekî wê yê dualî li ser bingehê civakî-aborî û hecmeke wê ya siyasî di Kurdistanê de hebû. Di milekî de êrîşeke giran û aktîv birin ser rêxistina siyasî û eskerî ya eşîretên kurdan û xwedî mulkiyeta eşîretî, bi awakî berbiçav bi navê kevneperestiya siyasî û eskerî bi taqeteke dijminatî û bi awayê hêzekî dijmin rêberayetiya eşîretan jar kir, di milekî din de jî, çarçoveke hiquqî-siyasî ya nû ji bo xwediyê mulkiyeta eşîretî danî û bi vî awayî bingehê aborî yê hêz û desthilata wan xurt kir. Ev nimuneke eşkere ya siyaseta ar û barutê bû ku bêyî li hember rawestîna eşîretên xwedî milk bi naçarî milên xwe tê re kirin. Bi vî awayî desthilata kurdên xwedî milk di bingehê aborî û siyasî ya serdema rêvebiriya Pehlewî de hat entegre kirin.

Jiçekkirina eşîretên kurdan û ji nû de diyarkirina seviya siyasî ya eşîretên xwedî mulkiyek, hewl û têkoşîna sazîkirina huwiyeta neteweyetî ya Îranî li ser bingehê kultureke tekane, pişt re hat. Danîna xizmeta îcbarî ya eskeriyê destpêka gavên yekem bû ku di vê riyê de hat avêtin. Piştivaniya li welat bi erkê tabî'î hemû hevvelatîyan bêyî liberçavgirtina bingehê etnîkî û ayînî yan seviya wan a civakî da li ber xwe. Ev hîsa erk û meşa di riya neteweyetî de bingehê îdeolojiya leşkerê modern bû. Ew selahiyet ji dewletê re hat dan ku ji bo xizmeta eskeriyê bangê xelkê bike û îta'etnekirina wê dozê jî (bi awakî) tawanbarî hatiye hesibandin ku digihîşt xiyanetê. Li gor vê, kesên kurd anîn kirin nav leşkerê nû û di bin alaya nû ya neteweyî de dest bi xizmetê kirin. Wefadarî û îta'etkariya destpêkî ya kevin dibû cî li ser riya dewletê vala bike ku bi remz û nîşana serwerî ya neteweyî dihat hesêb kirin. Rola xizmeta giştî ya eskeriyê ew bû ku wefadarî û îta'etkariyeke yekane ya nû ava bike û wefadariya etnîkî û seretayî bide aliyek û nehêle.

(Ev kar) bi danîna xwendina destpêkî bi giştî jê re bû hêz, ku firseta herî bi xurt a ji bo belavkirina nêrîna helwestê resmî bû ku êdî bêyî li ha û li wir xwediyê tebî'eta nasyonalistî bû. Xwendegên dewletê û bernameyên nû yên dersên neteweyetî ji bo hîsa huwiyeta neteweyetî ku di nav rewşa nû de tesîr bikin bèn ava kirin û wan ji bo karmeşandina dewleta Pehlewî bikar bînin.

Lê ne leşkerê nû yê netewî, ne xwendin û ne jî rewşa nû ya neteweyetî dikarîbû bêyî hebûna zîmanekî tekane yê resmî kar û bar bimeşîne. Tesîskirina hakimiyeta zîmanê farişî, ku bi awakî pêşinatî wekî zîmanê resmî yê Îranê hatibû ragihandin, bi vê riyê re bédengkirina hemû ew zîmanên ku li Îranê dihatin xeberdan, hêz ji bo bi destxistina fermanek hat berhev kirin ku ew di sala 1935an de hat derxistin, nîşana dawîpêanîna zîmanê kurdî wekî zîmanekî pê bê nivîsandin bû û bi vê tovê herî girîngê huwiyeta kurd hat hişk kirin(21). Tefandina zîmanê kurdî bi zîmanên din ên navçeyî re, merceke qebulkirî ya

ji bo damezirandina huwiyeta tekane ya Îranî bû. Rûkaşiyêke din jî li ser huwiyeta nû ya neteweyî hat kirin ku ji bo bilindkirina ji rojên borî yê etnîkî û destpêka xwe nîşan bidin û di nav ziman de, wêneya huwiyeta nû ya neteweyî Ewropayî bû. Dewlet cil û bergên mehelli yê mêr û jinan qedexe kir û ferman da ku cil û bergên ewrupî li xwe bikin.

Mefhuma netewe û huwiyeta neteweyî wekî tiştêkî bi serê xwe û ji bo parvebûnê, ku di saya dewleta Pehlewî de ava kir, nekarîbû bi wî awayî înkara cihêtiya etnîkî û pluralîzmiya kulturî bike. Vêca ji bo vê, her bi vî hewayê, cihêtiya etnîkî bû nîşana sêreya stratejiya xeberdan û diyarkirinên di derheqê huwiyeta neteweyî de. Kurd cihê bû, bi belge nîşandana diyarkirina vê cihêtiya han, huwiyeta serbixwe ya hakim, yanî etnosa desthilatdariya fars û desthilata wê li ser bi parvenebûya ax diperçiqand û bi ser de gav dida. Vêca ji ber vê, tefandina ziman, dîrok û kultura kurdî û înkarkirina etnîsîteta kurdan bi belge nîşandan û ji te'rîfa stratejiya ji bo huwiyeta neteweyî di Îrana Pehlewî de beşeke cihênekirî bû. Diyarkirina resmî, ku bingehê wê li ser mantiqêke nû ya bi darê zorê hatibû danîn, ji bo guherandina kurdan bi tiştêkî nesarbixwe sebebêkî hakim bû. Dêmenên cihê yê hinek ji gotin û behsên di derheqê nûxwaziyê de berfireh bûn û wekî helwestê eşîretî-gundî li aqarê bajarvanî-şaristanîyetî li ber yek hatin danîn. Nema êdî kurdî zimanekî cihê dihat hesêb kirin, çunkî biyanî, dijmin û xeraker dihat hesabandin. Ji ber ku huwiyeta serbixwe û biheq ji bo helwesta nû dikir bin pirsê.

Bêdenkirina huwiyeta kurdan di wê danenasîn û nûtiyê de beşeke cihênekirî bû, ku dewleta neteweyî ya Îranê bi xwe re anîbû, ew dewleta ku xwediyê dîrokeke kurt û bingehêke tijî ji girê û astengên sermayedarî û ji nav kultureke lîberalî derbaz nebibû. Bêdenkirina zimanê kurdî dihat bi me'neya bi darê zorê derxistina kurdan ji melbenda nivîsînê. Ev, nîşana mirina xwejenparêzî ya civaka medenî (civil, socsity) li Kurdistana Îranê û nebûna zêde formasyonêke helbijartî ya ji nû de çavekirî bû ku dibû peywendiya siyasî û ferdî bigerîne. Hilweşîn û rizîna civaka medenî bi vî awayî dihat wê me'neyê ku behskirin û diyarkirina eşkere ya cihêtiyê, behsa huwiyeta etnîka kurd, nedibû bêyî zor û zehmetî bête meydanê.

Diyarkirina resmî, huwiyeta etnîkî ya kurdan rût û tazî kir. Wan wekî Îranî huwiyeteke nû bidest xistin, ku tovê damezrêneriya wan ji etnîsîtet, kultur û dîroka farisan dihat. Ev xweragirtina kurdan li hemberê wê huwiyeta bi zorî û pêdanaerdê li ser diyar kirin û behsên cihêtiyan bû ku, bingehê ajardan û serhildana nasyonallîzma kurdî di Îranê de danî. Li gor vê, xwe biyanî hîs kirin ji hêza hakim, bû çavkaniya huwiyeta hevbeş a kurdan wekî kurd, ku li hemberî diyarkirin û nêrîna hegemonyetiya li dij sekinandina Pehlewî berxwedanî kir. Ew nivîskar û gerînekên nêrîn û diyarkirinên nû yê nasyonallîstên rewşenbîr ên bajarvan bûn, ku di xwendîngeh û lêşkergehên

(serbazxaneyên) Riza Şah de perwerde bûbûn. Siyaseta santralîzma ax û prosesa pêkanîna muesseseyan û şert û merc ji bo çêkirina huwiyeteke neteweyî ya Îranî bi neqdî saheya siyaseta kurdî li gund û derûdorên bajaran ve guhestin nav bajaran. Damezirandin û xweragirtina Komeleya J. K. (Komeleyî Jiyânî Kurd) di sala 1942an de, nîşana peydabûna bîr û bûyereke modern a nasyonalîstî li Kurdistana Îranê bû.

Ev rêxistina han a nîveşkere li Mahabadê hat damezirandin. Damezrênerên wê ji kurdên bajêrnişîn û burjuvaziya biçûk bûn, çî yên ji tradîsyonî (orf û adetî) çî jî yên ji modernîtî, piraniya wan burjuvaziyên biçûk ên tradîsyonî bûn. Piraniya endamên damezirêner bi kar û kesbên wisan ve mijûl bûn ku yan ji ber pêşveçûna rola dewleta modern li Kurdistane di hêla siyasî- aborî û îdarî ve kemilî bûn an peywendiya wan bi wê rewşê ve hebû, tu nûnerên xwedî milk û burjuvaziya bazirganî yên girîng di nav vê komeleyê de tunebû(22). Pêkhatina Komeleya J. K., piştê çûyîna Riza Şah ji ser text û têkçûna rejima îstîbdadî ya di Îlona sala 1941an de, nîşana zindîbûn û vejîna civaka medenî li Kurdistane bû.

Bi kurdî nivîsandin ku gelek bi zû ket sahneya rewşenbîriyê, ji bo vê vejîna han nîşaneke serekî bû. Zimanê kurdî bû zimanê xweîfadekirina siyasî û kulturî di nav hejmareke kêma rewşenbîrên kurd de, ku derketina wan li meydana siyasî nîşana berbipêşveçûna peywendiya kelûpelî, xwendina ilmanî (layîk) û prosesa bayê nû ya birêvebiriyê di Kurdistana Îranê de bû.

Komeleya J. K. ji bo wergirtina endaman li ser şertê etnîkî îsrar dikir: kurdên hemû beşên Kurdistane dikarîbûn bikevin nav komeleyê û pê re bin. Asurî dikarîbûn bibin endamên Komeleyê, lê destûr û bernameya Komeleya J. K. Îslamiyetê dîne resmî ye Kurdistane hesêb dikir, ayetek ji Qur'anê di sembola welat a li ser organa xwe ya resmî bicî kiribû(23). Lê nêrîn û diyarkirina nîştîman, bi dereceya yekem her li ser esasê layîkî bû û tikakarî û deste û danîna dînî ji bona bi zêdetir mebesta popolîstî (rakêşana girsên gel) û milên pratîk bûn. Gelek caran ji milê Îslamî ye rêxistinê îstîfade dihat kirin, ji bo tawanê ataîzm û komunîzmê ku bi awayekî zêde ji aliyê kevneperestên civaka kurd ve lê dihat kirin, ku bikare li ser xwe birewêje û bi taybetî ji aliyê çîna xwedî milk, civata tacîran û mirovên dînî ve, ji ber gotinên radîkal û popolîst ên nasyonalîstan, komeleyê kiribûn nav çarçoveyeke teng de û pêşî lê digirtin(24).

Komeleya J. K. di diyarkirina îdeolojiya xwe de bi piranî îstîfade ji xelkê vê babeta han a civakî-aborî werdigirt ku xîmê civaka kurd bûn. Nîştîman tijî ji behsên gelek zêde yên newekheviya civakî ya di navbera "feqîr û dewlemendên" di civaka kurd de ye û feqîrî û cehaletiya civaka kurd, bi taybetî gundî, li hemberî berhevbûna serwet û mal di destê xwedî milk û tacîran de cî digre. Ev cure nêrîn û îşaretkirinên han, di yek nivîs an şî'irek,

ên car û caran ji bo pesn û medhê Lenîn û destkevtiyên Yekîtiya Sovyetê, bes bûn ku ew bikin sebab û ew bi tawanê komunîzm û ataîzmê bên tawanbar kirin. Lê, behsa grubên cihê yên çîneyî di nêrîn û diyarkirina nîştiman de nîne(25). Ew babetên civakî û aborî yên ku rû didan, rayên wan digihîştin ser şert û mercên objektîf û berjewendiya sebabên aborî di civaka kurd de. Wekî nimûne, eziyet û zehmetiya aborî di zîraetê de -behra 'ecêb û zêde ya eziyeta gundiyan- li ser wan cure peywendiyên parvekirina darayî û mal ku di gundan de dihat meşandin nedihatîn birin, belko bi tamahiya şexsî û awayê şert û merc û kirinên exlaqî yên xwedî milkan ve hatine girêdan. Her wiha nêrîneke aborî ya di derheqê qazanca bazirganî ya tesdîqkirina wê li hemberî berhevbûna serwet, mal û newekheviya zêde ya aborî di bajaran de di meydanê de tunebû. Nîştiman, diyarkirin û nêrîneke bi vî awayî ji bo pêwîstiya îslahiya civakî ji bo guherandina ew şert û mercê ku di meydanê de bû pêş ve nedianî û behsa tafîkirina eziyet û zehmetiya feqîran û bindestiyê nedianî meydanê. Di ciyê van de daxwaza çakkirin û însaniyetê ji xwediyê milkan dihat kirin ku ew şert û mercê ba û bager îslah bikin û rewşa eziyet û bindestiyê siviktir bikin. Radîkalîzma bîrlêkirî ya civakê bi perdeke serkevtina exlaqî li civaka kurd hatibû pêçandin û her wiha ma. Radîkalîzmeke wisan ku di hêla orf û adet de di populîzma gundî ya civaka derbazbûyî de tê dîtin. Konseptê "gel" ku diyarkirinên nîştiman de tînin dîtin eynî netîce lê derxistinên pêwîstî tê de ne ku di diyar kirin û nêrîna populîstî de heye. Karakterê diyarkirina nasyonalîstî ya nîştiman wê ji girêdana giştî ya populîzma gundî cihê nake. Di rastiye de ketina bi ser hev a gav bi gav a du babetan: gelê kurd û neteweyê kurd, di gotar û diyarkirina nîştiman de ku bi karakterê wê ya radîkalî ya bersîva nasyonalîstî tê hesêb kirin, gelek car bi şaşî bi nifuz û tesîrkirina nehênî ya Marksîzm-Lenînîzmê li ser çarçoveya îdeolojiya rêxistinê tê hesêb kirin.

Di diyarkirinên welat de du mefhum: gelê kurd û neteweyê kurd hevme'na ne, gelek caran di ciyên hev de tînin bikar anîn. Konseptê gel/neteweyê kurd di çîrokên heta tu bixwazî awa awa yên Komeleya J. K. de xalê serekî ye, ku ew bi dewra xebateke hevbeş de babetê ser erdekî serbixwe yê kurd berhev dike û bi ronî di destûr û bernameya wê de derdikeve(26). Ev, li ser nêrîna bingehê neqilkirina nîştiman, çî bi nesir çî bi şî'ir, zanyarî dide dest û karakterekî taybetî dide nasyonalîstiyê. Wekî armançê zêdetir bal dikêşe ser damezirandina welatekî serbixwe yê kurd ku dibê bi riya têkoşîna yekgirtî ya neteweyê kurd, wekî babetê dîroka kurd pêk bê. Eger çî babetê dîroka kurd bi wî awayî giştî bi serê xwe û bêcîhê di qalibeke sinorkirî ya nasyonalîstî de nîşan dide, stratejiya siyasî ji bo gihîştina wê armanca nasyonalîstî bo wî awayî ku di destûr û bernameya Komeleya J. K. de hatiye serûbin kirin eksê wê nîşan dide.

Komeleya J. K. piştgiriya stratejiyeke nasyonalîstî ya wisan dike ku, bi awayekî medenî-siyasî sinor kiriye û çî awa kirineke eskerî tê de nîne. Ev



diyarkirina radîkalî ya awayê klasîkî eskerî-siyasî ku heta wê demê li hemû beşên Kurdistanê bi rê ve bû, heta tu bixwazî giring e(27). Ev ne tenê nêrîna komeleyê ya di derheqê bêfeydêtiya kirinên eskerî li hemberî hêzên desthilatdaran di warê hejmar, imkan, cebirxane û teknolojiya li ser erdekî ku nagihîje deryayan û abloqekirî nîşan dike, belko analîza bingehê wê rêxistinê ya di derheqê bingehê civakî, çarçoveya siyasî û rêbaza îdeolojiya hêza eskerî li Kurdistanê jî dide nîşan. Hêzeke wiha ji kevin ve di bin pavana serokatiya eşîretî de bû û ji aliyê serokatiya wê ve dihat kontrol kirin û kar dikir û grubên çekdar ên eşîretan ên perçe perçe li piştê bûn. Vêca ji bo piştivanî û layengiriya stratejiya nasyonalîstî ku hêza eskerî jî tê de be, me'neya parvekirina hêz û desthilatê bi serokayetiya eşîretî re bû û netîceya wê digihîşt çokdana li ber hewa û hewesa siyasî ya kevneperestan û qazanca temenê wê kurt a serokayetiye -sebebê ku di şikandina bi lez a Komara Mahabadê de xwedî erkê biryarê bû. Desthilatdarî, hakimiyeta layengirî, fermanberiya orf û adetî ya pismametî, destpêka bingehê civakî û çarçoveya siyasî di hereketê kurdan de îspat kiribû ku, ev sebebên biryarder bûn ji bo vejîn û berbipêşvebirina hişyariya netewayetî û kirinên modern ên siyasî nasyonalîstî li Kurdistanê. Ruh berketin û rûdana dilavêtiniya van nîşanên bingehîn di civaka kurd û di siyasetê de bi ronî xwe di destûr, bername û çarçoveya siyasî ya komeleyê de nîşan da. Rikoyîbûn li ser xebata çekdarî wekî wasîteyek ji bo çibîckirin û bidestxistina armancên nasyonalîstî gihîşt wê yekê ku çîna xwedî milk û rêberên eşîretan di rêxistinên siyasî û serokatiya hereketê de nebin û tê de cî negrin(28). Analîza komeleyê ya bi gelemperî ya di derheqê rola xwendiyên milk ên kurd de û bi taybetî jî di derheqê serokatiya eşîretî de, berê ku di sala 1944an de bibe Partiya Demokrat a Kurdistanê, di muddetê jiyana xwe ya kurt di kirinên siyasî yên wê komeleyê de rikoyî (bîrsar) bû.

Di warê îdeolojiya de qebulnekirina çîna xwedî milk û serokatiya eşîretî, di prosesa pêkanîna armanca nasyonalîstî de ji bo danenasîn û diyarkirina mefhumê neteweyê kurd li ser bingehê siyasî nîşana têkoşînek e. Di diyarkirina komeleyê de, cihêtiyeke di navbera neteweyê kurd wekî babeteke tekane di dîroka kurd de û mefhumê neteweyê kurd wekî babeteke ji kirinên nasyonalîstî yê siyasî cihê kiriye. Ya pêşî ku gotin û diyarkirina îdeolojiya komeleyê dide xuya kirin, bi riya peywendiyên etnîkî ve diyar dike û wisan dike ku cihêtiyên civakî-aborî û siyasî di nav netewe de kêmkirî û wekî babeteke tekane û yekdestî dîroka nasyonalîstî pêşkêş dike ku ew erkê li ser milane, pêkanîna welatekî yekgirtî yê serbixwe, Kurdistan e. Ya dawiyê jî ku stratejiya komeleyê qahîmtir dike, xwe bi cihêtiyên civakî-aborî û siyasî ve girê dide, ku ji peywendiyên etnîkî derbas dibe. Ew cihêtiyên derve û hindurî yên di navbera wan de muşterek bûn, nîşan û îspata huwiyeta modern a siyasî ye. Ew, tu wextê bi huwiyeteke qerimandî û cîgir bi sinorkirî nîne. Bi eksê wê, bi

awakî berdewamî di nav xebat de ji aliyê hêzên bi vî awayî beşdarî di siyaseta nasyonalîstî de dikin tê diyar kirin. Demdemîya di navbera nasyonalîzma etnîkî û popolîzma gundîti û ketina wan li ser hev gav û bi gav û berdewamiya mefhuma neteweyê kurd û gelê kurd di diyarkirin û nêrînên komeleyê de nîşana karakterê aloz û derketina bêhesabiya huwiyeteke neteweyî ye di Kurdistanê de.

## JÊRNOT

(20) Li gel wê jî, ev nayê wê me'neyê em bêjin ku, dewlet di zemanê Riza Şah de ji bo tehdîda kurdan li ser hakîmîyeta "neteweyetî", yekperçeyî û qahimiya axa Îranê destgîrêdayî bû û hîs pê nedikir, an çavê xwe ji guherîna hêz wek sebebê pêşdexistinê di cereyana santralîzma ax û nûkirina rêvebiriyê digirt. Bi eksê wê, lêkolînên nû yên akademîk didin xuyakirin ku dewleta Îranê hê ji berê salên 1920an ve di derheqê ew guherînên li ser axa kurdan a Dewleta Osmanî ya cîran de diqewimîn dudil bû û bi taybetî li hemberê nûneratiya kurd û raxistina pîrsa kurdî di Komeleya Gelan (Esbetû'l-Umem) de li ber çav, destgîrêdayî dima. Firuxî, nûnerê Îranê yê di Komeleya Gelan de, bi nirxandina tehdîdekê ku bi damezrandina dewleteke serbixwe ya kurd li ser erdê Osmanî ava bibe, pêşniyarê hukumeta Teheranê dîke ku di cîyê zordarî, kuştina siyasî û înkarkirina huwiyeta etnîkî ya kurd de, siyaseta asîmilasyona (helandina) kulturî bimeşînin. Di sala 1927an de, eynê Firuxî, dema ku sîrayeta hêz û radeya belavbûna hereketê Şêx Seîd li Tirkîyê û bayê tesîra avakirina nêrehetîya kirinên Simko di herêma de hejîya, tirs ket dilê wî, ku wê çaxê sefirê Îranê yê Tirkîyê bû, ji bo bi hev re rabûna li dijî hereketê kurd, pêşniyara gavavêtin û tedbirên muştêrek ên Îran û Tirkîyê kir. Nameyên helbijartî yên nehênî yên Firuxî di kovara Yexma ya hejmara 7an a sala sêyem, 1950/1329 û hejmara 8an a sala duyem, 1958/1327an de belav bûne. Hesenpûr di kitêba xwe de van herdu nameyan bi tehlîlên wan ve çap kiriye. (Ew kitêba ku li jorê behsa wê hat kirin, 1992) Lê piştî xurtkirina bingehê hêz û desthilatê di nivê salên 1930an de, êdî Dewleta Îranê pêşî li hereketê kurd bigre hewceyê hêzeke kêmbû. Jiçekkirina eşîretên kurdan û nebûna rêxistineke siyasî ya ji bo karê kurd ku terefdarî û piştvanîyek wê ya girîng di merkeza bajarên serekî yên kurdan de hebe, ger çendin ji nav jî neçûbû, lê dehdîda kurdan li ser hêminîya siyasî ya dewleta îstîbdad, heta dereceyek zêde kêmbûbû û jê re astengek mezin nebû. Di sala 1937an de beşdariya Îranê di Peymana Se'adebadê de, ku mesela kurd di çarçoveya li dijî komunîzmê de kirin meseleke herêmî, nîşan û xuyakirina dirêjkêşana hîskirina bi nêrehetî û tîkelheviyên di derheqê tehdîdên muhtemel ên etnîsîteta kurd de, ku dikarîbû ji dewletê re peyda bike, eger hatiba şert û mercên herêmî ji bo karekî bi vî awayî li bar bûya.

(21) Ji bo agahdariya di derheqê metnê wê fermanê û çîbicîkirina wê di Kurdistanê de, binêre: Hesenpûr, ew kitêba berê niha behsa wê hat kirin, 1992.

(22) Ji bo agahdariya bîr û baweriyên cihê yên di derheqê pêkhatin, berbîpêşveçûn û tîkoşîna Komeleya J. K. û bingehê civakî, helwestên îdeolojî û stratejiya wê ya siyasî de, binêre van kitêbên xwarê:

H. ARFA, THE KURDS, AN HISTORICAL AND POLITICAL STUDY, LONDON 1966 (H. Arfa, Lêkolînek Dîrokî û Siyasî, London 1966).

W. EAGLTON, THÖ KURDISH REPUBLIC OF 1946, LONDON 1963 (W. Eaglton, Komara Kurd ya 1946an, London 1963).

A. ROOSEVELT, "THE KURDISH REPUBLIC OF MAHABAD", MIDDLE EAST JOURNAL 1947 (A. Roosevelt, "Komara Kurdî Li Mabahadê", Kovara Middle East 1947).

N. M. EMİN, HUKUMETA KURDISTANÊ, UTRECHT 1993

C. NEBEZ, Kovara Niştiman, Zimanî Halî Komeleyî J. K. Stockholm 1985.

S. M. SAMED, NÎGAHÎ DİGER BÊ KOMELE J. K. MAHABAD 1984.

(23) Di kanûna duyem a sala 1943an heta meha meha gulana sala 1944an, deh nejmarên Niştimanê belav bûne. Ji van 6 hejmar di sala 1985an de careke din ji aliyê C. Nebez ve hatine çapkirin. Dibê ji bo wê xebata han pesnê Nebez bê dan ku wê çavkaniya hêja xist ber destê lêkolînerên dirok û siyaseta Kurdistanê. Ez sipasê Hesenê Qazî dikim ku hejmarên Niştiman ên 7, 8 û 9an bi hev re çapkirin û xist ber destê min.

(24) Ji bo agahdariya di derheqê bersîva komeleyê li hemberê van cure tawan û îthaman, binêre: hejmarên Niştiman ên 5 û 6an. Wisan dixuyê ev cure tawan lê barkirinên han ji ber çapkirina gotinên di derheqê pesnên Şoreşa Oktobêrê û Lenin ku di Niştiman de hatine kirin, çêbûne. Destûr û bernameya komeleyê, Îslamîyetê wekî dînekî resmî ji bo dewleteke serbixwe ya dahatu ya kurd pêşniyar kiriye (Maddeya 7an, di Niştimana ji nû ve çapkirî hejmar 6an). Her wiha wê jî raxistiye ber çav ku biryar û qanûnên nedînî (layîk) dibê bi bingehê Îslamîyetê re biguncin.

(25) C. Nebez di pêşgotinê de, ji bo berhevkirina Niştiman bi durustî îşaretê wê xalê kiriye û nişan daye ku komele rêxistineke Marksîst-Leninîst nebûye. Ji bo pêkanîna dewleteke serbixwe û nû ya kurd programek wê ya nehênî û komunist di pişt programa gelî-demokratîk de tunebûye. Lê, Nebez nekariye programa civakî ya popolistî ya komeleyê binase û serederiyek jê derbixe û peywendîya wê di nezdê îdeolojiya nasyonalîstî ya rêxistinî de keşif bike. Rûbirûbûna gav bi gav û berdeewama p nasyonalîzma kurd di Îranê de bûyerek e û netîceya têkçûna rewşa civakî, aborî û kulturî ye, ku bi rêya nûkirineke bi zerar û li rêderçiyî ku piştî serhildan û peydabûna desthilata bêmelheze ya Pehlewî ya piştî şerê cihanê yê yekem meşiya, peyda bû. Bersîva kurdan ya li hemberî wan siyasatên girêdana bi ax û cereyana kulturî yên ji bo sazîkirina nasnaveke "neteweyî" ya Îranî yên tekane yên bi merkezêkê ve ye, ku ji aliyê dewleta Pehlewî ve dihat meşandin, ku wê şert û şirûtên xuyakirî yên pêkhatina tevgera nasyonalîstî diyar kir û di noqteya xwe ya herî bilind de gihişt Komara Mahabadê. Di wê lêkolîna han de, ji wê jî zêdetir, ev gotina han tînd meydane; peydabûna komarê di Kurdistanê de hebûna nasyonalîzma modern dide îsbat kirin: çî bingehê civakî û mueseşeyan û çî jî çarçoveya siyasî û îdeolojiyan bi sebebê hejmareke peywendî û sebebên awa û awa ve tînd nasîn ku, ew jî nabe tenê bi serê xwe bi bingehê dirokî ve bînd girêdan.

Îran, bi întegratîona aborî ya berî sermayedariyê, xwe di bazara cihana kapîtalîstî dopolîzmê, nasyonalîzm û diyarkirina wan di gotar, gotin û nêrînen siyasî û îdeolojiya komeleyê de, ji bo li ser axa kurdan di Îranê de avakirina huwîyeteke modern a neteweyî ya kurd pêwîst bûn.

(26) Binêre: Niştiman, hejmar: 1. Di berhevkirinên Nebez de ku li jorê behsa wê hat kirin, 1985. Ew welatê ku komele difikirî, Kurdistanek mezin bû. Komeleyê, di hejmarên kovara Niştiman ên 3-4an û rûpelên 30-33an de, di bin sernivîsa "Taran (Tehran)-Ankara" de wiha dibêje: "Mesela kurd heta sala 1919an meseleyek mehelli dihat zanîn, lê ji roja ku Şerîf Paşa yê Bedîrxanî (Xandan rast e, "têbîniya wergerê wê nivîsê" -mebest Hesenê Qazî ye. Z. Avcî) layîheya xwe ya bi navûdeng pêşkêşê Konferansa Aştiyê kir û doza millî ya kurd xist nav bendên 62, 63 û 64an û Peymana Sewrê, êdî meseleya kurd bû meseleyek navnetewî û dev jê nayê berdan".

(27) Niştiman hejmar: 1, ji kitêba Nebez 1985.

(28) Nebez, ew guherînên bingehîn di stratejiya pêşniyarkirî ya komeleyê de daye nişan, lê girîngiya wê ya civakî û siyasî nedîtîye. Di çavê Nebez de dawîlêanîna xebata çekdarî û di şûna wê de danîna xeteke medenî-demokratîk a ber bi serbixwetiye ve, qutbûneke ji aliyê adetî ya serokayetiya klasîkî ya kurdî ye û nişana ketina navê ya nîfûza îdeolojiya biyaniyan e ku çavkaniyên wê diçin digihîjin Yekîtiya Sovyetê û Brîtanya Mezin, ku komeleyê dixwest piştgiriya wan ber bi xwe ve bikêşe. (Eynî ew çavkaniya ku li jorê behsa wê hat kirin. Rûpel: 34 û 35).

# Bi Kendal Nezan re hevpeyvîn

*Bi vê hevpeyvînê, wek redaksiyon, me xwest ku em karûbar, tevger û rewşa Enstîtuya Kurdî a li Parisê, ji devê serekê wê, bi hawayekî berfireh bi xwendevanên kovara xwe bidin zanîn. Bawer dikim, hevpeyvîn wê bala we bikişîne ser hin tiştan.*

**Laleş Qaso:** *Birêz Kendal, berî ku em gotinê ji Enstîtuyê vekin, hema wilo bi kurtî, dixwazim tu xwe bi xwendevanên Çirayê naskirin bidî.*

**Kendal Nezan:** Ez kurdekî ji bakurê Kurdistanê me. Di vê biharê de dibe sih sal ku li derveyî welêt li Fransayê dijîm. Karê min ê esasî fizîk bû; ez ji bo xwendina fizîkê hatibûm Ewropayê. Min xwendina xwe qedand û ez di warê fizîka atomî de dixebitîm. Bi kurtî, di sala 1983an de me Enstîtuya Kurdî ava kir. Bi dû avakirina Enstîtuyê de min giraniya xebata xwe berda ser meselên kurdan û ji bo doza Kurdan, çanda kurdî xebitîm.

- *Berî avakirina Enstîtuyê jî te ew karê kurdayetiyê ne dikir qey?*

- Min dikir. Belê di çarçova Enstîtuyê de tesîr û hunera karê ji bo kurdan, tişteki din e...

- *Baş e, ji ber çî sebebên bû ku tu bi karê avakirina enstîtuyê ke kurdî rabû?*

- Pir sebeb hebûn.

- *Mesele?*

- Mesele yek jê dema ku em nû hatibûn Ewropayê, yekî gava bixwesta li ser kurdan tişteke bixwenda, binivîsanda, belav bikira û hwd. cîgehek ne ji bo kurdan û ne jî ji bo ewrupîyan hebû. Di wan çaxan de rehmetî Kamûran Bedirxan sax bû. Fransî bana, kurd bana her kes diçû mala wî nivîs tanîn, kitêb deyn dikirin û herwiha li ser pirsê kurdî diaxivîn. Bi rastî li Fransayê dezgehek kurdî ji me kurdan re lazim bû. Çimkî pirsê kurdî bere bere pirseke mezin bû. Dida xuyakirin ku ew karê ha tenê bi xebata kesekî an jiyana kesekî ne dibû bihata girêdan. Divabû em derbasî merheleya mueseşeyan bûbana; mueseşeyê bihatana avakirin û ew mueseşeyê derbasî destê nesîlan bûbana. Bi gumana min ew fikirek baş bû. Ji ber ku berî me jî gelek kesên hêja heta dawîya jiyana xwe xizmeta kurdan kiribûn; û gava ew çûne, bermayên wan bi awayekî pevgirtî ne gihane nesîlên nû. Belge bin, kitêb bin, nivîs bin belav

bûne. Li Kurdistanê, mixabin, tu dizanî avakirina mueseseyek wisa kurdî ne dibû. Li derveyî welêt ancax me dikarîbû ava bikira.

- *Erê çima ne hin din, belê tu di vir de dibî pêşker û hûn vê Enstîtuyê ne li Elmanyaya, Belçîka, Spanya û hwd. belê li Fransayê vedikin?*

- Çi bibêjim, çima ez çima ne hin din? Di tarîxê de her tişt bi determinîzmê, li gora qanûn û filan û bêvanan nameşe. Carna hin tesaduf û hin şertên objektîv digihên hev tiştekek peyda dibe. Belkî a min û Enstîtuyê jî hinekî wiha be.

- *Na, tenê bi wan nabe ew tişteki din e; gerek te bi xwe tiştin civakî kiribin. Ji kerema xwe re vê meselê hinekî veke.*

- Li Fransayê bi salan em digel rewşenbîrên fransî xebitîbûn. Gelek dost û nasên me çêbûbûn. Di sala 1975an de me komelek bi navê "Fransa - Kurdistan" damezirandibû. Di vê komelê de rewşenbîrên bi nav û deng hebûn.

- *Kîjanên bi nav û deng?*

- Jean Paul Sartre, Sîmone de Beauver, Maksîm Rodenson û hwd. Me li ser navê wê komelê hin kitêbên ku li ser tarîxa kurdan bûn û herwiha hin tiştin din jî belav kiribû. Bi kurtî, dikarim bibêjim ku me digel rewşenbîrên fransî gelek xebatên hêja kiribû. Îcar di sala 1981ê de gava partiyên çep hatin ser hikim, ew şertên ku em ê bikaribin li Fransayê pêş de herin çêbûn û şertan em ber bi damezirandina mueseseyeke kurdî de ajotin. Di nav hikûmetê de dost û nasên me gelek bûn. Hin ji wan li unîversîtan profesor û mamoste bûn; û bi rêya unîversîtan me hev nas kiribû. Bi hinekan re em li dijî Pînoşe û dîktatorya Arjantînê sekinîbûn. Bi hinekan re ji bo azadiya Polonyayê me tekoşîn dabû. Îcar helbet ne dibû ku wan kesan jî ji bo miletê kurd tiştekek ne kiriba...

- *Yanî tu dibêji ew xebata min a digel rewşenbîrên fransî, di damezirandina Enstîtuyaya Kurdî de rolek mezin listiye.*

- Erê wisa ye.

- *Ji bo ku li welatîna din jî enstîtuyên kurdî ava bibin, tu hewldanên we bûne yan jî dibin gelo?*

- Ew hinekî li ser piştevaniya dîplomasî û malî dimîne.

Di dema şerê sar de li Ewropayê me ew piştevanî nikarîbû peyde bikira. Me hewl da...

- *Mesele?*

- Mesele li Elmanya û gelek welatên din ên ewrupî em bi tevgerek wisa rabûn, belê bi ser neket...

- *Li Swêdê jî?*

- Li Swêdê ne ku me ne dixwest an em ji karekî wisa ku menfeheta kurd tê de heye reviyane. Di wan deman de li Swêdê gelek rewşenbîrên kurd bi cih bûbûn. Îcar ne dibû ku me bi xwe ew yeka ha bikira. Ji Fransayê were û di nav koma rewşenbîrên kurd de li Swêdê enstîtuyeye kurdî ava bike. Bêmane dibû. Di wan deman de li Swêdê şertan dest dida. Olof Palmê mirovekî demokrat û hikûmeta wî li ser hikim bû. Eger rewşenbîrên me a xwe kiribana yek û ji dil û can xwe dabanayê, ez di wê baweriyê de bûm ku li Swêdê jî wê enstîtuyek ava bûba.

- *Baş e, te bi xwe ji wan rewşenbîrên me re tiştêk ne got?*

- Ez bi çend kesan re axivîm. Belê mixabin dîsa jî ne bû.

- *Ji bo avakirina enstîtuyeye hem gelêrî û hem milî, ew şert hîn jî li Swêdê hene gelo?*

- Belê hene.

- *Wekî din?*

- *Wekî din*, me di sala 1994an de li Emerîkayê enstîtuyek kurdî damezirand. Lê ew zêdetir bi fonksiyona ku zilm û zora li ser gelê kurd ji kongrê, sanato û medyayê re rave bike, radibe. Yanî jî bo gelê me dostan peyda dike; propaganda dewletên ku Kurdistan par ve kirine bi zimaneki maqûl û metodên nûjen pûç dike.

- *Wek nimûne?*

- *Wek nimûne* wêrankirina gundên kurdan. Me, ev pirs bi giranî bi raya giştî ya cihanê da nasîn.

Di sala 1994an de gava parlamenterên DEPê hatibûn girtin, me ji bo serbestkirina wan kampanyek vekir. Li gelek dewletên ewrupî wek Enstîtu em bi gelek wezîr û berpirsiyarên hikûmetan re rûniştin. Heta ez bi xwe bi Helmuth Kohl re rûniştim û min zilma dewleta Tirkîyê anî zimên. Belê dewleta tirk jî wisa propaganda kiribû, mîna ku şewitandina gundan, malwêrankirin û kuştina rewşenbîrên kurdan ne bi destê dewletê, bi destê partiyek kurd dihate kirin ketibû mejiyê wan. Wisa bawerî pê anîbûn ku bi rastî dewletê, gundiyan kurd li himber vê partiyê diparast. Gundî ne ji ber terora leşkerên tirk, ji ber terora vê partiyê direviyan bajaran. Me digel 21 rêxistinên ewrupî ji rojnama Herald Tribune û Le Monde rûpelek kirî û di van rojnaman de lista gundên ku ji alî dewletê ve hatibûn valakirin weşand û me got: "Eger bi rastî gava dewletê ev zilm ne kiribe, bila bihêle em herin van gundan bibînin" û hwd. Belê dewletê jî ji van rojnaman rûpelek kirî û xwast li himber ragihandina me sekinî. Sekinî belê nikaribû bersîva pirsên me bide û di dawiyê de mecbûr ma bêje ku ev gund ji bo selametiya xelkê û dewletê hatine vala kirin.

- *Yanî di vî warî de tiştê ku ji dest we hatiye we kiriye, erê?*

- Erê me kiriye. Di vî warî de belgên xebata me hene. Me çî kiriye, çawa kiriye hemû di arşivan de ne. Ên ku bixwazin bila bên em ê pêş wan bikin. Ez bêmibalexe û derew dibêjim. Tişteki me î ku em ê ji miletê xwe veşêrin tune.

- *Li himber zilma dewleta mehmetçîkên misilman bi xurtî hîn jî hûn wê dîplomasiyê dimeşînin?*

- Belê em dimeşînin. Di warê xwe de, li gora karîn û nasîna xwe tiştê ji destê me tê dîkin.

- *Mesele di van demên dawî de we çî kir?*

- Di demên dawî de ji bo ku Tirkiye di lista namzetên Yekitiya Ewropa de cih negire, me û hin mueseseyên ewrupî bi hev re kampanyek vekir.

- *Kîjan mueseese bûn ew?*

- Amnesty, Weqfa Danielle Mitterrand, Rojnamevanên Bêhidûd, Federasyona Navneteweyî ya Mafên Mirov û hwd. bûn. Me bi sê zimanan dosyek nivîsandibû. Di vê dosyê de lista gundên me ên wêrankirî, ew kesên ku bi navê "faily mechul" hatibûn kuştin, şebekên dewletê û gelek tiştên din hebûn. Me ew dosya ha ji wezîrên derveyî ên 15 dewletan re şand. Û heta em bi hinekan re jî rûniştin. Ez bawer im ku ev xebata me, li ser dewletên ewrupî tesîrek baş kir. Û Tirkiye di lista namzetan de cih ne girt.

Dîsa di meha adarê de ji bo bîranîna Helepçe li ser pêşneyara me, Parlamenta Ewropayê civînek taybetî ku jê re "hearing" tê gotin, yanî guhdarkirin, pêkanî. Parlamentoyê gazî min û ji Swêdê ji Enstîtuya Aşitî SIPRI gazî pîsporek kirin. Ê Swêdî li ser pirsên teknîkê, ez jî bi awayekî giştî axivîm.

- *Di wê komcivînê de ji bilî te tu kurd hebûn gelo?*

- Ji bo axaftinê ez bi tenê bûm.

- *Bi qasî ku ez di gotinên te de digihêm, Enstîtu û serekê wê tam kar dîkin. Belê ezbenî hûn ji dûr ve, di durvekî mîna ku hûn hîç tişteki nakin de ne.*

- Rast e, gerek me jî li defê xista. Lê em ê tucarî li defê nexînin. Ew ne karê me ye. Tarîx şahidê xebata me ye. Ew ji bo me bes e...

- *Gelo mirov dikare bibêje ku serek û rêvebirên Enstîtuyê, ji çar, pênc prensîbên ku hatibûn danîn heta roja îro danegeriyane û li gor wan prensîban herwilo karûbarên xwe meşandine?*

- Belê mirov dikare bibêje. Bi rastî em gelek caran ketine tengasiyan. Belê digel ewqas tengasiyan dîsa jî em ji prensîbên ku Enstîtuyê danibûn qet dûr ne ketine.

- *Wek çî tengasiyan?*

- Mesele dema ku li Fransayê hikûmeta çep ji hikim ket û partiyên rast hatin ser hikim, dewleta tirkî pir bi dijarî êrîşî ser me kir! Ji hikûmetê û faransî re

gotin:

”Ê ku di nav dinyayê de îmaj û prestîja me xerab û dezenformasyon dikin Enstîtuya Kurdî, Amnesty, Rojnamevanên Bêhidûd û Weqfa Madam Mitterrand e. Rojnamevanên Bêhidûd û Weqfa Madam Mitterrand di bin tesîra Enstîtuyê de ne. Alîkariya xwe ji ser van hersê mueseseyan bibirin, em ê jî ji we helîkopteran bikin...” gotin û kirîn jî. Lê dîsa jî ji bo ku Enstîtu li ser pêyan bimîne, me ji prensîbên xwe hîç tawîz neda.

- *Enstîtu di nav kurdan de teref digire gelo?*

- Bêterefî prensîbekî Enstîtuyê ye. Ew cîgehekî serbixwe û ne di bin kontrola tu partiyên siyasî de ye. Heta em bibêjin partiyek pir pir baş be jî, Enstîtu wê dîsa jî nekeve bin kontrola wê. Em ne propaganda tu partiyên û ne jî li dij wan disekin. Ew ne karê me ye. Em karekî kurdistanî dikin...

- *Birêz Kendal, dixwazim gotinê serguherî aboriya Enstîtuyê bikim...*

- Ser çavan, kerem bike.

- *Butça we a salan e li dor çiqas pere digire?*

- Niha berî wê divê ez bibêjim ku Enstîtu bi biryara meclisa wezîran a Fransa wek waqfek ji bo bi kêrhatina civakî hatiye qebûl kirin. Wekî hemî weqf û mueseseyên resmî muhasebeya wê ji alî dewletê ve tê kontrol kirin. Îcar ku em bînin ser mesela butçê û sermaye me a salan e:

Butça Enstîtuyê teqrîben ji % 35-40 ji wezareta kulturî, wezareta lêgerînê a Fransayê tê. Butçe her sal divê ku li dor sê milyon frankî be. Yanî butça me a salan e li dor sê milyon frankên fransî ne. Dema ku ev butçe dadikeve, wî çaxî jî em ji programan hin tiştan kêr dikin.

- *Ji dewletin din jî carna alîkarî tê?*

- Ew li ser projan dimîne. Carna li gor projên xwe em ji Yekitiya Ewropayê jî alîkariyê distînin.

- *Ji kîjan dewletan?*

- Mesele me ji bo yek, du projên xwe ji Norweçê alîkarî girt. Herwisa me alîkariyên piçûk ji Swêdê jî girtine. Û em hîn jî digirin. Demekê ji bo xwendegahên pêşîn û navîn ên Kurdistanê jêrîn, me li dor du sed hezar kitêbên kurdî li Fransayê çap kirin û bi kamyonan ji wan re şand. Em niha jî bi projeya internetê dadikevin...

- *Weşanên Enstîtuyê bi me didin zanîn ku di warê ziman, kultur û edebiyatê de gihandina pisporan armançek ji ê Enstîtuyê ye. 15 sal çêbû ku Enstîtu heye. Di hikmê 15 salan de gelo Enstîtuyê çend pispor gihandin? Eger gihandibin kî ne ev?*

- Enstîtu her sal ji keç û xortên kurdên jêhatî bi misabeqe 15 kesan



hildibijêre û wan li welatên Ewropayê dide xwendin. Enstîtuyê ji dema damezirandina xwe heta niha 310 - 15 kes bi xwendinkirin dane. Ji vê serhejmarê, wan kesên ku xwestine doktorayê bikin, tenê li Fransayê xwendine. Ên din li Yûnanistanê, Çekoslovakya, Îtaliyayê û hwd. xwendine.

- *Çi beş xwendin bû?*

- Piralî ye. Tib, tarîx, sosyolojî, antropolojî, teknîk û hwd.

- *Ew xwendekar tenê ji bakurê welêt an...?*

- Na na, ji her çar aliyên Kurdistanê bûn. Enstîtu ji bo tevahiya gelê kurd e. Ew kurd ji kîjan perçê, ji ku dibe bila bibe Enstîtu wê alîkarê wî be.

Îcar ji wan kesên ku Enstîtuyê ew dane xwendin, hin ji wan îro li Fransa, li Kurdistan, li Swêdê xizmeta kultura kurdî dikin...

- *Kî ne ew ên ku li Swêdê xizmeta me a kulturî dikin?*

- Ez naxwazim navên wan bibêjim.

- *Ji bilî Swêdê...?*

- Ji bilî Swêdê, hin ji wan îro li zanîngehên başûrê welêt li Hewlêrê mamoste ne. Li Fransayê Hemît Bozarslan yek ji xwendekarên me bû. Ev mirov di warê xwe de, di sewiya rewşenbîrên ewrupî de tê qebûlkirin. Kitêbên wî hene. Bêtirîn sed meqalên wî ên zanistî derketine...

- *Belê di roja îro de, bi qasî ku ez tê digihêim, ji doktor, mihendiz, teknokratan û hwd. bêtir ew kesên filolog ango zimanzan û zimanas ji me re lazim in. Enstîtuyê çend zimanas gihandin? Di vî warî de çend akademîkerên me hene?*

- Dikarim bibêjim di warê edeb, dîrok û zimên de heta niha bêtirîn 50 xwendekarên me master an diktora çêkirine. Hin kes li ser pirsên gramerê, zimannasiyê xebitîne. Heta hebûna Enstîtuyê hin kesên ewrupî û emerîkî teşwîqî li ser kurdan, diktora çêkirin û kitêbên zanistî, kiriye. Di demên berê de ji sê, çar salan kitêbek, belê îro ji mehê carekê li ser kurdan kitêb çap dibin.

- *Li ser bursê ji kerema xwe re tu dikarî çend gotinan bibêji?*

- Dewlet bursê dide xwendekarên me. Di vir de Enstîtu wek referens e, yanî wasîteyek e. Enstîtu bi vê yeka ha karekî ku wê dewleta kurdî bikira, dike. Çimkî sitendina bursan karê dewletan e. Îcar dewleta Fransayê ev heqê ha tenê daye me û Filistîniyan. Dewlet, me wek du miletên bindest qebûl dike.

- *Enstîtuyê bi gelek zimanan bultenek peywendî û agahdariyan derdixist û li 85 welatan belav dikir. Ew bulten hîn dertê gelo?*

- Belê dertê û li 85 welatan belav dibe.

- *Hîç sekin ne ketê?*

- Naxer.

- *Ji kê re diçe?*

- Ji lêgeran, ji redaksiyonên hin rojnaman, ji parlementeran û hwd. re diçe.

- *Bulten di destpêkê de li dor 20 rûpelî bû. Gelo îro...?*

- Li dor 120 - 30 rûpelî ye.

- *Çi bi kovara "Studia kurdica" hat?*

- Me ev kovar di salên berê de bi frensî, erebî, farisî û tirkî derdixist. Îcar potansiyela zanistiya kurdî li gora ku me dixwest ya ewqas tunebû û ya jî me peyde ne dikir. Yanî meqalên zanistî kêr dihatin destê me. Di şûna wê de, em tevî zanîngeha Chicago rojnama "Journal of Kurdish Studies" derdixin.

- *Her ji çiqas wextî?*

- Bi giştî ji salê carekê, û bi inglîzî û fransî dertê.

- *Kovara Hêvî çima bi wext dernakeve?*

- Di dema ku me Hêvî derdixist, bi qasî ku ez dizanim, li seranserê Ewropayê tu kovarên xwerû bi kurdî dernediketin. Me dixwest ku em di nav kurdan de bi kurdî kovar derxistin bixin adê, îro li Ewropayê û bi taybetî li Swêdê gelek kovarên kurdî dertên. Di derxistina Hêvî de dezgehên fransî alîkarî bi me re ne dikirin. Herwekî kovar ba Õ ne dihat frotan ji alî aborî ve domandina wê dijwar bû.

- *Yanî hûn kovarê nema derdixînin?*

- Erê. Doh pêwîstî pê hebû, îro kesên din bersîva vê prisê didin...

- *Di rojnama Kurmancî de jî mîna ku problem heye. Mesele hejmarin jê carna pênc, carna çar, carna sisê, caran du rûpel in. Çima?*

- Rojnama Kurmancî her yek li gora encamên civînên me rû digire. Di hin civînên me de carna hin termên zimên bi hindik û carna jî bi gelek gotinan diqedin. Hejmara rûpelan bi gotinên heyî, peyde û çêkirina wan ve girêdayî ye.

- *Enstîtu li ser ferhengê kurdî - fransî ku wê ji 55 000 gotinan pêk bihata dixebitî. Ew xebat di çi rewşê de ye gelo?*

- Rehmetî Kamûran li dora 25 salan li ser xebitîbû. Û em jî 15 sal çêbû ku em li ser dixebitin. Em gihane tîpa "T." Em ferhengê derbasî kompîterê dikin.

- *Hûn ê xwe dûra jî dikarin derxînin. Tiştê ku wî nivîsîhû hûn çima dernaxînin?*

- Em dixwazin ku ferheng akademîk be. Di vê ferhengê de gelek tişt hene navê wan zelal ne bûne. Mesele nivîsandiyê: "cinsek nebat, cinsek çûk" û hwd. Navê van divê bînin nivîsandin. Ji bo vê yekê ha par biharê, me heyetek şand Kurdîstana Iraqê. Heyetê li wir navê gil û gihayên Kurdîstanê nivîsand û hem jî sûretên wan kişand. Em ê vê payizê dîsa karekî wiha bikin...

- *Hûn ê kengî ferhengê çap bikin?*

- Ez bawer dikim heta sal û nîvekê ew ê ji çapê re amade be.

- *Belkî baştir be ku ez bibêjim: "Celadet Bedîrxanin gunluk notlari" di sala 1995an de dikeve destê Malmîsanîj û ji teref wî di eynî salê de çap dibe. Mesele niha jî ferhenga ku Celadet Bedîrxan ji 630 rûpelî pêk anîbû, nîvê wê ketiye destê wî û ew jî li halê wê di kovara Wate de diweşîne...*

- Belê a me tişteki din e. Ferhenga ku di dest me de gelek gotinên wê tenê bi kurdî ne. Divê ku fransîziya wê bê nivîsandin. Nabe ku em li halê wê çap bikin...

- *Baş e, we ji bo zarokan çî kitêb çap kirin?*

- Berî niha jî min gotibû ku me ji bo xwendegêhên pêşîn û navîn ji zarokên Kurdistana Iraqê re li dor dused hezar kitêbî çap kirine û şandiye.

- *Aniha?*

- Aniha li Swêdê gelek kitêb çab bûn û hîn jî dibin. Em naxwazin vî karî dubare bikin. Tiştên ku tên çapkirin em wek Enstîtu belav dikin.

- *Enstîtuyê heta niha çend kasetên kurdî derxistine?*

- Ez bawer dikim li dor 20 kasetan.

- *Çend kasetên vîdeo?*

- Xweş nayê bîra min, belê gerek li dor 15, 16 kasetan be.

- *Çend sêlik?*

- Di katalogan de nivîsiye. Mesele yekem sêlika CD ya kurdî ji bo Şivan Perwer me alîkarî kiriye. Me li Fransayê şirketek dît, me pêşgotina wê nivîsand, wergera wê kir û belav kir.

- *Berhemên we digihên welêt gelo?*

- Li dinyayê hemî belav dibin. Enstîtu ji bo nasandina kurdan, karê belavkirinê bêtir li derve dike.

Me di sala 1991ê de çend kamyon berhemên xwe ji Kurdistana Iraqê re şandin. Berhem di nav xelkê de belav bûn.

- *Birêz Kendal hûn wek Enstîtu çiqasî li tiştên Celadet Bedîrxan xwedî derketine?*

- Li Enstîtuyê gelek kitêbên kevn û kitêbên kurdnasên wek Roger Lecot hene. Di vî warî de Enstîtu dewlemend e. Wekî din kitêb û destnivîsên Kamûran Bedîrxan û Hejar li Enstîtuyê civiyane. Heta me destnivîs û bîranînen Hejar bi tîpên erebî li Tirkî çap kir û şand Kurdistanê. Îcar herçi tiştên Celadet Bedîrxan in, malbata wî diyarî dabû Korî Zanyarî Kurdî. Piştî vebûna Enstîtuyê Rewşen Xanim bû mêvanê me û demekê li Enstîtuyê ma. Keça wi Sînemxan jî cara dawîn du sal berê hatibû Enstîtuyê...

- *Piştî mirina Rewşen Xanim çi bi malê hat?*
- Di wê demê de kurdên Binxetê li dor wê civiya bûn. Tiştên di malê de bi giştî gihaye wan.
- *Yanî we wek Enstîtu ji mala wê tişteke bi destnexist?*
- Naxêr.
- *Ji bo ku ew tişt li Enstituyê bicivin, we hewl da ku hûn wan tişt û miştan bi peran bikin?*
- Erê. Me heval şandin Binxetê û em hîn ji hewl didin.
- *Yanî yekê gava ku tişteki wî bifroşe we, hûnê bikin ne wisa?*
- Belê em ê bikin. Ne tenê ên Celadet, ên Hejar, ên Tewfik Wehbî û hwd. Ji em ê bikin. Gelek tiştên Hejar û Tewfik Wehbî gihane me. Ji Sovyeta kevn, kitêbên ku bi kurdî di salên 1920 - 30î de hatibûn nivîsandin û qet peyda ne dibûn, me bi destxist. Rêya Taze ji hejmara pêşî heta dawî li ba me heye. Di dest me de kitêbin wisa hene ku yeka wan, bi perên Swêdê bi 15 hezaran me kiriye. Gelek kitêb û nivîsên heja li Enstituyê berhev bûne.
- *Bi giştî ji sala 1989an vir ve civînên we ên li ser zimên li Stockholmê dibin. Di salên berê de ev civîn geh li Barselonayê, geh li Brukselê, geh li Bonê û hwd. dibûn. Çima li Stockholmê...?*
- ... Îcar piştî demekê me di civînan de dît ku ji % 80 beşdarên me li Swêdê dimînin. Hevalan ji aliyê pratîk û mesrefê ve pêkanîna civînan li Swêdê maqûltir dîtin. Her hevalekî me bi qasî 50, 60 kîloyî bi ferheng û kitêb beşdarî civînê dibin...
- *Ji salê çend caran hûn dicivin?*
- Du caran. Ew ji di bihar û payizê de.
- *We daye pêşiya xwe ku hûnê ferhengek bi kurmançî û akademîk derxînin. Di vê komika we a zimên de çend akademîker hene?*
- Xebata me a li ser kurmançî du armancên xwe hene. Yek, ew gotinên ku wînda bûne an li ber windakirinê ne wan derxîne holê. Dudu, nûkirina zimên e. Zimanê me ê niha zêdetir ê gundîtîyê ye. Ev ziman divê bersiva wextê bide. Helbet bi qasî xwe wextê dibersivîne, belê ne bes e. Zimanê me divê hem nûjen û hem jî bibe zimanê nivîskî.
- Îcar em bînin ser pirsê ku em çiqasî akademîker in. Eger em li bendî akademîkeran bimînin, yanî em pêşxistina zimanê xwe li hêviya heta ku akademîker ji me derkevin û em dûra dest bavêjin xebata zimanî, wî çaxî jî dibê ku ziman nemîne.
- Di nav komika me a zimên de beşdar tevîhev bi neh, deh zimanan dizanin. Û hin ji wan jî ilmê zimên baş dizanin.

- *Gelo we nikarîbû di her beşê zimên de komikên xebatê pêk bianiya? Yanî mesele termên hiqûqî bi hiqûqzanan, termên rojnamegeriyê bi rojnamegeran û hwd. bima û dûra jî ew gotinên wan di mista grûbek zimanasên kurd de durvê xwe ê dawî bistenda, xelkê jî wilo kiriye, wê ne baştir ba gelo?*

- Tu baş dibêji belê ka ew imkanên me! Di sala ku me Enstîtu damezirand rehmêtî Yilmaz Guney digot:

”Ji bo ku hûn bernama xwe bi hawayekî berfireh bi karbînin, divê ku salê bi hindikî pênc milyon frank butça we hebe. Ji hin kesan re bibêjin ji karê zimên pêve tu karê din nekin...” Belê ewqas imkanên me tunebûn, tunene. Helbet me pir dixwest ku li cihekî wek Diyarbekirê, her hefte em biciviyana û me ji temamê kurdan re bigota, îro civîna li ser zimên e; çî we heye werin bibêjin. Akademiya fransî ji heftê carekê kom dibe. Û dewlet jî mesrefê dike û meaşên wan dide. Imkanekî me î wisa tune ye mixabin. Em ji temamê lîteraturan beşên zimên bi çavkanî istifade dikin. Çi bi naman, çî bi telefonan be em bi wan kesên ku di vî warî de xebitîne dişewirin...

- *Hejmara beşdarên her tim wek hev nabe. Carna 16, carna 13, 14 û hwd. ye. Çima?*

- Ew jî bi imkanan ve girêdayî ye. Her hevalekî me karekî xwe heye. Mecbûr e bi karekî xwe û zarokên xwe bidebirîne.

- *Birêz Kendal, ez dixwazim çend pirsan jî di derbarê sereketiya te û rayedarên Enstîtuyê de bikim. Pirsek wiha, dibe ku vir ne cihê wê be, bibexişîne, belê ez dixwazim.*

- Rica dikim, ew çî gotine! Di warê sereketiya min û Enstîtuyê de tiştekî ku ez ê weşêrim an em ê nikaribin li ser bipeyivin tune ye. Ser çavan tu çawa dixwazî wisa bipirse.

- *Ji salên 1970î heta ku Sovyet têk diçe, li bakurê welêt dînamîzma kurdî di himbêza stalinîzmê de mezin dibe û karakter distîne. Û dûra jî heba dibe. Stalinîzma rûsî li Kurdistanê piştî ku sereketiya kurdî a kilasîk têk dibe, îcar ew bi xwe wek zir feodalekî modern têkiliyên feodalî modernîze dike û dibe împêretorekî ewrupî. Bi kurtî, yanî siyasetkirin û sereketî heta heta tenê heqê wî ye; her tiştê wî ye, ew e û bi wî heye.*

*Birêz Kendal a te jî nebe tiştekî wilo be gelo?*

- Na. Enstîtu ji sala 1983an heta sala 1993an ji aliyê hiqûqî ve wek komelekê bû. Civîna wê a giştî ji du salan carekê dibû. Endaman îdara heyetî û îdara heyetî jî wek federasyona we a li Swêdê di nav xwe de serek, cîgirê serek, sekreter û gencînedarek (xeznedar) hildibijart. Îcar di sala 1993an de piştî ku Enstîtu dibe weqf, destûra me tê guhertin. Niha li dor şêst endamên me hene. Bi van endaman ji sê salan carekê civîna me a giştî dicive. Di nav Enstîtuyê de pênc şax hene: Şaxê ziman û edebiyatê, şaxê zanistên civakî, şaxê

muzîk û hunerê, şaxê karên civakî û şaxê mafên mirovî û agahdariyê. Îcar endamên van şaxan di nav xwe de dicivin, serekê xwe hildibijêrin û serekên wan jî yekser dibin endamên heyeta îdarî.

- *Yanî ji van pênc şaxan pênc serek tên hilbijartin?*

- Belê. Îcar di civîna giştî de a ku bi temamê endaman diciviya, çar kesên din jî wek endamên taybetî ên heyeta îdarî tên hilbijartin. Ji van çar kesan dudu jê ji bo şeş salan. Ev neh kes sê şexsiyetên kurd ên srbixwe heldibijêrin ji bo Heyeta îdarî û di nav xwe de serek, du cîgirên serek, sekreter û gencînedarekî hildibijêre.

- *Îdara heyetî her ji çiqas wextî dicive?*

- Heyet bi kêmanî salê du caran dicive, li ser maliya Enstîtuyê û bernama wê û hwd. biryaran dide.

- *Cîgirên serek kî ne?*

- Yek jê profesor Ebas Welî, kurdê Iranê ye û ê din jî ji başûrê welêt Prof. Fûat Huseyn e.

- *Gencînedarê we?*

- Profesor Joyce Blau ye.

- *Baş e, endamên Enstîtuyê hemû beşdarî civînên we ên giştî dibin gelo?*

- Erê dibin. Dema ên ku bi şexsê xwe, ji ber hin sebebên wek nexweşiyê û tiştên wiha nayên, ew jî bi wekaletnamê raya xwe bi kartîne.

- *Birêz Kendal, ji sala ku Enstîtu dadimezire heta niha, tu sereketiyê lê dikî. Çima her û her tu serek î?*

- Eynî vê gotina te di her civînê de ez bi xwe ji hevalan re; "eger hin ji we xwe bidin pêş û bixawazin karê sereketiyê bimeşînin, ez ê pir kêfxweş bibim..." dibêjim. Belê nabin.

- *Çima?*

- Serekbûn ew e ku gerek ji Enstîtuyê re butçê peyde bike. Butçe peydekirin jî karekî giran e. Divê ku projan çêkî, dîplomasîyeke xurt bikî, têkiliyan bi vir û wir ve deynî, heval û dostên biyanî peyda bikî ji bo doza kurdî, zimanên ewrupî gelek bin, tu zimên baş bizanibî, beşdarî konferansan bibî, di radyo û televîzyonan de biaxivî, di rojnaman de binivîsînî û hwd. Sereketiya Enstîtuyê ne wek ku ji dûtir ve xuya dike tiştêkî wisa hêsan e. Enstîtu li ser pirsê kurdan ji bo ewrupîyan bûye referans. Ew kesê ku wê sereketiyê lê bike, divê wî cihî dagire. Îcar ev dîtina hevalan e ku ez kirime serek. Digel ku hêdî hêdî karê min di nav Enstîtuyê de kêmkirî û hevalên wan karan bi rê ve dibin, dîsa jî qebûl nakin ku ez dev ji sereketiyê berdim. Dibêjin: "Qet nabe! Ji bo rêzdariya Enstîtuyê, ihtîbara wê û peydekirina imkanan ku binav be jî tu bimînî wek serek, baş e". Îcar ev tiştêkî ne tenê di nav me de ye.

- Mesele?

- Mesele sekreterê giştî ê Akademiya fransî 24, 25 sal e ku li Akademiye sekreteriyê dike. Enstîtu ne wek komele, rêxistin û partiyên siyasî ye; ew rêxistineke akademîk û cihê zanistiyê ye. Di rêxistinên zanistî û akademîk de mirov jî wek sekreterê akademiya Swêdê ê internasyonal Olof Tandberg ku 30 salî herwiha sekreterî kir, dikare serek bimîne. Îcar ev nayê wê manê ku di vir de tiştêkî antî demokratîk dibe...

- Yanî sereketiya te, ne ji rengê sereketiya hin partiyên kurdan e?

- Eger ez xwedî zihniyetek wisa bama, belkî min ê jî bikarîba çend sed kes peyda bikira û partiyek dameziranda. Di hikmê pazdeh salan de bi cihkirin û tekûzkirina mueseseyek wek Enstîtuya Kurdî ku ji dema hatiye damezirandin heta niha bêwestan dewleta tirkî û hevalbendên wê bi xurtî êrîştî ser kirine û dikin, ne karekî ewqasî rehet bû. Enstîtu îro ji aliyê hiqûqî ve gihaye wê sewiyê ku dewletê statuya girîng a "weqfa ji bo berjewendiya giştî" daye pê. Yanî ew ê her tim imkanên wê hebin û neyê girtin. Armanca min û hevalên me ew e ku em Enstîtuyê bi her hawayî dewlemend bispêrin nesîlên bi dû xwe de. Ne ez û ne jî endamên Enstîtuyê kesek ji me bi dû mezinahiyê de ne geriyaye. Ji bo sereketiya min, ji hevalan hîç problem derneketiye. Her tişt li ser daxwaziya me hemiyan dibe û dimeşe. Me antî demokratîk tiştêk ne kiriye...

- *Birêz Kendal, berî ku em bi çend gotinên te ên daxwaz, dawî li hevpeyvîna xwe binin, wek pêşneyar dixwazim bibêjim, di vê dewra ku berê her kurdekî li derekê ye, gerek ne sereketiya Enstîtuyê bê guhertin û ne jî endamên wê zêde bibin. Enstîtu bi hemû kêmaniyên xwe, dîsa jî dezgehekî kurdî milî ye. Di nav vê mij û borana îro de, leqandin û cîguherandina keviran dikare dîwêr biherifîne. Ez wilo difikirim.*

*Di dawîya hevpeyvîna me de tu dixwazî çi bibêjî?*

- Daxwaziya min ji wan kesên ku bi kultur û çanda kurdî mijûl dibin ew e ku di xebata xwe de, tucarî nekin nav bêhêvîtiyê û dîrokî bifikirin. Dema dîrokê demeke dirêj û a mirov kin e. Karê dîrokî ji bo gel û mîlet e. Ew ên ku kovar û kitêbên kurdî derdixînin, karekî dîrokî dikin. Em mîletek in û mîlet jî bêkultur û çand nabe. Kultur û çand jî bi derxistina kovaran, rojnaman, kitêban û hwd. dibe. Asîmilasyona tirk, pir bi dijarî me ji zimên dike; bi hemû qewet û hêza xwe em mecbûr in li himber vê asîmilasyonê bisekin!

- *Ji bo vê hevpeyvînê careke din spas dikim.*

- Ez jî spasî te dikim û ji komela we re serketinê dixwazim.

# Edebiyat û teorî

N. Zaxuranî

Mirovê ku haya wî di serpêhatina dîrokê de ji geş û balbûna zanistîya edebî hebe, rind dizane ku zanistîya edebî birek ji birê zanistîya filolojîkî ye û mirov bi hêsanî dikare zanistîya edebî mîna xalekî ji xalê bîrewerîya hunerî ya bedew dest nîşan bike. Zanistîya edebî mîna bîrewerîyeke bi reng dîrokî xwedîyê peywendîyên gelekî organîkî ye bi bîrewerîyên ku dîroka mirovantiyê ya hevbeş di serpêhatina dem û dewranan de ji xwe re dikin mijar. Bêguman, zanistîya edebî bi alîkarîya zanistîyên bi reng dîrokî li ser mijara xwe ya ku timamê zanistîya edebî ya gelê cîhanê ji xwe re dike amanc, lêkolînên cur bi cur li dar dixê, qanûnên wê bi gelek alî şirove dike û pêşkêşî girseyên gel dike. Lê divê baş bê zanîn ku, mirovê edebîyatzan bi tenê li ser hîmê zanistîya filolojîkî û yê zanistîya edebî nikare mîna ku jê tê xwestin kar û barê xwe yê di derbarê zanistîya edebî de bi rê ve bibe. Li ser bingehê prensîbên zanistîya filolojîkî û yê zanistîya hunerî mirovê edebîyatzan mîna mirovên ku li ser muzîk û şanogerîyê û hwd. mijul dibin, pîvanên teorîyeke zanistî ya ku afirandina hunerî ji xwe re dike mijar di serpêhatina kar û xebata xweyî edebî de peyde dike. Bêguman, amanc ji vê teorîyê ew e ku, mirovê edebîyatzan bi alîkarîya wê bikaribin berhemên hunerî - çî ji alîyê naveroka wan ve bê û çî ji alîyê forma wan bê - bi gelek alî şirove bikin.

Na xwe, bêyî teorîyeke bi reng hunerî ya ku berhemên edebî ji xwe re dike mijar, mirov weha bi hêsanî nikare pîvanên edebî yên ku ji zanistîya edebî re dibin bingeh, hîn bibe. Ji bona vê yekê jî, divê mirovê edebîyatzan ji bo her birê hunerê teorîyeke ku li ser wî birî mijul dibe, biafirîne. Vêca mîna ku bi hêsanî tê xuyakirin, bêyî bi destxistina teorîyeke ku edebîyata bedew ji xwe re dike mijar, dê mirov nikaribe kar û barê xwe yê hunerî mîna ku ji mirovî tê xwestin, bi rê ve bibe. Bela vê yekê jî, gava ku mirov li ser kar û barê edebî mijul dibe, divê ku ji alîkî ve haya mirov ji diroka zanistîya edebî di serpêhatina dem û dewranan de hebe, ji alîyê din ve jî divê ku, mirov di warê teorîya edebî de jî xwedî agahdarîyên bi rêk û pêk bê, da ku mirov bi alîkarîya vê yekê bikaribe pirsgirêkên zanistîya edebî di hemû warê jîyanê de şirove bike.

Weke ku tê zanîn, teorîya edebî mîna şaxek ji şaxê zanistîya edebî xwedî



dirokeke gelekî kevnar e. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku teorîya edebî bi peydebûna jiyana civakî ya bi reng dûrokî re hatiye pê. Herşiqas edebîyatzanên ewrûpî geşbûna dîroka edebî bi dîroka Yewnanîyên Kevnar re dest pê dikin jî, di rastîya xwe de ew gelekî kevnartir e. Lewra berî dîroka Yewnanîyên Kevnar mirov li Mezra Botan û Misra Kevnar leqayî belgeyên bi reng edebî tê. Lê bêguman, bi berhemkirina berhema bi navê "Poetîka" ya ku ji aliyê Arîstîteles ve hatibû berhem kirin vir ve, mirovantîyê bêtir bi awayekî tekûz li ser pîrsgirêkên zanistîya edebî serê xwe êşand. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku, bi alîkarîya vê serêşandinê, pîrsgirêkên zanistîya edebî di gelek waran de hatne çareser kirin. Lê çi heyfa ku li welatê me herçend hewldanên bi vî rengî ji aliyê rewşenbîrên me kurdan ve hatibin li dar xistin jî, ji ber pîkolîya hêzên dagirker yên ku welatê me di nava xwe de parve kirine, nehiştin ku ronakbîrên me vî kar û barê xwe bi rêk û pêk bi rê ve bibin. Ji ber vê yekê jî, edebiyata me ya netewî di hemû warê jiyane de qals û sitûxwar ma.

Ji aliyê din ve jî gava ku mirov li dîroka zanistîya edebî dinere, mirov dibîne ku li ser teorîya zanistîya edebî herdem du baskan / meylan li himberî hev têkoşîneke bêhampa li dar xistine. Baskekî ji wan baskan herdem hewldaye ku bi awayekî paşverû ango, li gor berjewendîyên çîna burjuwa kar û xebateke xwe bi rê ve bibe. Bi qasî ku tê zanîn, nûnerên vî baskî xwestina ku bi kirinên xwe ramanên bi reng îdîalîstî belav bikin. Heta mirov dikare bi hêsanî bibêje ku nûnerên vî baskî tew li nerînen Hegel yên di derbarê huner de jî xwedî derneketin. Ji ber ku Hegel, herdem hewl dide ku nerînen xwe yên hunerî li ser bingehê jiyana civakî ya netewî ava bike. Lê ji berevajî, nûnerên vî baskî roj bi roj kar û xebata xwe ya hunerî ji nerîneke ku bingehê xwe ji jiyana civakî ya netewî digre, dûrxistin. Heta ku ji wan hat, nerînen xwe yên edebî li ser nerînen formalîzmê û struktualîzmê bi cih û war kirin. Bêguman, îro roj jî, nerînen vî baskî bûne bingeh ji bo edebîyatzanên ku kar û xebata xwe li gor pîvanên formalîzmê û struktualîzmê bi rê ve dibin.

Li himberî vê yekê, di serpêhatina geşbûna teorîya zanistîya edebî de hinek baskên din yên ku bi bîrewerî serê xwe li ser pîrsgirêkên edebîyatê êşandin, bi nerîneke materyalîstî kar û barê xwe yên edebî li dar dixistin. Di vî warî de, gavên pêşî hê ji serdema ronakbîrîyê ve li Germenîstan û Fransayê bi pêşîvantîya mirovên mîna Deniz Diderot û G. Lessing hatin avêtin. Van kesên bi nav û deng, bi alîkarîya berhemên xwe yên edebî hewldan ku pîrsgirêkên teorîya zanistîya edebî bi nerîneke materyalîstî zelal bikin.

Herweha li Rûsyayê jî, bi saya mirovên mîna Çernîşevskî, Belinskî û N. Dobrolyubov nerînen materyalîstî bi awayekî sistematîkî di nava girseyên gel de bi bîr û bawerî hatin belav kirin. Heta bi roja me jî, gelek nerînen van mirovên gernas yên ku bi zanistî di derbarê teorîya zanistîya edebî hatine dest nîşan kirin, bi kêrî kar û barê edebî tên. Lewra kar û barê van mirovên gernas yên ku ji bo geşbûna dîroka edebî hatine pêk anîn, bi kêrî mirovên ku serê xwe

li ser edebîyatê têşînin, tê. Bela vê yekê jî, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku kar û barê wan yên edebî bingehekî gelekî resîden(asaî) ji bo pêşxistina teorîya edebî danî.

Ji bo kar û barê pirsgirêka teorîya edebîyatê mîna ku tê xwestin ber bi geşbûna xwe ve biçe, divê ku di derbarê wê de lêkolîn bèn li dar xistin. Lewra teorîya edebî ji bo şirove kirina dîroka edebîyata gelan di serpêhatina dem û dewranan de gelekî girîng e. Ji ber ku, heger di destê mirovê ku li ser dîroka edebîyatê lêkolînan li dar dixê, teorîyeke edebî ya ku taybetmendiyên berhemên edebî bi alîkarîya mefhûmên bi reng edebî analîz dike, nebe, dê weha bi hêsanî nikaribe vî kar û barê xweyî bi gelek alî û sext bi rê ve bibe. Bela vê yekê jî, divê ku berîya hertiştî naveroka van mefhûmên edebî gelekî zelal û vekirî be. Heger weha nebe, dê pêkanîna lêkolînen bi reng edebî yên ku ji bo pêşxistina teorîya edebî tèn li dar xistin, ne bi rêk û pêk be.

Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xuya kirin, ji bo ku mefhûmên zanistîya edebî di serpêhatina geşbûna dîroka edebîyatê de bi cih û war bêne kirin, pêwistîyeke herî mezin bi teorîya edebîyatê heye. Ji ber ku, bêyî teorîyeke bi reng zanistî ya edebîyatê, dê weha bi hêsanî mirov nikaribe alêtên edebî yên ku ji bo kar û barên edebî pewist in, bi dest bixe. Ji xwe, mîna ku têzanîn, mirovên dîrokzan bi alîkarîya mefhûmên edebî kar û barê xwe yê piroz bi rê ve dibin. Lê çî heyf e ku edebîyata me ya netewî hê ji ber sedemên ku têne zanîn û bêtêrîya rewşenbîren me kurdan nebûye xwedîyê mefhûmên ku dibin alet ji bo bi rêvebirina kar û barên edebî di serdema taze ya geşbûna dîroka edebîyata me de.

Baş e, mirov dikare bi çî awayî têkilîyên organîkî yên di navbera serpêhatina dîrokê û teoriya edebîyatê de dest nîşan bike? Mîna baş tê zanîn, serpêhatina - çî serpêhatina dîroka huner be û çî geş û balbûna serpêhatina dîroka netewî be - dîrokê bingehekî bi rêk û pêk ji bo vejandina teorîya edebîyatê dideyne. Li ser vî bingehê resîden teorîya edebîyatê dibe alîkar ji bo dîroka huner di serpêhatina dem û dewranan de. Bêguman, bi alîkarîya naskirina dîrokê jî, teoriya edebî bêtir geş û bal dibe. Ango ji alîkî ve, mirovê edebîyatzan bi alîkarîya teorîya edebî rind hîn serpêhatina dîroka edebîyatê dibe, ji aliyê din ve jî teoriya edebî bi alîkarîya vê yekê her ku diçe, bêtir bi wate û tekûz dibe. Heger ku mirovê edebîyatzan bi alîkarîya van peywendiyên bi du alî yên di navbera dîroka huner û teorîya edebîyatê de bikaribin encamên hêja û delal bi dest bixin, bêguman, hingê jî tu kes dê nikaribe pêşî li ber geşbûna edebîyatê ya netewî bigire. Ji bilî vê yeke jî, mirov baş dizane ku rengê objeyan / fenomenan çî dibe bila bibe, bêyî dîrokeke xwe î serbixwe obje / fenomen nabin xwedîyê teorîyeke bi reng dîrokî. Herweha, her obje / fenomen bi saya teorîya xwe ya bi taybet dibe xwedî pîvan û bi alîkarîya vê yekê jî, tixûbên wê têne dîyar kirin. Ji ber vê yekê jî, tu obje / fenomen nikarin hebûna xwe ya bi reng jiyani- ya ku di navbera dîrokeke bi sînor de tê pê - bidomînin ku

nexwedîyê teorîyeke xweyî bi taybet bin. Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xuya kirin, têkilîyên di navbera teorî û diroka huner de organîk in.

Bi rastî jî, gava mefhûmên ku mirov bi alîkarîya wan bikaribe li ser objeya edebîyatê û pîvanên wê mijûl bibe, nebin, mirov nikare bi awayekî bi rêk û pêk li ser diroka edebîyatê jî kar û barên zanistî li dar bixe. Ji ber ku, mirov hingê baş nizane edebîyata hunerî nas bike, bê kîjan berhem dikarin diroka wê bi me bidina naskirin û bê mirov kîjan berhemana mîna berhemên edebî dest nişan dike, dê mirov weha bi hêsanî ji haq dernekeve.

Vêca heger ku di destê mirovê dirokna de sistemeke ku mefhûmen edebî li dorbera wê hatine rapêçan nebe, dê mirovê dirokna weha bi hêsanî nikaribe kar û bare xwe ê bi reng edebî / hunerî li ser objeya edebîyatê bi awayekî tekûzî zelal bi rê ve bibe. Ji ber vê yekê jî, divê ku mirovê edebîyatza bi tenê serê xwe li ser berhemên edebî bi awayekî vêl neêşine. Ji berevajî, divê ku ew li ser pirsgerêkên edebî bi gelek alî bi hêvîya ku bikaribe karmendîyên (wezîfeyên) xwe yên bi reng dirokî ku ji bo geşbûna edebîyate girîng in, bi cih bîne. Ji xwe, mîna ku tê zanîn, sistema mefhûman ya ku ji aliyê teorîya edebî ve ji bo mirovê ku li ser diroka edebîyatê lekolînan li dar dixê, tê pêşkêş kirin, gelekî rengîn e. Ji ber sistema mefhûman, ji gelek warên jiyane yên ji hev cuda tê berhev kirin. Bela vê yeke jî, mirov dikare wê mîna fenomeneke heterojen dest nişan bike.

Berîya hertiştî divê rind bê zanîn ku teorîya edebîyatê pêşiyapêşî li ser mefhûmên ku ji bo objeya edebîyatê girîng in, piralî radiweste. Ji xwe ev kar û bar jî bi gelek alî û tevlihev e. Jê re kar û xebateke dijwar tê xwestin. Ji bo ku bê edebîyata bedew çî ye û li ser çî bigehî tê afirandin, pêwîst e ku mirov van pirsên jêrîn ji xwe bike: Çî cudabûn di navbera naveroka edebîyata bedew û di navbera naverokên bîrewerîyên din yên bi reng hunerî de hene? Ma gelo aliyê îdeolojîkî yê edebîyata bedew heye û mirov bi alîkarîya vê yekê dikare çî jê hîn bibe? Ma gelo edebîyata bedew li gel taybetmendîyên xwe yên xweser xwedî peywendîyên bi reng organîkî ye bi diroka netewî re, an na? Bêguman ji bo ku mirov bi hêsanî bersiva van pirsan bide, divê ku mirov di derbarê edebîyata bedew de xwedî xezîneyeke mefhûman ya bi reng edebî be.

Di vê pevgirêdanê de, aliyekî din yê teorîya edebî heye: Bêguman ev alî jî ji bo nirxandin û şirovekirina geşbûna edebîyatê di serpêhatina dem û dewranan de gelekî girîngî bi reng jiyane ye. Mîna ku tê zanîn, di serpêhatinên bi reng dirokî yên ji hev cuda de, edebîyata bedew ya netewî mîna şaxê huner yê din, çî di warê naverok û çî di warê forma xwe de li gor qanûnên xwe yên bi taybetî tê guhertin. Ji bo ku mirov bikaribe vê guhertina bi reng dirokî li gor pîvanên teorîya edebî binirxîne, divê ku di destê mirov de sistemeke mefhûman ya bi taybet hebe. Ji ber ku gava mirov li diroka huner dinere, mirov leqayî şaxê huner yên cur bi cur tê. Nimûne; epîk, lirîk û dramatik. Bêyî teorîyeke edebî

ya ku xwedîyê sistemeke mefhûman e, mirov weha bi hêsanî nikare cudabûnên di navbera van şaxên huner yên ji hev cuda de, bibîne. Ji xwe bi geş û balbûna huner re cureyên huner ji hêdî bi hêdî tèn guhertin. Mirov dikare pirs bike: Ma gelo bi vê guhertinê re çi taybetmendîyên xweser tèn meydanê? Nimûne, di navbera poem û romanê de çi cudabûn hene? Ma gelo komedyaya û tragedya di kîjan waran de ji hev cuda dibin? Ma gelo di serpêhatina dîrokê ya neqşîn de çi cudabûn di navbera tevgêrên edebî yên mîna sentîmantalîzmê, realizmê û klasîsmê û hwd. de hene? Bêguman, mirov dikare di vî warî de listeya pirsan dûdirêjtir bike. Lê di vê pevgirêdanê de ya girîng ew e ku, mirov li ser mijara xwe hur û kûr bibe.

Vêca mîna ku bi hêsanî tê xuya kirin, bêyî têoriyeke edebiyatê mirov weha bi hêsanî nikare mefhûmên ku van tevgêrên edebî yên ji hev cuda û rengîn bi perspektiveke edebî binirxîne û mîna ku ji mirovî tê xwestin wan şirove bike.

Jî bilî vê yekê jî, aliyekî din yê pirsgirêkê heye ku ji bo nirxandin û şirovekirina naveroka berhemên edebî gelekî girîng e: Ji ber ku bi alîkariya vî aliyê teorîya edebî mirov hînî aletên ku naveroka berhemên edebî bi alîkariya wan tê hunandin, dibe. Ma gelo zimanê berhemên edebî bi çi awayî tê hunandin? Ma gelo xweserîya vegotina zimên ji yên din çawa tê cuda kirin? Dema ku mirov behsa kompozîsyona berhemeke edebî dike, divê ku çi jê bê têgihîştin? Aliyên naveroka berhemên edebî bi çi awayî bi hev re tèn girêdan? Bêguman, pirsên weha bi vî rengî bi xwe re hinek mefhûmên bi taybet yên ku ji bo naveroka berhemên edebî zehv girîng in, tînin. Ji ber ku, bêyî alîkariya van mefhûman - ku bi awayekî kurt di pirsên jorîn de bahsa wan hate kirin - mirov weha bi hêsanî nikare pirsgirêkên naveroka edebî çareser bike.

Di prosesa ku mirovê edebîyatzan li ser edebiyata netewî kar û xebatên zehvalî li dar dixê, divê ku haya wî ji van pirsgirêkên teorîyê yên ku di rêzên jorîn de bahsa wan hate kirin, hebe. Ji ber ku, ev pirsgirêkên teorîyê dibin bingeh ji bo teorîya edebiyatê ya ku mirovê edebîyatzan bi alîkariya wê hewl dide ku pirsgirêken edebî yên ku ji bo naverok û forma berhemên edebî girîng in, çareser bike. Vêca mîna ku bi hêsanî tê xuya kirin, peywendîyên dîrok û teorîya edebiyatê bi hevdu re organîkî ne û bi alîkariya van peywendîyên bi reng dîyalektîkî mirovê edebîyatzan hewl dide ku pirsgirêkên zanistîya edebî di hemû warê jiyane de çareser bike.

Lê çi heyf e ku gava mirov di vî warî de li rewşa edebiyata me ya gelê Kurdistanê dinere, mirov bi çavên serê xwe dibîne ku edebiyata me ya netewî ne di rewşeke baş de ye. Ji ber ku gava mirov li berhem û nivîsên ku ji aliyê ronakbîrên me ve têne berhem kirin û dî kovar û rojnameyên me yên bi reng edebî de têne weşandin, dimeyzêne, hingê ji mirovî ve tê xuya kirin ku haya gelek nivîskarên me ji pîvan, teorî û fonksiyonên edebî nîne. Dê ji ber vê yekê be, gava ku mirov berhemê wan ji aliyê naverok û formê ve bi awireke edebî

analîz dike, berhemên wan ji aliyê naverok û forma xwe ve gelekî qals in. Bela vê yekê jî, divê nivîskar û ronakbîrên me yên ku bi kar û barê edebî dilebikin - bi çi awayî dibe bile bibe - xwe di warê teorî û dîroka edebîyata me ya netewî û cihanê de bigihînin, da ku mîna mirovê têgihîştî bikaribin dest bavêjin pirsgirêkên edebî. Ji ber ku, hê edebîyata me ya netewî di gelek waran de, di destpêka xwe de ye.14 , 5, 1998 Stockholm

---

## Dîsa

### Lezgîn Salih

Dîsa bû şev, hawîrdor tarî û zilûmet.  
Çirîskên rojê, çavên şevê radikenin;  
çavên şevê di ruyê rojê de dibiriqin;  
Xwedê li ser eynikên xwe yên şikestî digirî.  
Bayê bakur daristanan dipêçin,  
ewrên di nav pêlên bahrê de  
li ezmên dibin baran.  
Dar şîn dibin di rojê de,  
û tîrêjên rojê çiçekên  
behîvan dixemilînin.  
Mirov li ser serê xwe bi rê ve diçin.  
Ez li ser miriyên xwe dikenim!  
kes miriyên xwe êdî venaşêrin.  
Find dihelin, lê xurt dibin;  
reşayî ronahiyê vedişêre,  
û ronahî reşayê.  
Mirov dikenin, dema ku diqeherin.  
Û digirîn.  
Dema ku kêfxweş in, rastî derewan dike,  
û nerastî bûye rastî.  
Derya xwe di zikê masî de vedişêre.  
Û ro di heyvê de.  
Zaroka ku di zikê dê de, ji dê xurtir e.  
Û bişkovên gulê ji gulê.  
Hêlîn di zikê çûkan de,  
û çûk di hêlînan de.  
Û ez li ser heft tebeqên ezmanî li wan dinerim!...

# Sed sal têkoşîna nivîskî

Malmîsanij

Wergera ji swêdî: **Serdar Roşan**

Guhdarên hêja,

Îsal salvegera sedsalî ya rojnameya kurdî ye. Navê rojnameyê Kurdistan bû. Yanî sed sal berê rojnameya kurdî ya pêşîn derket. Ez dê di vê civînê de li ser çapemeniya kurdî bipeyîvim. Lê ez dê behsa rewşa îro nekim; ez dê behsa çapemeniya kurdî û paşxana wê ya tarîxî bikim. Eşref Okumuş dê li ser rewşa îro ya çapemeniya kurdî qise bike.

Ji bo ku ez nizanim ka agahdariya we derheqê kurdan û gelşa kurdî de çi qas e, gava min xwest çarçoweya axaftina xwe deynim ez pêrgî dijarîyê hatim; lê bi hizira ku hûn ne xerîbê gelşê ne, ez sererast derbasî behsa çapemeniya kurdî dibim.

Rojnameya pêşîn a kurdî, Kurdistan, di sala 1898an de li Qahîreyê hat weşandin. Wê gavê Împeratoriya Osmanî bi şeweyeke otokratîk û despot dihat îdarekirin. Lêbelê li dijî Sultan mixalefeteke xurt hebû. Di destpêka sedsala 19an de Turkiye, Yewnanistan, Arnawudistan, Bulgaristan, Yugoslavya, Bosna-Hersek, Lîbya, Misir, Erebistana Siûdî, Îsraîl, Libnan, Urdun, Îraq û Sûriyeya iro di nav sînoren Împeratoriya Osmanî de bûn. Yanî yewnanî, arnawud, bulgar, sirb, ereb, cuhî, kurd, ermenî, asûrî, laz, çerkez di bin hukumdariya vê împeratoriye de bûn. Hin ji van xelkan di sedsala 19an de ji bo serxwebûnê şer kir û bi alîkariya dewletên ewrûpî yên mezin jî serxwebûna xwe bi dest xistin; bo nimûne yewnaniyan. Hinên mayî jî bi taybetî xelkên îsewî (xirîstîyan) têkoşîna xwe li dijî Împeratoriya Osmanî, ji bo serxwebûn an jî otonomî domandin; bo nimûne sirb, bulgar û ermenî. Piştê ji tevgera xelkên misilman, tevgera millî ya ereban li dijî osmaniyan dest pê kir. Gelek roşnîr û neteweperwerên van xelkan piştgiriya mixalefeta li dijî Sultan dikir. Lê kesên mixalîf bi cezayên giran dihatin mehkûmkirin û sirgûnê welatên dûr dibûn; wek Lîbya û Erebistana Siûdî. Kurdê ku li Qahîreyê rojnameya Kurdistan derxist yek ji wan mixalîfan bû. Wê gavê gelek kes ji

---

\* Ev nivîs, tekstê wê axaftinê ye ku di hefteya kurdî de, di 2. 3. 1998an de, li Stokholmê hatiye kirin.

wan mixalifan li Misirê dijiya; yên ku ji cihên sirgûnê reviyabûn li bajarên mîna Qahîre, Parîs, London, Zurîh û Romayê bi cih bûbûn.

Ji ber ku Miqdad Bedirxan ê ku rojnameya Kurdistan derdixist nexweş ket, birayê wî Ebdurehmanî berpirsiyariya rojnameyê ji hejmara pêncan pêve girt ser xwe. Ebdurrehmanî pêşî li Zurîhê, paşê li Qahîreyê, piştî li London û Folkstonê heta bi hejmara 31ê ev rojname derxist.

Civaka kurdî, civakeke feodal bû û kurd bi sultanê osmaniyan re sadiq bûn; herweha li gorê wê demê paş de mabûn. Tevgera millî li cem kurdan, li gor xelkên ku min destnîşan kirin, derengtir dest pê kir. Herweha rojnamegeriya kurdî jî bi giştî bi tevgera millî re mil bi mil pêş ketiye. Yanî kurdan piştî yewnan, ermenî û arnawudan rojname derxistine. Kurd ji van xelkên diyarkirî bi şûn de û osmanî jî ji milletên rojavayê bi şûn de bûn. Bo nimûne, sala 1454an Gutenberg kitêba pêşîn çap kir. Li çapxaneyê Îbrahîm Muteferrika -ku çapxaneyê pêşîn a osmaniyan bû- sala 1729an kitêba pêşîn hate çapkirin (yanî piştî 275 salan).

Kitêba kurdî ya pêşîn a ku bi herfên erebî li Istanbûlê, di sala 1844an de hat çapkirin diwana sofîyê navdar ê kurd Mewlana Xalidê Neqşîbendî bû. Kitêba kurdî ya ewil a bi herfên ermenî, încîlek bû ku di sala 1857an de hat çapkirin.

Di sala 1861ê de bi herfên alfabeya ermeniyan alfebeyeke kurdî li Istanbûlê hat çapkirin. Alfabeya kurdî ya bi herfên erebî di 1909an de lê a bi herfên latînî (a Celadet Bedirxan) di 1932an de hat çapkirin (berî wê, di 1929an de li Rewanê bi navê "Ronayî : Kitêba Ewl Zmanê Kirmançî" kitêba Î. Marogulov û Dramvyanî derketibû).

Heçî rojnamegerî ye, rojnameya pêşîn a bi tirkî Takvim-i Vakayi sala 1831ê (yanî 222 salan piştî derketina rojnameya pêşîn a almanî) derket. Û wek min berê gotibû rojnameya kurdî ya pêşîn di sala 1898an de, yanî ji ya tirkî jî bi derengtir hatibû weşandin.

Bedirxaniyan piştî rojnameya Kurdistanê di sala 1900î de li Qahîreyê rojnameyeke din jî derxist. Di sala 1908an de li Turkiyeyê şoreşek burjuva-demokrat çêbû û îdareyek meşrûfî saz bû. Di eynî salê de kurdan cara yekemîn li Istanbûlê komeleyek millî ava kir û sê rojname derxistin. Di sala 1909an de li Kurdistanê, li Diyarbekirê, cara yekemîn di rojnameyekê de tekstên kurdî hatin weşandin.

Lêbelê di sala 1909an de rojnameyên kurdan hatin qedexekirin û berpirsiyarên wan hatin girtin û teqîbkirin. Pîremêrd (M. Tewfîq) û Sureyya Bedirxan bi daxwaza îdamê hatin mehkemekirin. Sureyya bi îdamê mehkûm kirin lê paşê cezaya wî hate guhertin û ew sirgûn kirin.

Di sala 1913an de li Istanbûlê sê kovarên din hatin weşandin. Di sala 1914an de li beşê Asyayê, li rojhelatê Împeratoriya Osmaniyan, li Bexdadê

cara yekemîn kovarek kurdî hate weşandin.

Piştî Şerê Cihanê yê Yekem rewş hinek hatibû guhertin. Hêza osmaniyan kêmbû. Îngilîzan Kurdîstana Iraqê ya îro û frensiyan Kurdîstana Sûriyeyê ya îro dagir kiribû. Paşê, gava tirk mexlûb bûn îngilîzan Istanbûl jî dagir kir. Kurdan nisbeten jî bêhêzketina osmaniyan îstîfade kir û di navbera salên 1917-1920î de sê kovar li Istanbûlê, yek li Qahîreyê û yek jî li Diyarbekirê derxistin.

Siyaseta îngilîzên ku Iraq û Kurdîstana Başûr xistibû bin destê xwe jî ya tirkan cihê bû. Şûna ku kurdî qedexa bikin, wan di bin kontrola xwe de, li Silêmanî û Bexdadê jî bo propagandaya xwe û kêrî xwe dest bi weşana kovarên kurdî kir. Wan propagandaya xwe bi kurdî dikir. Di navbera salên 1918-1925an de bi kêmasî sê kovar derxistin. Li başûrê Kurdîstanê kurdan li dijî îngilîzan, di bin rêberiya Şêx Mehmûdê Berzencî de şer dikir. Şêx demekê xwe melîkê Kurdîstanê îlan kir. Di navbera salên 1922-1927an de kurdan li Silêmanî û Bexdadê heft kovar derxistin. Li başûrê Kurdîstanê weşana rojname û kovarên kurdî dom kir. Ez dê li vir bêtir li ser Kurdîstana Bakur rawestim. Min dixwest ez behsa çapemeniya kurdî ya li beşên Iraq, Îran, Sûriye û Ermenîstanê jî bikim lê mixabin jî ber nebûna wext ez nikarim.

Em vegerin bakurê Kurdîstanê: Di sala 1923yan de îngilîzan û tirkan li gorî lihevhatinekê, di navbera xwe de Kurdîstan parve kirin. Bakurê Kurdîstanê dan tirkan, Başûr jî îngilîzan û Başûrê Rojava jî frensiyan re hiştin.

Rejîma tirkan jî sala 1924an û pêve nivîsandin û axaftina kurdî (ji bilî li malê) qedexa kirin. Rejîma nuh herweha gotinên "kurd" û "Kurdîstan"ê jî qedexa kirin û jî kitêb û xerîteyan derxistin. Rejîmê îddîa dikir ku kurd tirk in. Ecêb e ku rêvebirên Komara Tirkyeyê di pirsra zimanî de jî osmaniyan paşverûtir û şoventir bûn. Bo nimûne, Dewleta Osmaniyan rojnameya xwe ya pêşîn a resmî, Takvim-i Vâkayî piştî 1939an him bi tirkî him jî bi erebî, yewnanî û ermenî weşandin.

Li dijî zordestiya dewleta tirk gava kurdan daxwaza mafên xwe kirin, gelek serhildan çêbûn, di salên 1925, 1927-30 û 1937-38an de şerên dijwar pêk hatin, bi deh hezaran kes hatin kuştin û bi sed hezaran kurd hatin sirgûnkirin bo derveyî Kurdîstanê.

Li Turkiyeyê, Mustafa Kemalê ku rejîmek despot û bi takepartî saz kribû, "takeşef" hat îlankirin û heta mirina xwe -sala 1938an- li ser hukum ma. Piştî mirina wî İsmet İnönü "şefê millî" hat îlankirin. Heta sala 1946an Turkiye jî alî şefek û partiyek hate îdarekirin. Di sala 1946an de hin partiyên din hatin damezrandin. Di wan salên bi zilm, tirs û xof de çu rojnameyek an jî kovarek kurdî li Turkiyeyê nehate çapkirin, heta sala 1948an. Piştî sala 1948an kurdan bi zimanê tirkî çend kovar derxistin lê ne mimkin bû ku tekstên kurdî



bêne weşandin; bi tenê bi awayekî endîrekt behsa kurdan dihat kirin. Di sala 1960î de qanûna esasî ya Turkiyeyê hat guhertin û hin mafên demokratîk pê re hatin qebûl kirin. Bi wê qanûna esasî re, piştî 40 salan cara yekemîn kurdan di navbera salên 1962-1970î de bi zimanê tirkî û kurdî hin kovar li Istanbûlê derxistin. Lêbelê hemî hatin qedexekirin û berpirsiyarên wan hatin girtin.

Di sala 1965an de rewş hate guhertin; piştî 45 salan kurdan ji nû ve dest bi avakirina rêxistinên demokratîk û siyasî kirin. Van rêxistinên bi awayekî periyodîk kovar derxistin. Hin ji wan legal hin jî îllegal bûn. Lê yên legal jî piştî middetekê dihatin qedexekirin. Di salên navbera 1975-1980î de bîst kovar û rojnameyên weha li Turkiyeyê hatin derxistin. Gava ku di sala 1980î de ordiyê dest danî ser îqtîdarê ew kovar û rojname hemî hatin qedexekirin û nema derketin.

Ez dixwazim behsa hin xusûsiyetên wan kovar û rojnameyên ku di wê periyoda behskirî de hatine derxistin bikim. Gelo bi çi awayî ew kovar û rojname hatin weşandin, belavkirin û xwendin?

Ya yekê gelo ew weşan çawan bûn? Ya duyem miameleyeke çawan didîtin? Yanî polîs û dadgehên dewletê li hember wan kovar û rojnameyan çi dikir? Xwendevanan reaksiyoneke çawan nîşan dida?

Heke em bi cihê çapê dest pê bikin: Weşanên legal carina li Kurdistanê lê bi giştî li Istanbûlê an jî li Ankarayê dihatin çapkirin. Weşanên îllegal ne li çapxaneyan lê bi daktîlo dihatin nivîsîn û paşê dihatin zêdekirin.

Zimanê weşanan bi giştî bi tirkî bû. Di dema osmaniyan de di rojname û kovarên kurdî de ciyê kurdî zêdetir bû. Di weşanên piştî sala 1970î de jî kurdî roj bi roj zêde dibû. Piraniya rojname û kovarên ku di wê demê de hatin derxistin bi kurdî-tirkî (kurdî û tirkî) bûn. Heta sala 1980î bi tenê kovarek ku bi temamî bi kurdî bû hate derxistin: Tîrêj. Û herweha heta nuha li Turkiye û Kurdistanê bi tenha ev kovar wek kovareke edebî derketiye. Ez pê kêfxweş im ku ez yek ji wan kesan im ku di derxistina vê kovarê de beşdar bûne.

Ji ber ku kurdî qedexe ye di warê zimanê nivîskî de hin gelş hene. Ji hêlek piraniya kesên ku bi kurdî dinivîsin ji ber ku çu car di dibistanan de bi zimanê daykê nexwendine, gava dixwazin li ser gelşên rojane binivîsin pêrgî di jwariyan dibin; ji hêla din xwendevan di xwendin û fêmkirinê de pêrgî zehmetiyan dibin. Herweha gelşên termînolojî hene. Bo nimûne, di maneya gotinên frensîzî wek journal, gazette, hebdomadaire, magazine, revue, feuille bi tenê du gotinên kurdî rojname û kovar (bi kurdîya Başûr govar) têne bikaranîn. Herweha divê ez bibêjim ku gotina "govar" cara pêşîn piştî sala 1926an hatiye bikaranîn.

Kesên ku rojname û kovarên kurdî derxistine ne kesên rojnamevan bûn ku li xwendegehan rojnamegerî xwendibin, piraniya wan ew kes bûn ku bi

siyasetê ve mijûl dibûn. Hema bêje hemî amator bûn. Di nav rojnameyên kurdî de rojnameyên rojane tune ne. Piraniya wan mehane, hin jî ji panzdeh rojan carekê an jî heftane derdikevin.

Ji ber ku ew rojname û kovar nikarin muxabirên profesyonel bidin xebitandin tê de nûçeyên bûyerên aktuel pir kêmtên nivîsîn. Gelek caran bi meqaleyên dirêj tije ne.

Bi taybetî ji ber tadeya dewletê û qedexekirinê, jiyana weşanên periyodîk ên kurdî pir kurt e. Bo nimûne, çar heb ji wan bi tenê hejmarek derketin. Yê ku ji deh hejmaran zêdetir derketine şeş heb in; yê ku ji bîst hejmarê zêdetir derketine sê ne û ji wan dido di dema osmaniyan de derketine. Kovara ku -heta 1980yî- herî jiyandirêj bû, bi 44 hejmaran Özgürlük Yolu bû.

Ji ber gumana ku dê neyên derxistin û ji ber tirsê, abonetî ne gelekî zêde bû.

Hema bêje li paş hemiyan rêxistinek siyasî hebûye. Ji ber ku kurdî qedexe ye û mirov nikare ji weşanên kurdî pere kar (qezenc) bike. Kes û dezgehên ne siyasî bi vî karî mijûl nabin. Yanî ji ber vî sebebî hêla tîcarî ya karê rojnamegeriyê pêş de naçe.

Ji ber qedexebûnê hemî çapxane jî weşanên kurdî çap nakin. Ji ber ku mimkin e bêne cezakirin. Hin kurdan ji bo helkirina vê gelşê, xwestine çapxane bikirrin. Bo nimûne, konsolosê osmaniyan li Genevê (Cenevreyê), di 14ê Gulana 1904an de di nivîseke resmî de dinivîse ku wî xeber stendiye ku Evdîrehman Bedîrxan û Ebdullah Cevdetî ji Almaniyayê makîneyeke çapê ya mobîl siparîş kirine, dixwazin çapxaneyek li Genevê vekin û dest bi tîcaretê bikin.

Di sala 1919an de piştî ku çapxaneyek kirî, Ekrem Cemîl Paşa li Diyarbekirê dest bi derxistina rojnameya Gazî kir. Dibe ku ev li Kurdistanê çapxaneya kurdî ya herî pêşîn be. Di sala 1959an de Musa Anterî çapxaneyek kirî û kovara Mezopotamya di wê çapxaneyê de, li Diyarbekirê çap kir. Li başûrê Kurdistanê rojnamevan Huseyîn Huznî Mukriyanî û Pîremêrd xwediyê çapxaneyekê bûn. Li Kurdistana Rojhelatê, di dema Komara Kurdistanê de çapxaneya hikûmeta kurdan hebû. Li çiyê, li şikeftan jî rojname û kovar hatine çapkirin. Nimûneyeke balkêş rojnameya Bangî Kurdistan e ku di sala 1922an de derket. Gava ku di navbera kurdan û îngilîzên kolonyalist de nakokî derketin, îngilîzan bajarê Silêmanî da ber bombeyan. Ji ber vê yekê serokê kurdan Şêx Mehmûd û alîgirên wî berê xwe dan çiya. Di Şikefta Ceseneyê (Eşkewtî Cesene) de bi cih bûn û ev şikeft wek merkeza ordiya kurdan bi kar anîn. Gava çûn çiyê çapxaneya xwe ji bîr nekirin, bi xwe re birin. Di vê şikeftê de Bangî Kurdistan çap kirin. Di dema şerê pêşmergayetî de jî -ku di salên 1960î de dest pê kiribû- hin kovar li başûr, rojhelat û bakurê Kurdistanê hatin derxistin. Çi bigre hemî kovarên siyasî bûn.

Qedexekirin û zordarî bi xwe re hin fenomenên balkêş peyda dike. Yek ji wan gelşa nasnavê (pseudonym) ye. Gelek nivîskar û rojnamevanên kurdan di şûna navê xwe yê rastî de nasnavan bi kar tînin. Helbet hin semedên din jî hene ku ev insan nasnavan bi kar tînin lê yek ji wan, tirsî ku dê bête nas kirin e. Hin nivîskar û rojnamevanan gelek nasnav bi kar anîne. Bo nimûne, bi qasî ku min tesbît kirîye, şaîr û rojnamevanê kurd Pîremêrd herî kêr 24 nasnav bi kar anîne. Ji ber ku hin rojnamevan û nivîskaran di dema xwe de nasnav bi kar anîne hîn jî em nizanin ka ew kê ne. Yanî ew demekê dirêjtir ji daxwaza xwe nenas mane!

Guhdarên hêja,

Ji tiştên ku heta nuha min behs kir tê fêmkirin ku qedexa û sansur bo çapemeniya kurdî gelşên sereke ne.

Dewleta tirk ji çapemeniyê gelekî ditirse. Dewlet gelekî bêdaletî dike loma ditirse. Ji rojnamevanên kurd vediciniqe. Dewleta tirk bi hemî awayî hewl dide, tedbîran digire da ku rojname û kovarên kurdî negihîjin destê xwendevanan.

Heke em sansura xwebixweyî (otosansur) deynin aliyekî, mirov dikare tedbîrên jêrîn diyar bike:

Di qanûnan de bendên cezayan dihêne danîn da kesên ku di weşanên kurdî de dinivîsin, wan çap dikin, belav dikin û dixwînin bête cezakirin. Kovar û rojname carina tînin sansur kirin. Bo nimûne, hin beş ji nivîsê tînin derxistin û tînin nivîsîn ku çend rêz jê derxistine, an jî cihê ku ketiye ber sansurê vala dimîne.

Azadiya fikirî û çapemenî, ji bo medeniyetê wek pêşketinên herî mezin tînin qebûl kirin, lê çi heftê ku ne berê ne jî nuha ev azadî li Turkiyeyê tune ne.

Heke digel hemî dijwariyan rojnameyên kurdî bête çap kirin, vêca polîs wan dide ber hev. Gef li rojnamevanên kurdî tînin xwarin, ew tînin girtin, tînin mehkemekirin, tînin revandin, tînin teqîbkirin, eşkence li wan tê kirin, tînin birîndarkirin û carina tînin kuştin jî. Nimûneyên weha hene: Rojnamevan Kemal Fevzî di sala 1925an de hat îdam kirin. Berpirsiyarê kovara Kawa, Huseyîn Şen, bi eşkenceyê hat kuştin. Musa Anter ku di gelek kovarên kurdî de xebitiye, di heftê û çar saliya xwe de ji alî hêzên nihênîyên dewleta Turkiyeyê hat kuştin. Û em dizanin ku gelek rojnamevanên din di van salên dawî de hatine kuştin.

Belavkirina weşanan jî bi serê xwe problem e. Şirketên belavkirinê û postexane weşanên kurdî belav nakin. Pîrî caran xortên milîtan, hetta carina zarok jî bi vî karî radibin. Heke rojnameyek ji alî rêxistinekê ve bête derxistin, endam û alîgirên wê wê belav dikin. Ev xebat gelek caran bi awayekî nihênî dibe. Rojname yan jî kovarên kurdî gava ku li mala xwendevanekî bête dîtin

ji alî polis ve ew wek delîlên sûcdariyê tên bikaranîn.

Kovar û rojnameyên kurdî çiqas tên xwendin? Çu îstatîstîk û lêkolîn di vî warî de tune ye lê em dizanin ku kurdî ji tirkî kêmtir tê xwendin, ji ber ku kurdên ku dikarin bi kurdî bixwînin ne gelek in.

Derheqê tîraja kovar û rojnameyên kurdî de tu agahdarî nîne. Lê derheqê çend heban de hin agahdarî hene. Di rojnameya Kurdistan (rojnameya pêşîn) de hatiye nivîsîn ku ji her hejmarê 2000 heb belaş tên şiyandin bo Kurdistanê. Tîraja kovar û rojnameyên ku di salên 1970î de derketin, di navbera 5000 û 40 000î de bû.

Mijara nivîsên wan kovar û rojnameyan ne warek tenê bûye lê warên cihê-cihê bûne. Pîrî caran naveroka wan bi nivîsên siyasî û ravekirinan dagirtî bûye.

Tiştekî din ê ku divê bête gotin ev e: Çapemeniya kurdî di bin hakimiyeta mêran de ye. Dengê jinan hema bêje qet nayê bihîstin. Lê pir kêr bin jî nimûneyên maqaleyên ku balê dikşînin ser gelşa jinan hene. Bo nimûne, ez di rojnameya Rojî Kurd a ku hîn di sala 1913an de derketiye de rastî nivîsekê bi navê "Kürtlerde Kadın Meselesi" (Meseleya Jin Li Cem Kurdan) hatim. Lê kovarên jinan pir kêr in. Yek ji wan kovara Afret (Jin) bû ku di sala 1959an de li Bexdadê bi kurdî û erebî derdiket. Li Kurdistanana Bakur, di nava berpirsiyarên kovar û rojnameyên kurdan de çu jin tune bûn. Bi tenê kovara Ala Rizgarî îstîsna ye ku berpirsiyara wê Hatîce Yaşar bû.

\*\*\*\*\*

Dibe ku ev kurtebehsa ji dîroka çapemeniya kurdî ya ku min li vir behs kir bi zilm û zordarî û bi peyvên moralxirabkirinê dagirtî be, lê li dawiyê ez dixwazim du tiştan bînim bîra we:

A yekemîn, digel hemî kêmasî û bêimkaniyan çapemeniya kurdî ji bo pêşketina kurdiya nivîskî û ji bo zindîhiştina şîûra kollektîf a kurdan roleke pir girîng leyîstiyê. Çapemeniya kurdî, heta dereceyekê, zordestiya ku rejîmên osmanî, tirk, îngilîz, iraq, îran û sûriyeyê li kurdan kiriye, qeyd kiriye.

A duwemîn, digel hemî zordestî û barbariya li Kurdistanê, peyva azad bêdeng nemaye, rojnamevanên kurdan teslîm nebûne, şerefa peyva azad parastine û diparêzin. Ji ber vê yekê em deyndarê wan in.

Ez axaftina xwe bi hêviya ku ev sal li hemî dunyayê ji bo azadiya xweîfadekirin û çapemeniyê bibe sala têkoşîneke zêdetir, diqedînim.

Ji ber ku we guhdariya min kir, ez ji we hemiyan re spas dikim.

# Însanek tê dinê

Maksîm Gorkî

Wergera ji tirkî : A. Gernas

Di dema xelaya 1892'an da bû. Di ber û berê çemê Kodorê da ji Sûhkûmê diçûm Ochemehîryê. Çem li vê derê , gelek nêzî deryayê diherike, bi qasî qonaxa keviravêtinek... Gure gura pêlên qerexê, di nav xuşe xuşa çemê çirisanî da yê ji kaşan dinizilî, ji hev xweş tê derxistin.

Payîz bû. Pelê darê hevrîs di nav ava bi kef a Kodorê da li vî alî û wî alî kaş dibe, dizvire, dirûvê masîyê cisna bi wan dikeve. Li ser zinarên qerex rûniştî me û ketime bîr û ramanan. Wisa xuya bû ku teyrên masîgir û kerseleyan van pelên ser avê bi masîyan dişibandin. Belkî jî qare qara wan ji ber vê yekê bû.

Li bin dara gûzê ya ku gulîyên wê yên jorîn bi rengê zêr xemilî bûn, rûniştibûm. Di bin pîyên min da, pelên wek ku ji zendên xwe hatibin hilqetandin raweşîya bûn. Şaxê hesindarên wî alî çem, ji niha va rût bûn... Wek torek dirandî li hewa daleqandî mabûn. Darniqroka çîyayî ya sor û zerîn darê diniqirand, wisa xuya bû ku gava xwe hilavêtibû, ketibû nava torê. Her cara ku bi nikulê xwe yê reş darê diniqirand û kurman bi ser qalikê darê dixist, çûkên koçerî yên bakûr, serreşên biçûk ên xweştêvger û çûkên siwaxker ên rengxwelî êrişî wan dikirin, digijijandin û dadiqurtandin.

Li milê alî çepê, ewrên hawirdora girên çîya mizgîna baranê didan. Sîya wan, bi ser dehlên şimşîr ên ku li gazan belav bûbûn û mirî dixuyan, dişemitî û diçû. Li van dera meriv di kewarê hesindarên sipî û êxlamûran da rastî hungiv tê. Ev hungivê xweştam ê bîyanî, ku wextekî di dema Romîyan da lejyonê eskerê xanedan Ponpeûs pê nêzî helakê bûbûn... Mêşên hungiv, vî hungivê han ji kulîlkên azelya û taflanên çê dikin. Merivên ku di virda diçin û tèn ji kewarê daran vî hungivî derdixin, li ser çorekên genimê lawaş ron dikin û dixwin.

Jixwe min jî vî karî dikir. Di nav zinarên binya darê gûzan da rûniştî, ji alîkî va ji ronahîya tava payîzê ya xapînok xweş im, ji alîkî va jî dicehdînim ku derzîya moza har ji cîyê vedayî derxim.

Payîzê, dirûvê hundirê dêrekî yekta, yekî ku ji alî merivên jîr û hunermend va hatibe lêkirin, bi Kavkazya dikeve. Di eynî wextê da wisa xuya bû ku wan

zanyaran xwedî tawanên mezin bûn, lewra dema borî ji çavên hayedarîyê yên tûj diveşêrin. Vê derê, dêreke bê serî û bê binî ye û ji rengê zerîya zêr, kesk û şînahîya zumrut e. Tu dibê qey dibêjin: "Vana yên te ne, me ji stend û didin te!"

Hûtên rûdirêj, porsipî dibînim. Wek zarokên bi kêf, bi çavên xwe yên bi ken ji çiyayan dişikitin, xezîneyên xwe yên rengîn bi comerdî li her alî belav dikin, axê dinexşînin, serê çiyayên bi dûman bi zîv dixemilînin. Di bin destê wan da erdên pîroz bi xweşikbûnek bê emsal dixemile.

Çi cîhekî jîndarîyê ye! Bedewîyên cûrbecûr tevî hev in. Kêfa bêdengîyê ku dilê meriv bi evîn dadigire, çawa jî tamek tal dide.

Bawer bikî ev hemû tiştên han carna li zora meriv diçe, dilê însan bi alavên nefretê tijî dibe, dil ji xema parçe dibe lê meriv zane ku wê tim weha neçe. Dilê rojê jî şikestî ye, pir caran bi dilşewatî li însanan dinihêre... Ji bo wan ewqas cehd dike, lê dîsa jî ew di belengazîyê da ne. Bêguman hejmara wan kêmbê jî, ên baş jî hene... Lê divê meriv van însanan bi şeweyekî nû bike, ya rastî divê ji nû va wana biafirîne.

Li alî milê min ê çepê bi ser çiloyan da, li pêş, serên esmer dilivîyan. Ji dûr va, di nav xuşe xuşa çem û pêlên deryayê yên li qerex dixistin, dengê însanan tê bihîstin. Vana ji ew kesên "xelaydîtî" ne. Rîya Sûhkûmê çê kiribûn, niha ji bo bidestxistina kar berê xwe dane Ochemehrîyê.

Ez wana nas dikim. Hemû jî, ji Orelê ne. Em bi hevra xebitîbûn. Rojek berê jî me heqdestê xwe stendibû. Ji bo ku karibim derketina rojê ji qerexê deryayê temaşe bikim, berî wan, bi şev derketibûm rê.

Pênc kes bûn. Çar kes jê gundî bûn, jineke ciwan a sêvok li rû û herwîsa gundî. Jinik ducanî bû, zik li ber dev bû. Bi çavên xwe yên qurşûnî û şîn û mitalbûyî, bi tirs li der û dora xwe dinihêrt. Serê xwe bi yemenîya zer girê dabû, bi ser çiloyan va wek gula berbero li ber bayê dihejîya. Mêrê wê di avahîya Sûhkûmê da miribû. Tam di wextê xwe yê fêkîdayînê da, xwe qedandibû. Ez bi van merivan ra, di eynî embarê da jîya bûm. Bi her awayî girêdayî urf û adetên Rûsî bûn. Serborîyên xwe wisa bi dubarekirin û bi qare qar digotin ku, meriv digot qey hawara wan ji sîh kîlometrî tê bihîstin.

Bê hereket bûn. Sîla felekê wana ji erdên bê xêrûber ên bav û kalan dûr xistibû. Li van cîh û warên bi xêr û ber wek pelên payîzê li vî alî û wî alî kaş û berekaş bûbûn. Bi çavên kêmbêronî, bi xem û ecêbmayî li der û dora xwe dinihêrtin, bi dilekî kul û birîn ji hev ra dibişirîn û bi dengêkî nizim diketin axaftinê.

- Aax ax, çi welat?
- Ji pesindana dewlemendîya wî ra gotin têr nake!
- Lê hinek bi kevir e...

- Çi derew bikim, erdekî sext e.

Piştire Koblî Kazhok, Sukhoî Gon, Mokrenkî bi bîr tînim.

Welatên wan bi xwe. Ku bi tenê li ser bihustek axa tirbên pêşiyên xwe dikarin hisreta çandinîyê bikşînin. Hemû tiştên ku bi xwêdana xwe av dabûn çiqas nas in, bi evînîyek germ tîni bi bîr anîn.

Li cîhê karê me, jinek din jî li ba wan hebû. Bejindirêj, li ser xwe, çenekî tûjikîn, pêşîrên wê wek texte rast. Bi çavên xwe yên reşkomir û şaş, ponijandî dinihêrt.

Berê êvaran tevî jinika bi zeryemenî, derdiketin pişt embara ku em lê diman, li ser koma keviran rûdiniştin. Destê jînikê li ber rûyê wê, serê xwe xwar dikir, bi dengê xwe yê hêrsbûyî û bi awazek bilind dest bi stranên dikir.

Xwe bigihînim pişt dêrê  
Ji hev vekim şînahîya darûber  
Raxim ser sîlika zer  
Şara xwe ya paqij û gewr.

Rûdinê û li bendê dimînim  
Li benda yara xwe ya rûken  
Hema ew çawa bê neyê  
Xwe davêjim nav milên wî...

Jinika xwedî zeryemenî pirî caran bêdeng dima, stuyê xwe xwar dikir û li zîkê xwe yê werimandî dinihêrt. Lê carna ji kûr va, giran, bi dengê mêranî beşdarî dawîya stranê dibû.

Ax evîna min  
Ax pêtiya dilê min  
Qey wê weha bûya qedera min  
Êdî nikarim te bibînim.

Di tarîya reşkorî ya şevên başûrê da ev dengên ku bi hev da digrîn, moraza cîh û warên bêhis û deng ên di bin berfê da, zûrîna guran ji dûr va bi bîr dianî.

Piştire jinika şaş kete tora talerzê, wê avêtin ser barkêşekî darîn û birin bajêr. Li cîhê raketinê, tim diricifî. Di nale nala wê da, meriv digot qey strana sîlikên zer ên piştî dêrê dilorîne.

Ya serî bi yemenî xwe berda nava daran û winda bû.

Min taştêya xwe qedand, devê qutîya hungivê xwe girt, rakir çenta xwe ya piştê û li dû yên din hêdî hêdî bi rê ketim. Darê min ê ji dara guvîjê, bî tinge ting li ser erda hişk deng vedida.

Vaye niha li ser rîya teng ê rengqurşûnî me. Li alî milê rastê deryaya şîn dirêj dibû. Te digot qey li ser deryayê, bi hezaran necarên sirî tevî rendeyên xwe dixebitin û telaşên ber rendeyan bi xîşînî berbi qerexê deryayê ketine lecê. Bayê nerm wek nefesa jinek, germ û xweş û bi bîhn bû. Keştîyeke Tirkan li ber bayê li alî îskeleyê, bi ser kêlek xwar bûbû, berbi Sûhkûmê dişemitî û diçû. Babirkên wê yên ku bi zerpa bayê werimî bû, dişîbîya rûyê muhendîsê Sûhkûmê. Ew rûyê ku wek "şexsîyetek girîng" û "bi hêbet" dihat xuyan. Ew meriv, nizanibû ku ji ber çi sedemî di şûna "ka bisekine" da, "hişşt haa..!" û di şûna "mumkun" da jî, "mumkîne ku" digot.

"Hişşt haa..! Mumkîne ku hûn xwe bi aqil dihesibînin, lê ez ê di nava du sanîyeyan da we bavêjim qereqolê ku hişê we were serê we!"

Dema ku însanan dida girtin û dixist qereqolê, pir kêfxweş dibû, lê divê niha goştê wî di gorê da zûva ji maran ra, rawiran ra bûbe xurek. Pêzanîna vîya jî, meriva rehet dike.

Rêwîtiya min xweş derbas dibû, wek ku li hewa bifirim. Ramanên xweş, bîranînên aloz di serê min da dîlanê digirtin. Pêl çawa di deryayê da xweştevger bin, bi wî awayî... Li jor bi kefa sipî pêçayî, kûrahîyên wê zelal û bê tevger. Hêvîyên xortanîyê yên çirisanî û firoke, wek masîyên binê deryayê yên rengzîvîn bêdeng dişemitîn.

Rê, gav bi gav nêzî qerexê deryayê dibe. Wek gerînek berbi aqara xîz, a ku ji alî pêlên deryayê va dihate şuştin, dizvirin û dimeşin. Dar û ber jî, ji alîkî va dixwazin deryayê bibînin. Xwe bi ser rêya dûr û dirêj va xwar kirine, şaxên xwe li ser bêdengîya ava har, li ser şînahîya bêdawî dirêj dikin.

Bayek ji alî çiyayan divîzand. Xuyaye ku wê baran bibare. Ji nava dar û beran nalînek hat. Ev nalîn, dengê insan e. Dengeke wisa, ku xwe tim di dilê insan da dide hisandin.

Bi vekirina şax û pelên daran ra, min jinika bi zeryemenî dît.

Pala xwe dabû darekî gûzê. Serê wê bi ser girmilkê wê da qelibîbû, devê wê ji hev çûbû, çavên wê wek tas vebûbû. Dixwest ku bi destên xwe, zikê xwe yê werimandî bigre, lê wisa bi ecêb û xof nefes digirt ku, bi her nefesî ra zikê wê bi şîd dihejîya. Dema ku dinalîya, diranên wê yên zer û li ser hev rûniştî wek diranên guran dixuya. Min jê pirsî :

"Çi bû? Qey yekî li te xist?" Bi ser wê da xwar bûbûm. Pîyên wê, wek merivekî ku bi atya ketibe, vedileyîst. Bi zorê serê xwe yê gêjbûyî vegevand û bi bîhneçikê xeber da:



”Lêxe here... Tu şerm nakî, hadê here...”

Wê hingê min têderxist mesele çî ye, min berê jî carek dîtibû. Bêguman tirsîyam. Min hewl da ku vegerim, lê çavên jinkokê ji hêlînên xwe ferqizî bûn, qêrîna wê di qirikê da bûbû wek girêk. Firmêskên wê wek baran bi ser rûyê sor û gizrî da diherikî.

Min nikaribû wê di wî halî da bihêšta. Min çenta xwe ya piştê danî, misîn û qutîya çayê jê derxist û avêt. Wê li ser piştê dirêj kir. Dema ku min xwest ji bo rehetkirina wê çokên wê bi keys bikim, min daf da. Ser û çavên min, sîngê min da ber pihînan. Bi çaplûka li ser her çar pîyên xwe, xwe berbi nava daran kaş kir, wek hirçên mê diranên xwe nîşan da û qîrîya.

”Şeytanê şeytan! Heywan!”

Lê milên wê, nikaribûn laşê wê ragirin, bi ser dev qelibî.

Qarîna wê cardin bilind bû, çîmên wê bi ricif ji hev diçû.

Ji heyecanê têrî xwe lerz bi min ketibû. Min hewl da ku, derbarî vê pirsê da hemû zanîna xwe komî ser hev bikim. Wek berê min, cardin jinikê li ser piştê dirêj kir, çîmên wê tewand û ji çokê kişand ber wê. Perdeya ducanîyê derketibû meydanê. Min ”Nelive, waye diwelide!” got û bazdam qerexê avê, milên xwe hilda û têr şûşt.

Min ê pîrikî bikira.

Jinik, wek qalikên dara reş ên ku di agirê cejnê da dişewitîn, dipirpitî. Destên wê axê dikola, gîhayên zer destik bi destik radikir û direpisand devê xwe.

Rengê wê bûbû wek şima, rûyê wê yê sor û gizrî di xwelîyê da mabû. Xwîn werivîbû çavên wê yên ku bi tirs û xof dinihêrt.

Perdeya rehîmê vebûbû, serê zarok xuya dikir. Divê min hişk bi çîmên jinikê yên direhilîn, bigirta.

Min li gor îmkan û hêza xwe ji bo hêsankirina welidandina zarok hewl dida, ji alîkî va jî berge lê digirt ku tiştan neke devê xwe yê ji hev çûyî û ricifî.

Me hinek çêrê hev kir. Wê di nav diranên xwe yên jidandî da, êh!.. min jî bi eynî dengê nizim... Wê ji ber êşa can, belkî jî ji şerma; Tevî dilpakî û rehma bêdawî ya ku bi min ra bû jî, ez ketibûm heyecanê û hestên min serûbin dibûn.

Wê lèvên xwe yên çilmisandî û kefdayî gez dikir û bi bîhneçik digot ”Xwedêwo!..” û diqîrîya. Dema ku rojê lê xist, ji nişkava çavên wê yên jixweçûyî û çilmisandî bi hestên dêyîti bi firmêskan tije bû, wek ku laşê wê serapê bibe du telaş, pirpitî.

”Biteqize he...re... şeytanê kurê şeytana!”

Bi zendên pîyên xwe yên ku min hişk pê girtibû, min tam dida. Min bi tatêl û xemkêşî got.

”Ehmeqîya meke! Zû ke, da ku zarok biwelide.”

Kes nizane ku ez çawa li ber halê jinikê diketim... Te digot qey firmêskên çavê wê, ji çavên min diherikîn. Ji kerba sîngê min diquncî ser hev û mîn dixwest ji nava serê xwe biqîrim. Ez qîrîyam jî.

”Zû! Destê xwe zû bigre, bilezîne!”

Wey, ev çi ye! Li ser milê min zarokek kurîn. Bi bejna xwe ya yekbihustî, zarokek sorik li ser milê min e. Çavên min bi hêsîran dimijmijî, lê dîsa jî min didît.

Serapê sor dikir, ji nihava kêfa wî ji dinyayê ra nedihat. Em dibihîzin, bi welweleyek seyrê qîyametê li serê me rakîr. Ji nava serê xwe diqîrîya, lê mixabin ku hêj bi dîya xwe va girêdayî bû. Çavên wî şîn, şîrîn, pozê wî yê biçûkîn ê ku bi navenda rûyê wî va hatibû zeliqandin.

Lêvên wî libitî... û hêwirzeyek rakir.

”Ingaaaa.... aaaa!”

Tirs min ew e ku, ez wî ji destê xwe bixînim. Laşê wî wisa şemetok e ku. Li ser çokan rûniştîme, bi ken ketime temaşa wî. Bi welidandina wî ra wisa kêfxweş bûbûm ku. Û bêguman hemû tiştên ku min ê piştê bikira, ji bîr kiribû.

Dîya wî bi dengeke piste pist...

”Navoka wî bibire...”

Çavên jinikê girtî bû. Rûyê wê yê ku xwîn jê kişiyabû, ketibû rengê mirîyan. Dema ku gotina xwe dubare kir, lêvên wê yên morbûyî bi zorê dilivîya.

” Tu çi sekinî... bi kêra xwe bibire!

Kêra min li embara ku cara dawî em lê mabûn, hatibû dizîn. Min jî, navoka wî bi diranên xwe qetand. Pêçek, wek Orellîyan bi dengekî tûj qîrîya. Dîya wî bişîrî. Min di kûrahîya çavên wê yên tevizandî da ronahîyeke şîn û jîndar dît. Destên wê yên reşbûyî di nav qatên pêşa wê da li cêba xwe gerîya. Di nav lêvên xwe yên gezkirî û bi xwîn da nefes da û stend.

”Ez ji qewet ketime!... Di cêba min da şîrîtek heye... Navokê bi wî girêde.”

Min şîrîte dît û pê navoka sebîyê girêda. Kêfa wê zêtir bû. Rûyê wê wisa jîndar û ronî bû ku, ez ji wê dîmenê ra heyran mam û min got: ”Tu xwe bi keys ke, ez ê wî bibim û bişom.”

Bi tirs û hêwirze...

”Haya te jê hebe. Bi nermî û baldayîn wî bişo, baş e! Heyrana te me bala te lê be!” gote jinikê.

Ev endamê nû yê mirovatîyê ku bi qasî bihustek bû û wek soregoşt dixuya, wisa xuya bû ku baldayîneke taybetî nedixwest. Kulmên xwe jidandibû û

diqîrîya. Te digot qey ji min ra meydan dixweyne û bangî şer dike. ”Evyar her weha ye dostê min ê rûkal! Eger tu dixwazî serê xwe bi hevalên xwe yê dinyayî nedî şikandin, tê li heqê xwe bigerî”

Çaxa dilopê pêlên ku li qerexê dida li ser laşê xwe hîs kir, dest bi qarîn û hewara xwe ya herî bi hêwirze kir. Piştî, çaxa min sîngê wî, piştî wî bi avê mizda çavên xwe xirpişand. Di nav pêlên li dû hev dihatin da me ji nû va dest bi têkoşînê kir. Qare qara wî bû.

”De biqîre û xwe biqelêşe ev ê rûkal! Xwe bi qelêşe!”

Dema vegeyîyam ba dîya wî, çavên wê girtî û li erdê dirêjkirî bû. Bi êş û janên dû welidandinê, lêvên xwe gez dikir. Dîsa jî min, di nav nale nal û axinên wê da pistîna wê ya tefandî bihîst.

”Wî bide min...”

”Bira hinek bisekine heyran.”

”Wî bide min!..”

Bi destên xwe yê ricifandî û bê derman li vekirina sîngê fistanê xwe dixebitî. Min alîkarîya wê kir. Sebîyê Orbellî yê ku di nava dest û lepan da bi cîh nedibû, xwe avêt pêşîra dîya xwe ya bi ber ya ku karibû bîst zarokan bi şîr bike. Di ber sînga germ a dîya xwe da girîne birî.

Jinik serê xwe yê ku dabû ser çenta piştî xwe li vî alî wî alî dihejand, diricifi û ji alîkî va jî nefes dida û distend.

”Keça dur a pîroz, dîya Îsa.”

Nişkava bi qerînek nerm çavên xwe vekir. Awirên delal ên dîyî yê bi rûmet, ku nayên salixdan, li esman tîr kir. Bi awirên şîr dinihêrt. Awirek şahîyê û minetkar, di bîbikên çavên wê da veket û vemirî. Milê xwe yê westîyayî hêdî hêdî rakir û xaç derxist.

”Bira dîya Meryem takdîs bike... Zor spas ji dura pîroz ra...”

Çavên wê tarî bûn, demek dûr û dirêj bê deng ma. Bi zorê nefes dida û distend. Dûra nişkava bi dengekî biryardayî, bi şeweyekî xwezayî deng kir.

”Xortê delal, çenta min a piştê veke.”

Min çentê vekir. Bi bişîrandineke çîlmisî dûr û dirêj li rûyê min nihêrt. Hinek reng kete sêvokên rûyê wê yê di hev ra çûyî, anîya wê ya xwêdayî geştir bû.

”Ji kerema xwe ra karî hinek ji vê derê dûr kevi.”

”Tu li rehetîya xwe binihêre.”

”Baş e, de tu li rîya xwe here.”

Min xwe berda nav dar û beran û ji wê derê dûr ketim.

Dilê min westîyabû, lê ji kêfa dil di qefesê da bi cîh nedibû. Bi mire mira

deryayê ya bêsekan, di sîngê min da şahîyek bi per û bask çê bûbû û min karibû awaza wê şahîyê bi salan guhdarî bikira.

Ji cîhekî nêz xuşîna rûbarekê dihate bihîstin. Wek keçikeke ku ji hevala xwe ra qala dilketîya xwe bike...

Carekî serê jînikê, bi ser û sînçekî tekûz û zeryemenîya girêdayî, bi ser dar û beran da dirêj bû.

”De ka binihêre! Tu çi dikî? Tu pir zû ranebûyî pîya?” Bi darekî girt û di cîyê xwe da çok da. Rûçikê wê bûbû wek rengê axê, te digot qey ruh jê kişiyabû, te digot qey di kortê çavên wê da şînahîyek bûbû gol.

Dibişîrî, bi hezkirin û dilpakî di nav lêvan da got.

”Ka binihêre çawa jî radizê.”

Bi rastî baş radiza, bi qasî ku min dît, tu ferqîyekî wî ji zarokên din tunebû. Eger cudahîyek hebe, ew jî cîh û war bû, li ser kêşa pelên zer ên payîzê radiza.

Doşek di bin darekî wisa da hatibû bi cîh kirin ku, li Orellîyê jî tiştek weha tunebû.

”Dîya min, divê tu xwe dirêj bikî û rakevî.”

”Nabe.”

Serê xwe yê westîyayî di mana nanakirinê da hejand.

”Divê ez xwe amade bikim û berbi wê derê bikevim rê. Navê wê derê çi bû?

”Ochemchrî bû?”

”Temam wê derê, hevvelatîyên me niha rê nivî kirine jî.”

”Tu dibê qey haya te ji dura pîroz tune... Ew bi destê min digre.”

Pişti ku hevrêya wê dura pîroz be, gotin bi min nekeve!

Xwe bi ser rûyê biçûk ê qermeçandî da xwar kir û kete seyra wî, ji çavên wê ronahîyên germ û hezkirî difûrîya. Li lêvên xwe mijîya, bi nermikahî li sîngê xwe xist.

Bo agirkirinê xwar bûm, ji bo misînê min çend kevir da ser hev.

”Ez ê hanhanka ji te ra çayek bidim serê.”

”Baş e, bide serê! Nava min ziwa bûye.”

”Çima hevvelatîyên te, te bi tena serê te hîştin û çûn?”

”Na na. Ew nerevîyan. Ez li paş mam. Hinek vexwaribûn, tu zanî... baş e ku çûne. Ka bifikire carek, eger ew li van dera bûna, min ê çi bikira?”

Gava çavên wê li min eliqî, bi yemenîyê rûyê xwe girt, piştî pirtîyên xwînê yên ser lêva xwe tif kir û bi şermokî bişîrî.

”Ev cara yekem e?”

”Herê. Tu kê yî?”

”Meriv kare bêje cûreyek zilam...”

”Baş e min fam kir. Zewicandî yî?”

”Ez hêj negihîştîme wê şerefê.”

”Tu heneka dikî!”

”Na, henek nakim.”

Çavên xwe berjêr kir û pirsî.

”Baş e, tu vî karê jinan ji kuda zanî?”

”Karim bêjim ku hîn bûm. Ez xwendevan im. Tu mana xwendavanîyê zanî ne wisa?”

”Bawer bike zanim. Kurê mezin ê keşeyê me xwendevan e. Hîni keşetîyê dibe.”

”Baş e, ez jî yekî wisa me hema. Ka ez herim hinek av bînim.”

Jinik bi ser pêçeka xwe da xwar bû, dan û stendina nefesa wî guhdarî kir. Piştî jî berê xwe da deryayê û dîna xwe da wê.

”Ax eger min karibûya xwe bişûsta, ava vê derê jî hinek xerîb e. Ev av, aveke çawa ye? Tehl e, yan bi xwê ye?”

”Here xwe bişo, tê bi can bibî.”

”Rastî dibêjî?”

”Herê. Derya germtir e, ava çem wek qeşa ye.”

”Eger tu wisa dibêjî.”

Abazayekî ku li ser hespê xwe radiza, giran giran di ber me da derbas bû. Serê wî car bi car diket ser sîngê wî. Guhên hespê hûr leq bûbû. Bi çavên xwe yên reş û gir awira da me û bi xirînî nefes da û stend. Siwarê wî şiyar bû. Kumekî kurk ê qirêj û kermegirtî di serê wî da bû. Li alî me nihêrt û cardin serê wî kete ber.

”Bineciyên vê derê xweşmeriv in ha, awirên wan jî tirs û xof dixê dilê meriv...” digot jinika Orellî bi nermikahî.

Ez ji bo anîna avê çûm. Çavkanî zelal bû û bi ser kevirên biriqandî da diherikî. Pelên payizê li ser avê li vî alî wî alî diçû û dihat. Wisa xweşik û bedew bû ku! Min dest û rûyê xwe şûst. Dema ku min misîn dagirt û vegeyîyam, jinik rabûbû ser xwe û bi çaplûka dimeşîya. Di nav daran da bi tirs li dû xwe dinihêrt.

”Tu çi dikî?” gote min.

Şaş û mital ma. Rûyê wê sipîçolkî bû. Di bin gewdê xwe da ji bo veşartina tiştêkî cehd dikir. Min fam kir ku çi ye.

”Wî tiştê bide min, ez ê veşêrim.”

"Hewara Xwedê! Baş e, lê wê di binê hemamê û di binê erdê da bête veşartin... Tu dibê wê li vê derê di nava demekî kurt da hemamek bête çêkirin? Tu dikenî, lê ez ditirsim! Lê eger canawir an rawirek wî bixwe! Bi wî şertî ku di erdê da bê veşartin."

Serê xwe vegerand, boxçeyek giran û şil da destê min. Şermî bûbû.

Di ber xwe da.

"Tê li gor şert û usûlê bikî. Tê di kûr da veşêrî ne wisa? Tu bi xatirê Îsa kî... bi serê xwe kî, li gor usûlê veşêre..."

Di vegeêrê da min dît ku, pîyên xwe bi dijwarî bi xwe ra dikşîne û ji qerexê avê tê. Milên xwe berbi pêş dirêj kiribû, pêşa wê heta navê şil bû. Te digot qey rûyê wê, wek ku ji hundir va hatibe ronîkirin ketibû rengê pembeyî. Dema ku min alîkarîya wê kir û wê anî ber agir, bi ramanek balkêş ketibûm mitalan.

"Ev çi îş e, ev çi qewetek heywanî ye!"

Piştî ku çaya xwe ya bi hungiv vexwar, bi nermikahî pirs kir.

"Yanî niha te dev ji xwendegehê berda?"

"Belê."

"Wisa xuyaye ji ber araqê?"

"Herê dîya min herê. Araqê mala me xirab kir!"

"Şermeke mezin e! Li min bibuhure lê ev rewşa te hêj li Sûkhûmê bala min kişandibû. Tê bîra te, te û rêvebir ji ber xwarinê şer kir, wê çaxê min xwe bi xwe got, xuyaye evya serxweşekî dera han e. Li gor ku ew ji kesî natirse..."

Ji alîkî va bi lèvên xwe yên werimandî hungiv dialast, ji alîkî va jî car ba car çavên xwe yên şîn dida ser Orelliyê herî ciwan ê nav dar û beran razayî.

Axînek kişand, "Gelo wê jîyana wî çawa be?" got di ber xwe da.

Bi çavekî lêgerînê li min dinihêrt. "Alîkarîya te li hayê neçû, spas. Lê pir meraq dikim, gelo tê jê ra bi xêr bî yan na!..."

Piştî xwarina hin tiştan xaç derxist û ji alîkî va jî firaqan berev dikir. Pêra jî, ronahîya çavên wê hêdî hêdî ditefiya, berê wan diket erdê û di xewra diçûn. Paşê ji nişkava rabû ser xwe.

"Bi rastî tê karibî bi rêkevî?"

"Herê."

"Wê taqeta te têr bike? Tu ji xwe emîn î?"

"Tu Meryema dur ji bîr dikî? Sebîyê bide min."

"Ez ê hilgirim."

Piştî gengeşiyê razî dibe. Li rex hev, mil di mil da em dikevin rê.

"Hêvîdar im ku karibim xwe ragirim û gêrî erdê nebim." Destê xwe datîne

ser girmilkê min, wek ku lêborînê bixwaze dibişire.

Hewelatîyê nû yê Sovyetî, merivê ku qedera wî nayê zanîn li ser milê min ketiye xew. Ji pozê xwe wek merivê mezin deng dide. Derya bi stumircana xwe ya ji telaşên sipî, şepe şepê dikir, mire mirê dikir. Dar û ber bi pistînî bi hevra diaxifin. Roj di nîveka rêwîtiya xwe ya rojane da ye.

Em hêdî hêdî dimeşin. Dayîk carcarna disekine, serê xwe davêje paş û axînek kûr dikşîne. Awirên wê dikevin mitala dûrîyan, daristanan, çiyayan û piştre çavnêriya kurê xwe dike. Çavên wê yên ku bi êş û xeman hatibûn şuştin ji nû va bi awayekî ecêb mat dibin, bi ronahîya şîn ya evîneke bêdawî diçirise. Carekî din jî disekine û diaxife, "Xwedêyo, dêyîti çi tiştêkî xweş e! Çi bedew e! Bi vî awayî, bi wî û biçûkê xwe ra karim herim heta wî aliyê dinyayê... Wê kurê min ê biçûkîn ê delalî, li milê dîya xwe û li ser rê di azadîyê da mezin bibe û mezin bibe..."

Derya dixuşxuşe, dimirmire...

# Ji bo her pirtûkekê gulek

"Maleke bêpirtûk wek laşekî bêruh e."

Marcus Tullius Cicero

Mustefa Aydogan



## I

Pirtûk di bexçeyê mirovistanê de gula herî xweşik e. Gava ev gul bişkivî, rengê dinyayê bi carekê hat guhertin. Dinya xweşiktir û rohnîtir bû. Ya ku ev îmkân pêşkêşî mirovatîyê kir, nivîs bi xwe bû. Heta ku nivîs nehat peydakirin bexçeyê mirovatîyê ji bêhn û xweşikbûna vê gulê bê par jiya. Peydabûna nivîsê, peydabûna şertên zimanê nivîskî di warê teknolojiya enformasyonê de şoreşa yekem e. Gava nivîs peyda bû, şertên pirtûkê jî derket ortê. Û ji gava ku pirtûk peyda bûye û vir de, di jiyana mirovatîyê de rola herî xurt leyiztiye. Bi saya wê, bi vê navgîna herî ewle çand û zanîn hatine paraztin û tevî tecrubeyan dewrî nifşan bûne. Wê heta nuha nîşan daye ku di warê paraztin û navberiya çand û zanînê de, ji gava ku peyda bûye û vir de, ew di her deman de bê hempa ye. Wê her weha ji bo pêşdebirin û zîndebûna zimên jî roleke bingehîn leyiztiye.

Şertên ku ew cara yekem derxistin ortê, di pêşveçûna mirovatîyê de qonaxeke pîr girîng e. Bi saya wê em dikarin demên berê baştir bizanibin û di derheqa pêvajoya medeniyeta dinyayê de baştir agahdariyê werbigirin.

Berê mirovan ne dikarîbû bixwenda û ne jî binivîsanda. Mirovatî bi hezaran salan ji bûyereke ku navê wê nivîs e, bê par jiya. Ne kaxiz, ne pênuş û ne pirtûk di jiyana mirovan de peyda bûbûn. Ji bo paraztin û dewirkirina çandê, bi tenê bîra mirovan hebû. Ji derveyî vê tu tişt di destên wan de tune bû. Lê hemû tiştên ku dihatin gotin, di bîrê de nediman û di hundurê demê de beşek dihat jîbîrkirin. Jiyan pêş ve diçû, mirovan ji koçeriyê dest bicîhbûnê dikir û pêwendî bi kompleksîstir dibûn. Pêwîstiyên wan ên jiyane pirtir û mezintir dibûn û bîra mirovî nema têrê dikir. Di vî warî de ji bo peydakirina çareyan hewildan her berdewam bûn. Di encama wan hewildanan de şertên nivîsê amade bûn. Pêvajoya amadekirina şertên wê ji deh hezar salan berê dest pê dike. Wêneyên ku mirovên şikeftan çêdikirin, wek gavên pêşdemên wê tê qebûlkirin. Pêvajoya pêşdemên nivîsê heta ku herfan şûna wan wêneyan girt,



dewam kir.

Gava behsa nivîsê, behsa vê şoreşa teknolojiya enformasyonê ya yekem dibe, çavên mirovan berê li rojhilata navîn diçûrisin, dilên wan li wê derê lê dixin û dû re jî dadigerin ser gerdena Efrîqayê. Sê çem hene li dinyayê ku gava behsa medeniyetê tê kirin divê berê behsa wan bê kirin, ji wan bê destpêkirin. Ji vana du çem hene ku kana bereketa Mezopotamyayê ne. Mezopotamya, wê axa ku tovên medeniyetê cara yekem lê zîl da...

Li gora dîroknivîsan, medeniyetê cara yekem serê xwe li Mezopotamyayê rakiriye. Şoreşa teknolojiya enformasyonê li wira dest pê kiriye. Nivîs cara yekem bi texmînî beriya nuha bi pênc hezar salan li wira hat peyda kirin û bikaranîn. Elfabeya dinyayê ya yekem bû para wê. Li wê derê medeniyeteke pêşketî hat avakirin û ev medeniyet bi saya nivîsa ku wan peyda kiribû, bi saya nivîsa ku li ser lewheyên kîlî hatibû nivîsîn gîhaşt mirovatîyê. Ew awayê nivîsê bi berfirehî hatiye bikaranîn û wek navgîna komunîkasyona navneteweyî rola xwe leyizt.

Çemê din Nîl e, Nîla ku ruhê Efrîqayê ye, xwîna ku di damarên wê de digere... Efrîqa û Nîl du navên ku sedemên hebûna hevdu pêk tînin. Nîl hem li Efrîqayê û hem jî li dinyayê çemê herî dirêj e. Di her demê dîrokê de, gelên Efrîqayê xwe li qiraxên vî çemî, li vê dîrêjahiya ku 6670 kilometre ye, girtiye; cîhên jiyane yê herî baş li van qiraxan peyda kirine û medeniyetên ku hîn jî mirovan li xwe ecêbmayî dihêlin, ava kirine. Nivîsên hîyeroglîf jî berhema wê medeniyetê ye. Lê nivîsa ku li wê derê derket ortê, tevî ku wan papîrus jî peyda kiribû, li gora ya ku li Mezopotamyayê peyda bûbû, bi sînora ma û bi qasî wê wek navgîneke komunîkasyona navneteweyî nehat bikaranîn.

Divê li vira bête behskirin ku li Rojhilata Dûr, li Çînê li wê de vera ku kaxiz lê peyda bû jî awayekî taybetî ya nivîsê dihat bikaranîn.

Demek hat, ne kîlên sumeran û ne jî hîyeroglîfên misirîyan man. Lê awayê nivîsa ku li Çînê hat bikaranîn, heta nuha jî wek bîngê nivîsa vî zimanî diji. Grêkî, Romayî, ereb û hwd jî di pêvajoya dîrokê de ji bo pêşdebirina vê bûyera nivîs û pirtûkê di demên cuda de bi dû hevdu re rolên cuda leyiztin û medeniyetên xwe ji yên li pêy xwe re wek mîras hiştin.

Ji elfabeya sumeran û vir de, mirovatî di vî warî de bi gelek pêşveçûnan ve rû bi rû bû. Lê di nav van pêşveçûnan de peydabûna mekîneya çapê, ji bo şoreşeke teknolojiya enformasyonê ya din, qonaxeke pir girîng e. Îro êdî em pê dizanin ku hîn di salên heftsedî de, hem li Çînê û hem jî li Japonyayê nivîsên dînî dihatin çapkirin. Û Ewrûpa ancax bi saya ereban ji kaxiza ku li Rohilata Dûr hatibû dîtin, agahdar bû. Lê tevî ku em îro dizanin ku çîniyan di salên heftsedî de bi îşaretên ku mirov dikare dîsa bi kar bîne, pirtûk çap kirine jî, ji aliyê dîroknivîsan ve Johann Gutenberg di dîrokê de wek bavê hunera çapê tê dîtin.

Berîya wî, li Ewrûpayê pirtûk bi destan dihatin nivîsandin û pirkirin. Weha

tê qebûlîkirin ku Johann Gutenberg di sala 1450î de, di wê pêvajoya ku hîn ewrên reşî tarî xwe ji ser Ewrûpayê hilneanîbû de, bi îcada xwe ya mekîneya çapê di dîroka mirovatîyê de yek ji wan midaxeleyên mezin î qederguhêr pêk anî. Bi saya vê îcada wî, mirovan îmkane çapkirin û pirkirina pirtûkan bi dest xistin û bi vî awayî zanîn bi awayekî hîn hêsantir li mirovahiyê belav bû. Pirtûka ku cara yekem bi vê mekîneyê hat çapkirin, încîl bû. Pirtûkên ku Gutenberg çap kirin jî di destpêkê de dişibiyan destnivîsan, lê wek her hunerê, hunera çapkirina pirtûkan jî her îmkaneke ji bo peydekirina îmkaneke din bi kar anî, her gaveke pêşveçûnê ji bo amadekirina gaveke hîn pêşdetir rol leyizt û bi vê xusûsiyetê heta îro jî di dîroka mirovatîyê de bû qasîde zanîn û çandê û statuyeke guhêrnebar wergirt. Pirtûk di jiyana mirovan de ew qas bi cîh bûne ku ger mirov ji vê jiyane pirtûkan derxîne, jiyana namîne. Pirtûk bûye jiyana bi xwe. Pêvajoya pêşveçûna pirtûkê ya ji lewheyên kîlî û glofitekên papîrusan û heta dema me nîşan daye ku pirtûk wek belgeyên medeniyeta dema xwe, bûye pijaka zanîn, tecrube, fikir, intresse, huner û edebiyata dema xwe. Heta nuha ev statu bê mînaqêşe hatiye parastin.

Gava Gutenberg îcada xwe pêşkêş kir, devê herkesî ji hev ma. Lê bifikirin ku nuha Gutenberg ji gorê rabe û li hunera çapkirinê ya îro, li vê teknîka ku devê xwediyê xwe jî ji hevdu dibe temaşe bike, gelo wê çi bibêje, wê çi jê fahm bike? Lê tevî vê jî îro ji ber pêşveçûnên ku bilezbûneke nedîfî çedibin, ji bo statuya pirtûka ku UNESCOyê tarîfa wê ya di dema me de weha kiriye ” weşana ne peryodîk ku ji derveyî qaba xwe bi kêmanî ji 49 rûpelan pêk tê ” tirsek heye. Di vê qonaxa teknolojiya îro de, di pêvajoya ku mirovatî ber bi civata digital diçe de, ev tirs bêtir dibe û hin îşaretên ku dikare tesîrê li vê statuyê bikin û wê di jiyana mirovatîyê de li hember pêşveçûnên medyayên din qels bikin, bêtir xuya dibin (*Divê bête diyarkirin li vira mebest tesîra li statuya pirtûkê ye, ne ew e ku ” gelo forma heta nuha hatiye baş e, an jî ya digîtal baş e? ” Ew mînaqêşeya ha û helwêsta di vî warî de, ji derveyî çarçoveya vê nivîsê ye*).

## II

Tirsa di warê pêşeroja pirtûkê de xuya dibû, li ba UNESCOyê, organa Yekîtiya Neteweyan a ji bo perwerde, zanist û çandê jî her diçû zêdetir dibû û ev yeka ha, di civînên wê yên cuda de dihat rojevê. Li gora UNESCOyê jî di vê pêvajoyê de hewcedariya parastina statuya pirtûkê heye. Ji bo parastin û bilindkirina vê statuyê, divê hewildanên xurt bêne kirin. Di bin tesîra vê atmosferê de, li Parîsê di 25.10- 16.11.1995an de konferansa Unescoyê ya giştî çêbû. Ev pirs hat rojeva wê konferansê jî. Di encama mînaqêşeyan de, her di eynî konferansê de biryar hat dayin ku 23ê Nîsanê ji îro û pê ve li dinyayê roja pirtûkê ye. Lê di belgeyan de navê wê yê resmî wek roja Pirtûkê û Mafê Çapkirin û Kopyekirinê hat nivîsîn.

Di biryarê UNESCOyê de weha tê gotin:

”Konferansa giştî bawer dike ku;

\_ pirtûk di pêvajoya dîrokê de ji bo belavkirina zanîne, navgîna herî bi hêze û di warê paraztina zanîne de awayê herî efektîv e,

\_ hemû tiştên ku ji bo belavkirina pirtûkan tên kirin, ji bo kesên ku îmkane wan ên bidestxistina pirtûkan hene feyde ne, lê ew, zanîna me ya hevbeş a li ser tradîsyonên çandîyên dinyayê jî pêş de dibin û ji bo karên ku li ser bingehê fahmkirin, tolerans û diyalogê hatine avakirin îlhamê didin,

\_ yek ji wan awayên herî bi tesîr ên ji bo piştgiriya pirtûkan û zêdekirina belavkirina wan - ku li gelek welatên endamên UNESCOyê diyar bûye- ew e; bicîhkirina roja Pirtûkê û di wê rojê de bo nimûne; amadekirina fûar û pêşengehan; ev fikira ha di qada navneteweyî de, bi cîh nebûye û ji ber vê yekê, konferansa giştî 23ê Nîsanê li dinyayê, wek roja Pirtûkê û Mafê Çapkirin û Kopyekirinê îlan dike. Di vê rojê de di sala 1616an de bû ku Miguel de Cervantes, William Shakespeare û Inca Garcilaso de la Vega wefat kir.”

UNESCOyê ji bo ku pirtûk bikaribe xwe li hember bilezbûna pêşveçûnê û xurtbûna medyayên din bigire, awayekî piştgiriya peyda kir û ev sala sisiyan e ku di 23ê Nîsanê de, ev awa tê bikaranîn.

Ji bo çi 23ê Nîsanê û ne rojê din? Ez li bersiva vê pirsê geriyam. Min dît ku li Katalonyayê ji zû de roja pirtûkan tê pîrozkirin. Di 1926an de ji ber rojçêbûna Cervantes 7ê Cotmehê wek roja pirtûkan dihat pîrozkirin. 23ê Nîsanê jî ji berê de wek roja Sankt Goranê ku li gora efsaneyê, ejderha kuştibû, dihat pîrozkirin. Di wê rojê de, mirov gulekê dide kesê ku mirov jê hez dike. Weha tê bawerkirin ku gulên sor ên ku wê rojê wek sembolekê xuya dibin jî ji xwîna wî ejderhayî derketine. Lê piştî demekê herdu roj bûn yek; yanî biryar hat dayin ku 23ê Nîsanê bila hem wek roja Sankt Goran û hem jî wek roja pirtûkan bê pîrozkirin. Û ji wê rojê û vir de ye ku li Katalanyayê gul û pirtûk bûn du hevalên ku nema ji hevdu vediqetin. Navê wê rojê jî êdî bû roja gul û pirtûkan. Di wê rojê de festîvala pirtûkan tê amadekirin û bikirên pirtûkan ji bo kirîna her pirtûkekê bi guleke sor têne xelatkirin.

UNESCOyê ev adeta Katalanyayê wek bingeh wergirt û xusûsiyeteke navneteweyî da vê rojê. Bi biryara UNESCOyê îmkane hat amadekirin ku êdî ev tradîsyon dikare li hemû dinyayê belav bibe û bibe yek ji wan rojên hevbeş ên mirovatîyê. Di vê rojê de, ji bo têgîhiştina rol û girîngiya pirtûkan û xurtkirina hezkirina li hember wan, dê çalakîyên pîrhêl bîna amadekirin û dilên mirovan ji bo paraztina statuya pirtûkê bi hevdu re lê bixin.

### III

Roja pêncşemê bû. Zarokan wek hertim serê wê sibehê jî xew li min herimand. Çavên wan bar nebû û şertên ku ez di nav cîhan de bisitirim jî bi carekê ji ortê rakirin. Piştî wan lihêf ji ser min avêt û ez jî ”mecbûrî” beşdariya henekên wan bûm û ew têra xwe kenîyan, birayê wan ê ku diçe sinifa heftan

got ku bavo, ma tu ê jî biçe ba yê pirtûkfiroş û ji me re pirtûkekê binî? Îro pirtûkan didin malbatên xwedî zarok. Wê gavê ez tê gihîştim ku ne ji zarokan bûya, îsal jî dê weha derbas bûbûya û hayê min wek sala 96 û 97an dê jê çênebûya.

Min berê xwe da rojnameyê, ez çî bibînim li Swêdê ji serî heta binî hema hema li her deverê ji şevên edebî, pêşengehên pirtûkan, semîner, hevduîtinên bi nivîskaran re, pirtûkên nuh ên ku bi minasebeta vê rojê derdikevin, xelatên edebî yên ku di vê rojê de tên belavkirin, heta belaşbelavkirina pirtûkan çalakiyên cur bi cur amade dibin. Ev çalakî di vê rojê de balê bêtir dikişînin ser pirtûkan û ji bo lêbixwedîderketineke hîn xurttir civatê di derheqê rol û girîngiya pirtûkan a di jiyane de bi awayekî pîrhêl agahdar dikin.

Di vê rojê de, di navbera weşanxane, pirtûkfiroş, nivîskar, pirtûkxane, Daîreya Posteyê de hevkarîyeke pir baş heye. Ji bo pîrozkirina vê rojê, li dibistanan çalakiyên cur bi cur tên amadekirin. Komeleya Weşangerên Swêdê û Daîreya kar û barên Dibistanan ji bo sê sed hezar xwendekarên lîseyê, sê sed hezar pirtûk dişînin hemû lîseyên Swêdê. Çardeh weşanxaneyên pirtûkên zarokan duwanzdeh hezar pakê pirtûk belaş dişînin duwanzdeh hezar zarokxaneyên Swêdê. Postexaneya Swêdê di vê rojê de îmkaneke weha pêşkêş dike ku her kesê ku dixwaze pirtûkan wek diyarî bide hinekan, dikare bi rêya posteyê bê pere bişîne û poste di ser re heqê paketê jî nastîne. Pirtûkxaneyên Swêdê bi minasebeta vê rojê, xercê pirtûkan ên ji ber derengteslîmkirinê efû dikin û hwd...

#### IV

Ez di bin atmosfera çalakiyên ku bi minasebeta pîrozkirina vê rojê li vî welatî amade dibin de li rewşa pirtûka kurdî fikirîm. Li weşanxaneyên kurdî, li rewşa nivîskar û rêxistinên civakî û çandî fikirîm. Min bala xwe da rewşa xwendevanên kurdî. Ez li ser rola ku îro pirtûka kurdî di jiyana me de dileyze fikirîm. Têkiliya di navbera pêşveçûna zimên û pirtûkê de hebû, bala min kişand.

Min berê xwe da konferansa UNESCOyê, min 186 neteweyên bi rengên cuda dîtî. Wek li her deverê, çavên min li vê derê jî li rengê Mezopotamyayê geriyar, lê bi tu reng nas neketin. Neteweyekî mezin di pêvajoya vê biryarê de jî tune hatibû hesibandin. Di vê rojê de jî tu pirtûkeke kurdî ne gîhaşt tu zarokxaneyê kurdî. Tu pirtûkfiroşan jî bi minasebeta vê rojê ne tu pirtûkên kurdî firotin û ne jî tu gul dan tu bikirên pirtûkan.

Min dît ku di 23ê Nîsanê de, li her deverê dinyayê pirtûk di serê govendê de bû. Bi her awayî direqîsî û bi her zimanî dilîrand. Govendeke mezin geriyabû; ne serî hebû ne jî binî... Dinya qûriyabû. Dê weledê xwe avêtibû. Meydaneke rengîn û zengîn, ji Gilgamişê li gîhayê jiyane digeriya û heta "Microsoft Internet Explorer" a herî talî... Lê rengê hebû ku di nav wan de xuya nedibû.

Rengê me, pirtûka kurdî. Pirtûka kurdî wê rojê jî xwe nexemiland û derneketa pêş xwazgîniyên xwe. Me ji bo wê dîsa ne tu dawet çêkir, ne tu govend gerand û ne jî ji dil lîrand. Ne tu kêf û ne jî tu heyecan li dora me xuya bû. Xwîn di damaran de, ketibû halekî weha ku di navbera ger û rawestandinê de bû. Min wê rojê bi tenê ewrekî reş î tarî dît, ewrekî ku xwe li şinahiya ezmanê me radikişand... Min fahm kir ku roj dike li dereke teng li me here ava. Ez têgihîştim ku ji bo pirtûka kurdî, ji bo ku ew bûka me ya delal bikaribe bi xêr siwar bibe û lehiya berbûyan li dû, bi miradê xwe şad bibe û xwîna me di damaran de bilezbûna xwe ya herî xurt bigere û pêlên heyecanê me bidin ber xwe, hewildanên weha bi mahne pêwîst in. Min dît ku di vê dema ku mîratxurên Mezopotamyayê, vê axa ku destpêka medeniyetê bû para wê, mecbûrî şertên beriya lewheyên kîlî dibin de, ji bo me girîngiya rojeke weha hîn bêtir xuya dibe. Îro kurdî li ser lewheyên kîlî jî qedexe ye. Kurd mehkûmî şertên beriya nivîsê, mehkûmî bîra xwe dibin. Di vî warî de, lêbixwedîderketineke ji dil û berxwedaneke xurt î bêrawestan divê. Ji bo biserketina vê berxwedanê û misogerkirina vî zimanê ku lewheyên herî nî jî lê hatine qedexekirin, sitûna me ya herî xurt dîsa nivîsa kurdî ye, pirtûka kurdî ye.

Pirtûk bûyereke weha ye ku divê ji herkesî bêtir kurd lê bi xwedî derkevin. Ji ber ku pirtûk li ser çî dibin, bila bibin, jiyane nîşan daye ku ew hem ji bo pêşdebirina zimên û hem jî ji bo zîndekirin û ewlekirina şertên berdewamiya zimên, îmkanên herî xurt û herî efektîv in. Ji ber vê yekê, di vê pêvajoyê de, ji bo xurtkirin û pêşdebirina statuya pirtûka kurdî, seferberiyeye neteweyî pêwîst e. Îmtîhaneke dijwar li pêş me ye. Neteweyê me divê bi pratîka xwe xuya bike ku di vê îmtîhanê de serketin dê para wî be. Beriya herkesî, divê em ji xwe dest pê bikin û bi awayê jiyana xwe nîşan bidin ku em li wan maf û azadiyên ku em ji bo bidestxistina wan têdikoşin - ne bi tenê bi sloganên ku ne bi zimanê me- lê ji dil û can û bi zimanê xwe bi xwedî derkevin.

Ez li tiştên ku divê bêne kirin fikirîm. Ez gîhaştim wê qenaetê ku pêwîstiya kurdan ji herkesî bêtir bi rojeke weha heye. Divê em di vê rojê de hewil bidin da ku statuya pirtûkê û nemaze ya bi zimanê me yê qedexekirî, di nav civatê de bilindtir û xurttir bibe. Di vê rojê de, divê weşanxane û nivîskarên me hem li welêt û hem jî li derveyê welêt bi hewildanên hevbeş çalakiyên cur be cur amade bikin. Divê nivîskarên me hin pirtûkên xwe cara yekem bi minasebeta vê rojê û her di wê rojê de pêşkêşî xwendevanan bikin. Divê rêxistinên me yê çandî, hunerî û civakî di vê rojê de, bi awayên cuda beşdarî wan hewildanan bibin ku ji bo piştgiriya pirtûkê tene kirin. Kovar û rojnameyên me di rûpelên xwe de, divê cîhekî girîng bidin vê rojê. Divê her bikirê/a pirtûkeke kurdî bi gulekê bê xelatkirin. Ger li welêt şertê wê tune be jî, heta ew şert bê amadekirin qet nebe, li derveyê welêt divê ji her zarokxaneyeye kurd re, bi qasî hejmara zarokên kurdiyê pirtûkên zarokan bêne şandin. Divê hemû rojname, kovar,

komeleyên nivîskaran û weşanxaneyên kurdî hem ji bo vê rojê û hem jî bi minasebeta 22ê Nîsanê roja rojnamegeriya kurdî, ji salê carekê rojnameyeke hevbeş î taybetî biweşînin û hwd...

Ev roj divê hem bi giştî ji bo piştgiriya statuya pirtûkê û hem jî bi taybetî ji bo li pirtûka kurdî ya ku şertên zîndebûn û berdewamiya jiyana zimanê me misogertir dike, bi awayekî pîrhêl û xurttir bi xwedî bête derketin, bibe rojeke me ya xwerû kurdî. Divê ew di jiyana me de bibe xwediyê cîhekî taybetî. Em xusûsiyeteke weha bidin vê rojê, da ku digel lêbixwedîderketina pirtûkê, em his û daxwazên xwe yên ji bo paraztin û bikaranîna zimanê bav û kalan bigihînin civatê û ji bo lêbixwedîderketineke hevbeş îmkanên xurttir amade bikin û bi vî awayî şertê hebûna xwe misogertir bikin.

## V

Pirtûk ronahî ye. Li devera ku pirtûk xwe lê digire, cîh nakeve tarîti ye. Ji ber vê yekê, yên xwestiye mirovan di tarîtiyê de, li quncikeke dîrokê bi xwe nehisiyayî û veşartî bihêlin, beriya hertiştî berê xwe daye pirtûkan û bi vî awayî gelek hêlên dîrokê di tarîtiyê de hiştine. Di gelek demên dîrokê de, dijminên ronahiyê pirtûkxane şewitandine, nivîskar hem girtine hem kuştine û hem jî mecbûrî sirgûnê kirine. Bi vî awayî ronahî di her deman de, hertim bûye hedefa xezeba tarîtiyê.

Li welatê min î şewitî jî di gelek demên dîrokê de, pirtûk û pirtûkxane hatine şewitandin. Şewitandin bûye perçeyekî ji jiyana rojane. Ne pirtûkên bi kurdî bi tenê, herweha bi kîjan zimanî dibin bila bibin, pirtûkên li ser kurdan jî tene şewitandin. Welatek tevî pirtûk, ziman û rengên xwe di bin lingên "fîlan" de dinale. Tune tê hesibandin. Wek perçeyekî "Fîlistanê" tê dîtin. Bi tenê bi zimanê "fîlî" dikare lê bê xwendin. Di 23ê Nîsanê de, di wê roja ku dinya bi kêf, heyecan û hezkirina pirtûkan ve dixulxule de, di wê roja ku zarokên me ne dikarin leyistikên xwe bileyizin û ne jî di wan leyistikan de dilê xwe li "Sat axa, satil axa" rehet bikin de, li "Fîlistanê cejna zarokan", bi gotineke din durûtî tê pîrozkirin. Ew roj jî îmkanên propagandayê yên bi minasebeta wê rojê jî peyda dibin, ji bona ku pirtûka kurdî, vê parezgeha me ya li dijî asîmîlasyonê ronahiyê nebîne û roj li ezmanê me qet xuya nebe, wek çekeke asîmîlasyonê tê bikaranîn.

Di 23ê Nîsanê de, kêfa min du caran li min biliya. Kulên min du caran li berê, tev de rabûn. Ez du caran li ser hevdu li ber ketim. Yek ji ber di roja pirtûkê de, situwariya pirtûka kurdî bû. Ya din jî ji ber durûtiya "Fîlistanê û Siltanê Filan" a li hember zarokan bû. Di wê roja ku xwedêgiravî ew dixwazin bikin "cejna zarokên dinyayê" de, ji gelek welatên dinyayê zarok bi kincên xwe, bi adetên xwe û bi zimanên xwe hatin ba "Siltanê Filan", hatin seraya wî ya "krîstal". Yên Zelandaya Nuh li gor adetên xwe bêvilên xwe di serê xortima "Siltanê Filan" de dida. "Siltanê Filan"ê ku qûn di kuçik de û dev di çiçik de

û "bextiyariya xwe" li ser vê situxwariyê ava kiriye, ji bo xwe wek "zarokhezekî" xuya bike, hemû hunerên xwe yên di vî warî de hebûn, mobilîze kirin. Guhên wî yên wek merşan ên dangan ji qonaxa çil roj û çil şevan his dike, lê dengê zarokên me, zimanê wan nabihîse. Çavên wî yên peqle ên ku "gêrika reş li ser tahta reş" a qonaxa çil rojê dûr e dibîne, lê pirtûka ku rengê dilê me ye nabîne. Ger ev bi rastî cejneke zarokên dinyayê be, ka zarokên ku herroj dixwazin bang bikin û bibêjin; "Hey Siltanê Filan, em zimanê xwe dixwazin"? Ka ew rengê ku tu wek cinê ji hesin bitirse, jê ditirsî? Zarokên kurd ên ku li bakurê welêt "fil" her serê sibehê, "ez tirk im, ez rast im" bi zorê bi wan didin gotin, di wê rojê de jî bi adetên xwe yên qedexe, bi kincên xwe yên qedexe û bi zimanên xwe yê qedexe, heta ku deng di wan de hebû, dixwest bibêjin; "ziman, ziman, ziman!" û berê xwe bidin keskesora li ezmên a ku bi awayekî xemgîn şehadetî dikir. Rewşa zarokan wê rojê jî kêl li projeya "Siltanê Filan" bişkavt. "Siltanê Filan" wê rojê jî ew tune hesibandin, wê rojê jî ji ser texteyê xwe yê "almas" got ku hûn ne hûn in. Wê rojê jî hat gotin ku ger hûn wek "hevvelatîyên azad" dixwazin bijîn, divê hûn hewil bidin û bibin fil. "Siltanê Filan" wê rojê jî agir li zarokên me barand û bi xezeba hovîtiya xwe dengê hawara dayikan di ezmanan re derxist. Wê rojê jî nehişt li navbera herdu çeman kulîlk bibişkivin. Wî wê rojê dîsa got ku bi tenê yên bi dil û can bixwaze bibe fil, dikarin bijîn û li "Filistanê" bibin hertişt, heta dikarin bibin "Siltanê Filan" jî.

## VI

Pirtûka kurdî situxwar, zarokên kurd situxwar... Di sedsala otobanên zanistê de, ji bo li navbera herdu çeman kulîlk bibişkivin, ji bo roj li ezmanê me yê şîn bi tîrêjên xwe yên dostane tîna xwe bidin me û ji bo şertên situxariya pirtûka kurdî û zarokên kurd bi temamî ji ortê rabin, çeka me ya herî xurt ew e ku divê em helwesta xwe ya di warê lêbixwederketina ziman û pirtûkê de zelaltir û xurttir bikin.

Li gelek deverên dinyayê tarîti hat qewirandin. Lê li devera ku roja medeniyetê cara yekem lê hilat, hîn jî hikmê tarîtiyê dimeşe. Li devera ku cara yekem nivîs lê peyda bû, hîn jî "nivîs" qedexe ye, ziman qedexe ye û pirtûk qedexe ye. Pirtûk hêz û îlham e. Zanist û bawerî ye. Evîn û azadî ye. Hêvî û daxwaze... Pirtûka kurdî dê di civaka me de bingehê tolerans, hevdufahmkirin û danûstendinên medenî xurttir bike. Em ê jî bi saya wê, hêdî hêdî bêtir fêr bibin ku berê bifikirin û dû re bikin. Pêşveçûna zimên bi xurtbûna statuya pirtûkê ve hişk girêdayî ye. Her ku statuya wê xurttir bibe, şertên berdeamiya jiyana zimanê me jî dê xurttir bibin.

Bi hêviya ku roja pirtûkê di civaka me de jî bê pîrozkin û ne situxwariya pirtûka kurdî û ne jî ya zarokên kurd bimîne...

# Kurd di berhema Îbn Xeldûn de

Kîtab el-'Iber We Diwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-'Ereb we el-Ecem we el-Berber (Îbn Xeldûn)<sup>1</sup>

Wergera ji erebî : E. Narozi

## Wezîrtiya Şawer [es-Se'dî ebû Şecca' Mucîr ed-Dîn] û ya Ed-Dîrxam piştî wî

Şawer di sala [5]58/1162an de kete Qahîreyê û bi kurê xwe Teben, Şecca' û et-Tazî ve çû xaniyê Se'îd es-Su'eda. [Xelîfe] 'Adid ew kire wezîr, bi "Serdarê Leşker" bernav kir û ew danî ser mal û milkê Benî Ruzzîk [Ruzzîkiyan].<sup>2</sup> Wî dest danî ser pirê malê wan û xweymaş û xweytayin dehqat zêde kirin lê ew ji xelkê veşart. Salih ibn Ruzzîk ji hinek mîrekên ku ji wan re "Serdarên Berqî" dihate gotin û pêşewayê wan jî [Ebû el-Eşbal] Ed-Dîrxamê dergevan bû bi nihênî grubekê bi rêkxist û neh meh piştî wezîrtiya Şawer ev hêz li ber rakir, ew li hember wî drket avête ser û ew ji Qahîreyê derxist. Ew [Şawer] reviya xwe avête Şamê, kurê wî 'Elî û gelek ji serdarên Misrî hatin kuştin, dewlet qels bû û bê gernas ma, ev yek bû sedemê çûna wê ber bi xerabûnê ve.

## Çûna Şêrkoh û leşkerê Nûreddîn digel Şawer ber bi Misrê ve

Dema Şawer gihîşte Şamê bi hawar çû xwe avête cem melikê adil Nûreddîn û pê re sozê sêyeka baca mal û milkê Misrê da, bi şertê ku ew pê re leşker bişîne. Nûreddîn rabû Şêrkoh ku pêşewayek ji yê dewleta wî bû, hazir kir - sedemê xwelêgirtina wî [Şêrkoh] lê [li Nûreddîn] dê di cihê wî de bê gotin - û ew di cumadulaxera sala [5]59/1163yan de bi rê ketin. [Cumadulaxer meha şeşemîn ji salnameya koçî a hîvî ye ku dikeve nîsana sala 1163yan - Narozi.] Ji xwe Nûreddîn ji Esededdîn Şêrkoh daxwaz kiribû ku Şawer bizivirîne ser wezîrtiya wî û heyfa wî ji dijminên wî hilîne. Bi çûna wan re Nûreddîn jî tevî leşkerekî din berê xwe bi hêla welatê Ferencan [Frengan]<sup>3</sup> ve da û çû da wek



ku nehêle ew ji wê hêlê ve êrîşî Esededdîn bikin. Dema ku Esededdîn û Şawer gihîştin Bilbîsê hingê birayên Ed-Dîrxam Nasîreddîn û Fexreddîn Hemam bi leşkerên misrî ve hatin pêşiya wan lê wan ew şikandin; ew [Nasîreddîn] bi xwe zivirî Qahîreyê bes serdarên el-Berqî yên hevalên wî ku ew ji bo êrîşa ser Şawer kişkiş kiribûn, hatin kuştin. Esededdîn digel birayê ed-Dîrxam ku dîl bûbû, kete Qahîreyê, Ed-Dîrxam reviya lê li ser pirê li nik goristana Sitî Nefiseyê hate kuştin. Birayên wî jî hatin kuştin, Şawer dageriya ser wezîrtiya xwe û li ser hukum rûnişt. Çendeyekî dûre ew li wî sozê xwe yê ku dabû Esededdîn û siltanê wî qelibî û ew vegerande Şamê.

### **Gelşa Esededdîn bi Şawer re û dorvegirtina wî**

Gava Esededdîn zivirî Şamê demekê li wir li ser kar û barê Nûreddîn ma. Piştê di sala [5]62/1166an de wî ji Nûreddîn el-'Adil destûr xwest ku vegere Misrê, wî jî destûr dayê, jê re leşker amade kir û ew ber bi Misrê ve bi rê ket. Di rê de li welatê frengan peya bû, piştê hate Eḡfîhê ku devereke Misrê bû li wir li çemê Nîlê xist derbasî hêla rojava bû û li el-Cezîreyê (Giravê) danî. Wî heyana salên pêncî û hinekî4 li hêla rojava kukum kir, bi vê yekê re şawer jî alîkarî ji firengan xwest, ew anîn Misrê û pêk ve avêtin pêşiya Esededdîn Şêrkoh. Ew li es-Se'îdê gihîştin wî, ji ber pîrbûna hejmara wan ew bi paş ve vekîşiya ku yekser rastî wan neyê, lê dûre berê şer da ser wan. Digel hindikiya leşkerê wî ku du hezar jî tinebûn, dîsa wî ew şikandin. Di pey re wî berê xwe da Îskenderiyeyê, wî di riya xwe de bacê jî dahev û çû haya ku gihîşte wir. Xelkê wir jê ewleyî xwestin, wî ew der zeft kir û biraziyê xwe Selaheddîn Yûsufê kurê Necmeddîn Eyyûb kire waliyê wir û ew bi xwe vegeriya ser baca es-Se'îdê.

Bi wê re leşkerên misrî û frengî li Qahîreyê kom bûn, nakokiyên nav xwe rakirin û berê xwe dane ser Îskenderiyeyê; dormedarê Selaheddîn girtin, lê Esededdîn ji Es-Se'îdê çû wan. Hingê hinek ji hevalên wî yênTürkmen ku Şawer ew qayil kiribûn, dev ji şer berdan û doza lihevhatinê lê kirin. Ew bi wan [Şawer û Frengan] re li hev hat, Îskenderiyeyê li wan zivirand û di zulqe'deya sala [5]62/1166an de zivirî Şamê [zulqe'de meha yazdemîn ji salnameya koçî a hîvî ye ku dibe tebaxa sala 1166an - Narozi]. Freng demeke dirêj li ser Misrê man û ji misriyan re şert danîn ku divê ew hêzeke xwe binin Qahîreyê û deynin ber deriyên wê da ku leşkerê Nûreddîn nekevê. Herweha wan daxwaz kir ku biryara bacekê ji bo wan bê dayin û hersal ji wan re bê şandin, wî [Şawer] ew[daxwaziyên wan] hemî qebûl kirin.5

### **Vegera Esededdîn ya Misrê, kuştina Şawer û wezîrtiya wî**

Piştire dilê frengan bijiya Misrê û rabûn êrişî ser xelkê wê kirin, wan dest danî ser Bilbisê û xwestin ku herin Qahîreyê. Lêbelê Şawer ji vegirtina wê [Misrê] tirsîya û rabû ferman kir ku wê wêran bikin. Ew [Misir] hate şewitandin û xelkê wê hate talan kirin lê heyanî hingê freng jî daketin ser Qahîreyê. Li ser vê yekê 'Adid jî rabû meriv şande cem Nûreddîn û jê hêviya alîkariyê kir, bes Şawer ji hevkarîya 'Adid û Nûreddîn tirsîya, rabû xwe ji bo lihevhatinê avête frengan û li ser ku du hezar hezar [du milyon] dînarên misrî pêşîn û dehhezar îrdeb6 jî ji berê çandiniyên salê bide wan, bi wan re lihevhat û bala wan kişande ser vê rewşa zor [hevkarîya ,Adid û Nûreddîn]. Di lihevhatinê de sefir el-Celîs ibn 'Ebd el-Qewî û katibê sirrî Şêx el-Muwafiq jî hazir bûn. 'Adid ew ji bo hînbûna raya wî şandibûn7 û gotibû ku; ew li cem me û bapîrên me hemî xwedî qedir e û şîretkarê me ye. Kamil Şecca' ibn Şawer xwest ku el-Qadî el-Fadîl 'Ebdurrehîm el-Beysanî were cem da ku ew pê bişewire û jê re got: "Ji mezinê me yanî 'Adid re bibêje ku; dana cizyeyê (bacê) bo frengan ji ketina Xuzziyan a welêt û pêhisandina wan bi rewşê çêtir e [Mebest jê bavikê Oğuziyan yê pêşiyê Turkan e ku malbata Nûreddînê kurê 'Îmadeddîn Zengî ji wan bûn - Narozi].

Dûre li ser daxwaziya 'Adid, Nûreddîn bi Esededdîn Şêrkoh re biraziyê wî Selaheddîn, çend serdarên din û leşker şande alîkariya wî. Dema frengan bihîst ku ew gihîştine wir ew ji Qahîreyê derketin û zivirîne welatên xwe.

Dîroknaşê dewleta 'Ubeydiyan Îbn et-Tewîl gotiye: "Wî [Şêrkoh] ew li ser Qahîreyê şikandin, leşkergehên wan talan kirin û Esededdîn di cumada duyemîn [yanî cumadulaxera ku dibe meha şeşemîn ji salnameya koçî a hîvî - Narozi] ya sala [5]64/1168an de kete Qahîreyê. 'Adid ew perû kir û ew zivirî wargeha xwe. Jê re tayin û erzaqê leşker hatin danîn, lê Şawer bi xwe di bizd û bêtebatiyê de mabû û dayina malê ku jê re hatibû diyar kirin bi paş dixist. 'Adid jî ji bo kuştina Şawer di bin de Esededdîn han dida (teşwîq dikir) û jê re digot: "Ev xulamê me ye, di mayina wî de ne ji bo te û ne jî ji bo me tu xêr nîne". Ew jî rabû wî Selaheddînê biraziyê xwe û Ezeddîn Xurdîk8 şande pêşiyê. Şawer wek adetê xwe yê hercar dîsa dihate cem Esededdîn, wî [ji dûr ve] ew li ber tirba Îmamê Şafi'î dît û rabû berê xwe da wir û bi aliyê wî ve çû. Selaheddîn û Xurdîk li pêşiyê rabûn ew kuştin û serê wî ji 'Adid re şandin. Xelkê, der û dora wî talan kir, kurên wî Şecca' û Et-Tazî bi hinek hevalên xwe ve li koşkê hatin girtin. Ew [Şêrkoh] bi wezîrtiyê hat perû kirin û bi bernavê el-Mensûr Emîr el-Cuyûş (Serdarê Leşker yê pê re alîkarîkirî) hate binavkirin. Ew di serokwezîriyê de rûnişt kar û bar baş xiste destê xwe, bû desthilatdarê dewletê û erdê herêman wek Îqta' (xanedanî) li leşkerên xwe parêvekir. Ji xwe hevalên wî ji desthilatdariya wî re amade bûn. Xelkên Misrê li welatên xwe zivirîn û ew tiştê ku ji bo wêrankirina wê kiribûn inkar kirin. Piştire careke din

ew çû cem 'Adid û jê re got: "Ey gewherê mamosteyan, mezinê me ji bo te dibêje ku;

Te em xwestin Xwedê jî bi alîkariya te dijinê me ji me re piçûk kir.

Esededdîn jê re sonda qencî û aştiyê xwar û wî jî jê re got: "Hêviyeke hê mezintir ji te tê kirin" û ew xelat kir. Cihê El-Celîs ibn 'Ebd el-Qewî ku serokqazî û serdadiger bû, li cem wî xweş bû û wî ew li ser karên wî hiştin.

### **Wefata Esededdîn û wezîrtiya Selaheddîn**

Du meh piştî wan çend rojên hindik yê wezîrtiya xwe, yazdeh meh jî tê gotin, Esededdîn rehma Xwedê lê be, çû ser dilovaniya xwe. Wî li hevalên xwe wesiyet kir ku ji Qahîreyê neçin. Dema ku wefat kir hinek ji serdarên en-Nûriyye (Navê hêzeke leşkerî ye ku li ber navê Nûreddîn hatiye binavkirin-Narozî) jî pê re bûn. 'Eyn ed-Dewle el-Farûqî<sup>9</sup>, Qutbeddîn Nesal<sup>10</sup>, 'Eyn ed-Dîn el-Meştûbî el-Hekawî<sup>11</sup> û Şhabeddîn Mehmûd el-'Hazemî<sup>12</sup> hinek ji wan bûn. Ew li ser wezîrtî û mezinatiyê ketin qirika hev û heryek ji wan hevalên xwe dane hev da ku zora ên din bibin, lê ji ber biçûkî û qelsiya Selaheddîn li ber wan meyla 'Adid jî li ser wî bû. Herweha ji ber çûna pirê leşkerê wan bi hêla rojhilatê ve ji bo şerê Xuzziyan [Oğuziyan] û ji ber tesîra mezinatiya Qereqûş li ser wan, xelkê dewleta wî jî pê re hev fikir bûn. Yê din jî wezîrtiya Selaheddîn dixwestin û ji xwe 'Adid jî ji ber xizmeta wî ya berê diva ku wî perû bike, rabû gazî wî kir, wezîrtî dayê û birî da (giraniya xwe danî) ku hevalên wî jî bîne rê. Feqe Îsayê Hekarî ku yek ji mirovê pê bawer ê Selaheddîn bû, ji bilî 'Eyn ed-Dewle el-Farûqî ku zivirî Şamê, yê din hemî yeko yeko kişande cem wî. Selaheddîn wek cihgirê Nûreddîn bi wezîrtiya Misrê ve rabû û bi bernavkê "Serdarê Îsfehîsanî"<sup>13</sup> jê re name dinivîsand û herwisa serdarên leşkerî yê Misrê hemî jî bi vî navî jê re dinivîsandin. Demek di pey re Selaheddîn serweriyê bi tevayî xiste destê xwe û rewşa 'Adid jî her ku çû qels bû. Ew rabû wî Dar el-Me'rîfe ya Misrê ku zindan bû, rûxand cihê wê ji

Şafi'îyan re kire medrese [dibistan] û Dar el-Xezelê jî ji Malikiyan re kire dibistan. Wî qaziyê Şî'îyan ji kar avêt, qaziyekî şafi'î li Misrê anî ser kar û li herdeverên welat cihgirên wî danîn.<sup>14</sup>

### **Dorvegirtina frengan a Dimyatê**

Dema Esededdîn û hevalên xwe hatin Misrê ew vegirtin û ew [Freng] jê

derxistin hingê ew ji kirinên xwe ên bêhed û bêsinor poşman bûn, çiku ew malê ku ji wir digihîste wan hate birîn û sergêjiya Xuzziyan ya ser Qudsê jî ew ditirsandin. Ew rabûn wan ji frengên Siqilliyeyê û yê Endulusê re nivîsand û ji wan daxwaziya alîkariyê kir. Ji herderî ve ji wan re hawar hat; ew di sala 565/1169an de daketin Dimyatê ku Şems el-Xewasê Menkûrî lê dima. Selaheddîn bi Behaeddîn Qereqûş û serdarên Xuzziyan re jê re hawara mal û leşker rêkir, ji Nûreddîn jî hawar xwest û jê hêviya bexşandinê kir ji bo ku ew ji ber rewşa Misrê û ya şî'yan nikarîbûye here cem.

Nûreddîn hino hino leşker jê re şand û ew bi xwe jî ber bi welatên frengan yê qeraxê Şamê ve çû û cih li wan teng kir. Piştî pêncî rojî dema freng ji ser Dimyatê rabûn û zivîrîne welatê xwe dîtin ku welatê wan wêran bûye. Li ser vê 'Adid pesnê selaheddîn da û jê re sipas kir. Dûre Selaheddîn şande pey bavê xwe 15 Necmeddîn û hevalên wî ku herin Misrê. 'Adid ji bo rêzdariya wî [Selaheddîn] derket pêşiyê [pêşiya bavê wî].

### **Bûyera Xisyan [Xesandî] û 'Emmare**

Dema rewşa Selaheddîn li Misrê li hev rast bû şî'î û serokên wan pê keribîn, hinek ji wan mîna el-'Ûrîş, serekqazî Ibn Kamil, Serdar Me'rûf, nivîskar 'Ebd us-Semed ku suxenwer (fesîh) bû û 'Emmareyê Yemenî yê şairê Zubeydiyan - ew li gor nîşan [mertebe] û mazinatiyê weha li pey hev dihatin - civiyan. Ew tev li ser derxistina Xuzziyan ji Misrê bûne yek ku gazî frengan bikin û pareke mezin ji hatina wê ya salan e bidin wan. Wan qesta yekî şî'î bi navê Neccah û bernavê Mu'temîn ed-Dewle ku xisyanê [xesandiyê] serayê bû 16, 'Adid xwedî kiribû û bûbû xezûrê wî jî, kir û ew xapand, jê xwestin ku ew di mala xwe de peyamê frengan û 'Adid bîne cem hev. Wî di mala xwe de ew ne bi 'Adid bi xwe re lê bi yekî ku cilê 'Adid lê bûn re rûbar kir, bes pê da hiskirin ku pê ['Adid] re li hev kiriye. Piştî ev xeber gihîste mezinek ji yê şî'yan Necmeddîn ibn Mudal ku Selaheddîn ew hilbijartibû û kiribû waliyê Îskenderiyeyê, lê ji ber hinek gelşên navbera wî û Behaeddîn Qereqûş wan texmîn dikir ku ew jê xeydiye. Ew rabûn wî ji vê şêwra nav xwe agahdar kirin û jê xwestin ku ew bibe wezîr, Emmare jî bibe serkarê diwana wezaretê û defterdar, li cihê el-Fadil jî Ibn Kamil bibe serekqazî û serdadgêr, 'Ebd us-Semed jî serkarê bac û mal be û el-'Ûrîş jî bibe çavdêrê ser. Ibn Mudal bi wan re li hev kir lê piştî giliyê wan li cem Selaheddîn kir, ew û peyamê frengan giş dane dest.

Di çend dadan (mahkemeyan) de biryar li ser wan hate girtin. Serkarê serayê ku bi Xuzziyan [Oğuziyan] ve girêdayî bû, hazir bû û înkara hatina 'Adid ya mala Neccah kir. Wî bi serê xwe û yê 'Adid sond xwar ku ev yek

çênebûye. Li ser vê yekê ji 'Adid hate xwestin ku Neccah jî bi serkarê serayê re bê huzûra dadê; ew hat û qebûl kir ku 'Adid ne di wê şêwrê de bûye, Selaheddîn rabû ew [Neccah] da berîkirin.

'Emmare bi xwe carna diçû civata Şems ed-Dewle Torinşah, carekê wî [Torinşah] ji birayê xwe Selaheddîn re got ku; wî [Emmare] qesîdeyeke pesnê li ser nivîsiye ku pê wî bixirîne bibe ser Yemenê, li wir wî ji rê derîne û di Deriyê en-Nebewî de têxe hundur da ku xwîna wî helal bibe. Ew qesîdeya wî ev e:

Ji xwe re milkekî ku bi bal kesî din ve nayê dayin

biafirîne û pêlîdana agir hilde jor

Ev kurê Tûmert e<sup>17</sup> ku desthilatdariya wî,

çawa el-Werî dibêje: "goştê ser qoçê daran e".

Pêşewayê vî dînî zilamek bû ku

bi "Serwerê Umme" dihate gazîkirin.

Selaheddîn rabû ew dane hev û di yek rojekê de li Beyn el-Qesreynê (navê taxeke Qahîreyê ye, yanî navbera herdu koşkan - Narozi) daleqandin. Wî Ibn Kamil bist roj piştî wan hişt lê piştê ew jî daleqand. 'Emmare çû ber deriyê Qazî el-Fadil, xwest ku wî bibîne lê nehiştin. Ew ber bi sêpiyên daleqandinê ve çû û weha got:

'Ebdurrehîm xwe veşartîye,

Bêguman felat ya herî ecêb e

Di kitêba Ibn el-Esîr de weha ye: "Selaheddîn ji nameya wan ya ku ji frengan re şandibûn bi şêwra wan hisiya bû; peyayên wî qasidê wan dîtibûn, nameya pê re xwendibûn û ew anîbûn cem Selaheddîn. Ewlekarê xelîfetiye jî ber nêzîkiya wî [ji wan re] hate kuştin, xizmetkar giş jî kar hatin avêtin û Behaeddîn Qerqûş ku xassyekî [xesandiyekî] spî bû, hatibû anîn bo serkariya serayê. Reşîk bi kuştina ewlekarê xelîfetiye hêz bûn, pêncî hezar kes ji wan kom bûn û li Beyn el-Qesreynê bi leşkerê Selaheddîn re şer kirin. Wan [leşkerê Selaheddîn] xwe ji wan xalifand heya ku ketin nav malên wan û agir berdand xaniyên wan, mal û zarokên wan şewitandin, ew şikiyan û wan şûr xiste nav wan. Piştê wan [reşîkan] doza ewleyiyê kir û çûn el-Cezîreyê (Giravê), Şems ed-Dewle Torinşah çû cem wan û ew anîn rê".

### **Birîna xwendina xutbeyê ji ser navê**

### **'Adid û dawîya dewleta 'Elewiyan li Misrê**

Dema ku Selaheddîn li erdê Misrê serbest bû û rewşa 'Adid jî li wir qels bû ku êdî li qesra wî hukum dikir, Nûreddîn el-'Adil jê xwest ku doza wan

[’Elewiyān] li misrê biqedîne û xutbeyê li ser navê Mustediê Ebbasî bide xwendin, lê wî ev yek bi derengî xist û ji bo ku Nûreddîn zêde neçe bi ser ve jî dijderketina xelkê Misrê û neqebûlkirina wan dikire manî. Bes piştre Nûreddîn ev yek [xwendina xutbeyê] lê pêwîst kir ew rabû bi havalên xwe şewirî wan jî destûr da û diyar kirin ku dijîtiya Nûreddîn ji wan re nabe. Wî yek ji zanayên Eceman Şerî’etmedar el-Xebşanî ku bi ”Serdarê Zanayan” dihate gazîkirin, şande cem lê dema ku dît ew ji xwendina xutbeyê direvin rabû got: ”Ez dê wê bixwînim”. Ew di Îna pêşî ya muherrema (meha pêşî ji salnameya koçî hîvî ye. Narozî) sala 567/1171ê de berî xutbexwînî derkete ser mînberê û ji el-Mustensir re du’ a kir, tu kesî dengê xwe jê re nekir. Li ser vê yekê Selaheddîn di Îna duyemîn de ferman da xutbexwînên Misrê û yên Qahîreyê ku xutbeyê ji ser navê ’Adid bibirin û li ser navê Mustedi’ bixwînin wan jî wusa kir û ev yek ji her deverên Misrê re hate nivîsandin.

Di wê demê de ’Adid jî di nexweşîyeke xedar de bû, ji ber vê yekê jî kesî ew ji bûyerê agahdar nekir. Ew di aşureyê (dehkê heciyan yê) wê salê de çû ser dilovaniya xwe û Selaheddîn jî di serxweşîya wî de rûnişt. Wî va ku dest deyne ser qesra xelîfeyî û tiştên tê de, Behaeddîn Qaraqûş rabû ew birin cem. Di xezîneyên wê de celebên yaqût û zumrûd, xişrên pîrekan yên zêr, amanên (firaqên) zîv û zêr û gelek gewherên bêhempa yên nebihîstî hebûn. Wî halet û pergalên qesrê 18 yên mîna sifre û bergeşan, legen, misîn, dîzik û beroşan, aman û sehanan, piyale û surahiyên avê, çira, qendîl, teyfûrî, qabqab, xilxalên piyan û bazinên destan ku hemî ji zêr bûn, dîtin. Wî gelek celebên bihxweşiyê, cilên spehî, tiştên avzêrkirî, qerqebî, avîze û xemlên ku bi barên herî giran nayên rakirin, dîtin. Ji kitêban jî Ebdurrehîm el-Beysanî bi qandî sed û bîsthezâr cildên kitêbên mezin ji bo [qazî] el-Fadil da katib û qaziyên wî û nêzî pêncî hezarî jî ji dewarên barkirinê, olaq [hesp, hêstir, ker], çek, rênçber û xizmetkaran derket û bi qasî tijekirina sed xaniyî jî mal tê de hebû.

Piştir wî zilam (mêr) û pîrekên (jinên) wan avêtin zindanê heya ku tê de mirin. Di heyamê el-’Ezîz<sup>19</sup> û el-’Hakim<sup>20</sup> de hundurê dewletê ji mirovê xeberpêgir vale bûbû, ji ber wan mefîkan ew li rojhilatê belav bûbûn, lê bi xelasiya hukmê şî’îtiyê û mirina xelîfeyê wan [Şî’iyān] ê dawî el-’Adid ew hebên ku mabûn jî qediyān, [yanî] der û dor û bûyer û cengên ser dewletê, çawa ku me li pêş got, ew jî xwarin.

Dema el-’Adid mir û Selaheddîn dozê bi hêla ebbasiyan ve vegerand [yanî bi xwendina xutbeyê li ser navê ebbasiyan dewletê ji bin bandoriya fatimiyan derxist û bi desthilatdariya Ebbasiyan ve girêda - Narozî] hingê hinek kesên şî’î li Misrê civiyan û bi Dawidê kurê ’Adid re peyman çêkirin, lê nûçeya wan zû belavbû û Selaheddîn pê hisiya, rabû ew girtin dane kuştin û Dawid jî ji qesrê derxist. Ev yek di sala 569/1173yan de çêbû. Demek piştir kurê wî Suleyman ibn (kurê) Dawid, Xwedê jê razî be, li bajarê es-Se’îdê serî rakir, lê

ew jî hate girtin û ta mirinê zindankirî ma. Çendeyekî di pey re li Mexribê li hêla [bajarê] Fasê Muhemmed ibn 'Ebdullah ibn 'Adid rabû doza xwe li wir li dar xist û bi navê "Mihdî" hate gazî kirin lê ew jî hate kuştin û li qazoxê hate xistin.

Ji bilî herêma 'Hesîsiyên [Heşîsiyên] Îraqê [Serê pêşî heya demek piştî vegirtina islamê jî ji Îranê re Îraqa Faris dihate gotin û Îraq jî ku bi Îraqa Erebi dihate navkirin, dikete ber erdê wê - Narozi] ku bi navê "el-Fedawiyye" jî dihatin gazîkirin û ji bilî herêma Îsmaîliyan<sup>21</sup> ku doza wan ya Îraqê lê bû, tu behs ji 'Ubeydiyan<sup>22</sup> nema. Li wê derê [Îsmaîliyyeyê] Îbn es-Sebah û hinek kesên din li keleya mirinê çawa ku di serpêhatiyên wan de têne gotin, man ta ku ew rêçik jî di sala 655/1257an de bi ya Ebbasiyan re li ser destê Hulagoyê kurê Cengizxanê melîkê Teteran kutabû. Desyhilatdarî bi tenê ji Xwedê re ye.

Bûyerên fatimiyyan bi kurtayî ku min ji kitêba Îbn el-Esîr, ji Tarîxa Dewleta wan [Fatimiyan] ya et-Tewîr û hinekî hindik jî ji Îbn el-Mesîhî, bi qandî karîna xw dabû hev, ev in. Xwedê destegîrê (weliyê) penahê ye.

1. Ev werger ji berhema Îbn Xeldûn ya Kitab el-'Îber We Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-'Ereb we el-'Ecem we el-Berber, Dar el-Kîtab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, c. 4, r. 162-174an hatiye wergerandin. Ji ber ku di hejmarên berê yên kovara Çirayê de hinek beş jî vê berhema Ibn Xeldûn ya navdar hatibûn weşandin û di detspêka wê de li ser wî û berhema wî hinek agahdrî jî hatibû dayin, min pêwîstî bi dubarekirinê nedît.
- 2) Malbateke ku berî Şawer li pey hev bi çend bavan li Misrê wezîrtiya dewlata Fatimiyan kiribû. Wezîrê dawî ku Şawer ew ji wezîrtiyê avêtibû û kuştibû Ruzzîk ibn Telai' (mirin 1162) bû. (Ferdinand Tûlû, El-Muncid fi el-E'lam, Dar el-Meşriq, Beyrût, 1973, çap 7 rûpel 306)
3. Ev navê "Ferenc/Efrenc" yan jî weke ku di klasîkên Kurdî de tê gotin "Freng", navê hinek bavîk û eşîrên Germanî bû ku di sedsala San de li Fransa bi cih bûbûn û li wir xanedaniyên pêşî ava kiribûn, lê piştî êrişên Hêzên Xaçparêz yên ser Qudsê ev nav jî hêla rojhilatiyan ve ji bo Ewrûpiyan giş hatiye bikaranîn. (Ferdînad Tûlû, El-Muncid fi el-E'lam, Dar el-Meşriq, Beirut, 1973, çap 7, r. 53)
4. Çendî ku di eslê tekstê de "pêncî û hinek" e, lê ji ber ku li serê beşê [5]62 derbas bû ye diyar e ku wê li vir jî şêst û hinek be lê bi şaşî "pêncî û hinek" hatibe nivîsîn.
5. Li gor cih divê ku mebest bi pronavê "Ferenc"/frenc bin, lê bi awayê vêga ew jê nayê zanîn. Ev babet di [berhema Îbn el-Esîr ya] el-Kamil cildê 9an rûpelê 96an de weha ye: "Frengan di nav xwe û misriyan de peyman çêkiribûn ku şaneyeke [hêzeke] wan li Qahîreyê be, dergêhên wê di destên fêrisên wan de bin da ku nehêlin leşkerê Nûreddîn têkeve û ji bo vê yekê jî ji hatina Misrê hersal sedhezâr dînar ji wan re be. Evên han giş bi Şawer re hatibûn biryar dan lê tu hukmê 'Adid li ser nebû çiku wî [Şawer] ew bêxeber kiribû û hertîştî jê veşartibû. li ser vê yekê Freng di qeraxê wê hêla Şamê de zivîrîn welatên xwe û hinek ji palewanên xwe yên bi nav û deng li Misrê hiştin. Di wê hingê de Kamil Şecca' ê kurê Şawer bi hinek serdaran re peyamek şande cem Nûreddîn, jê hêviya hizkirin û mezinatiyê kir û xwest ku têkeve ber emrê wî. Wî bi demanî soz da ku beremriya wî bike û hersal jê re hinek mal bişîne. Wî [Nûreddîn] herê kir, wî jî jê re malekî pirr şand û rewşa wan weha domand ta ku Freng di sala 564/1168an de çûne ser Misrê". (Îbn Xeldûn, Kitab el-'Îber We Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-'Ereb we el-'Ecem we el-Berber, Dar el-Kîtab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, cild 4, r. 165, not 1)

6. Ołçekek/elbeka (pêpivekek e) ku bi qandî 24 sa' ê Misrî ye û dike 150 kg (Mevlût Sarî, El-Mewarid, Arabçe-Turkçe Luğat, Bahar Yayınları, İstanbul, 1984)
7. Piştî vî hevokî valayiyek heye û jê noteke bênav diçe, xuyaye ku ya weşanxaneyê ye. Not weha ye: "Ev der di eslê wê de jî weha vale bû, lê di berhema Ibn el-Esîr ya el-Kamil cildê 9an, rûpelê 101ê de weha ye: Heçî xelkê Qahîreyê pîrrên wan leşker û xulamên wan bûn, bi vê yekê re bêmalîyê zor da wan, ew rabûn wan vê rewşa ku xelk tê de ye ji Nûreddîn re nivîsand û sêyeka welatê Misrê pê re soz dan bi şertê ku Esededdîn digel leşkerê xwe li wir bimîne û di sa soz dan ku para wî û leşker wî jî ji welatê Misrê dê dervayî vê sêyekê be. Dema li Helebê nameya 'Adid gihîştê, wî Esededdîn xwest ba xwe û ji bo çûna Misrê fermana hazirîyê kir. (Îbn Xeldûn, Kitab el-'Îber We Diwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-'Ereb we el-'Ecem we el-Berber, Dar el-Kîtab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, c. 4, r. 165, not 2)
8. Li gor Ibn el-Esîr navê wî "'Ezeddîn Curdik" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 11, r. 340)
9. Li gor Ibn el-Esîr "el-Yarûqî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 11, r. 343)
10. Li gor Ibn el-Esîr "Yenal" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 11, r. 338)
11. Li gor Ibn el-Esîr "Seyfeddîn el-Meştûbî el-Hekarî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 11, r. 343)
12. Li gor Ibn el-Esîr "el-Haremî" ye. (Îbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 11, r. 343)
13. Li gor Ibn el-Esîr "Serdar Îsfehşalar" e. (Îbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir, Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 11, r. 344)
14. Ev nota han di teksta Erebi ya eslî de ji ser gotineke din ku di beşa pey vê de tê, diçe lê li gor naveroka xwe diviyabû ku ji dawîya vê beşê biçûna çiku pê ve girêdayîye. Ji ber vê yekê min ew ji wir anî û li dawîya vê beşê danî. Di [çapa] eslî de jî weha ye û di el-Kamil[a Ibn el-Esîr] cildê 9 rûpelê 110an de wusa ye: Ji bûyerên sala 566 (1170) an e ku li Misrê xaniyekî Şahneyê [hêza leşkerî] hebû jê re "Dar el-Me'ûnet" dihate gotin û girtîyan tê de zindan dikirin. Selaheddîn rabû ew hedimand û ji nû ve kire medreseyêke şafi'îyan. Wî qaziyên Misrê ku şî'î bûn giş ji qazîti avêtin, qaziyekî şafi'î li Misrê anî ser kar û li temamê welat jî cihgirên wî ên şafi'î danîn. (Ibn Xeldûn, c. 4, r. 169, not 2)
15. Di çapa eslî de jî evder weha metnekî ne rast bû, lê di [berhema Ibn el-Esîr ya] el-Kamil cildê 9an rûpelê 106an de weha ye: "Heçî Necmeddîn Eyyûb e ew û hevalên pê re giş bi saxî gihîştin Misrê, Xelîfe el-'Adid jî ji bo rêzdarî û qedirgirtinê derkete pêşîya wî". (Ibn Xeldûn, c. 4, r. 169, not 1)
16. Xisyan [xesandî] ew zilam in ku ji bo xizmeta nav herema serayan dihatin xesandin da ku nikaribin nêzî jinên serayê bibin.
17. Muhemmed ibn Ebdullah el-Herexî Ku li Mexribê serî hildabû û di 1130î de dewleta xwe danî bû lê temenê wê kin ajotibû. Ew Muhemmed bi mehdîtî jî hatibû nav dan. Emmare di şî'ra xwe de Selaheddîn pê şubihandîye û xwestîye bide zanîn ku jê re jî namîne. (Ferddînan Tûlû, El-Muncid fi el-E'lam, Dar el-Meşriq, Beirut, 1973, çap 7, r. 196)
18. Di çapa eslî de jî evder weha vale bû, lê di [berhema Ibn el-Esîr ya] el-Kamil cildê 9an rûpelê 112an de weha ye: "Êşa 'Adid lê giran bûbû ji ber vê jî ji ehl û hevalên wî tu kesî ew bi birrîna xutbeyê ji ser navê wî nehisand û gotin: 'ger ku baş bibe dê ew bi xwe bibihîze lê ger ku bimirê hingê pêwîst nake em li ber mirinê wî bi bûyereke wisa biêşînin'. Ew roja aşûrayê [roja dehikê heciyan ku dikeve dehê zulhecceyê, yanî meha dozdemîn ji salnameya koçî hîvî ku musilman tê de diçin hecê- Narozî] mir û ji birrîna xutbeyê ji ser navê xwe agahdar nebû. Dema ew mir Selaheddîn di serxweşîya wî de rûnişt û dest danî ser qesra xelîfetiye û temamê tiştên tê de. Behaeddîn Qereqûş ku Selaheddîn hê berî mirina 'Adid ew danîbû ser qesrê, ew parast û hemî tiştên wê ku ji zahfî nedihatî jîmartin, bir cem Selaheddîn. Gelek avîzeyên



giranbiha û tiştên nebînayî ku di dinyayê de bêhempa bûn û gelek gewherên ku li cem kesî din tinebûn, tê de hebûn. Ji wan gewheran yek ji ew werîsê yaqûrî bû ku giraniya wî hivdeh dirhem yan jî hivdeh misqal bû [Dirhem û misqal du cure pîvanên taybetî yên zêr û kevîrên giranbiha bûn ku hingê dihatin bikaranîn - Narozî]. Ez tê de guman nakim, çimkî min bi xwe ew dîtiye û wezinandiye. Herweha ew mirariya (la'la) bêhempa û ew qevda kêrê ya zumrûd ku çar tilî dirêj û bi qasî gerdeniyeke mezin fireh bû jî tê de bû. Tê de nêzî cihê 'Adid defeke ku parastina wê girîng hatibû girtin, derket lê dema ku ew dîtin texmîn kirin ku tiştêkî leyistikê ye û ji ber wê tinazê xwe bi 'Adid kirin. Mirovekî rahiştê, derbek lê da û tirek kir, hemî pê kenîyan lê herwisa yên din jî kî ji wan ku derbekê lê dida tirek dikir ra ku yekî ji wan rabû ew avêr û şikand. Bes ew ji bo dermanê qolincê bû û dema ku ji wan re hate gotin li şikandina wê poşman bûn.

Tê de kitêbên hija yî bêhempa ku nedihatî jîmartin hebûn, wî hertiştên tê de firot, ehlê 'Adid bire cihekî qesrê û yekî ku wan biparêze danî ber wan. Çi carîye û koleyên ku tê de hebûn wan derxist, hinekan firot, hinekan jî azad kir û hinekan jî herwe da; qesrê vale kir. (Ibn Xeldûn, c. 4, r. 173)

19. El-'Ezîz Billah ibn el-Me'z pîncemîn xelîfeyê Fatimîyan bûye (Ferdînad Tûlû, El-Muncid fi el-E'lam, r. 461)

20. El-'Hekîm Biemrîllah Mensûr ibn el-'Ezîz şeşemîn xelîfeyê Fatimîyan bûye. (Ferdînad Tûlû, El-Muncid fi el-E'lam, r. 227)

21. Îsmâ'îlî ku ji şaxekî wan re Batînî yan jî Hesîsî [Heşîşî] jî tê gotin rêgeheke (mezhebekî) şî'îyan e ku pêwendiyên wan bi dewleta 'Ubeydiyan (Fatimîyan) re hebûye lê kêman kesan pê dizinîbûye. Fatimîyan jî serê pêşî ve alîkariya îsmâ'îliyan kirine lê bi taybetî jî di dema el-'Hakîm Biemrîllah de bi riya yekî farîs ku navê wî Hemza ed-Durzî bû gelek alîkarî gihîştê wan û ew fikrê wan hatin belavkirin. Her di wî wextî de bi navê Hesên es-Sebah jî mirovekî ku bûyereke dirêj di nav wî û wezîrê Selçûqîyan Nîzam el-Mulk de qewimî, derkete holê. Hesên es-Sebah gelek kes da hev, ew bi rêk xistin û nêzî Qezwînê ketin çiyayê el-Lamewt (Bemîrin), nêzî sedsalî tê de man. Wî peyayên xwe bi dek û hîle dişande cem mirovên mezin û serek û ew didan kuştin bê ku bizanîbin ka kî li wan daye. Yek ji wanên ku Hesên ew dane kuştin Nîzam el-Mulk bû. Dihate gotin ku wî peyayên xwe bi sêrbazî yan jî bi haşaşê jî hiş dibirin, wan bêbiryar dikir û berdida xelkê; jî ber vê yekê jî wan re "Heşaşî" hatiye gotin. Çendî ku wargehê wan yê pêşî li bakurê Îranê li dora Qezwînê ku dikeve ber deryaya Xezere jî dima lê vê dawiyê ew hatin çiyayê es-Semaqê ku girêdayê bi Helebê ve bû. Li wir kele û sûrên wan yên gelekî asê hebûn ku derketina ser wan pîrr zahmet bû, kesî nika ribû xwe bidin ser wan. Dema ku Freng ketin erdê Şamê û ew vegirtin hingê wan alîkarî bi wan îsmâ'îliyan re kir, hiştin ku li çiyayê es-Semaqê xwe baş bi cih bikin û ew diji musulmanan bikar anîn. [Corcî Zeydan, Selaheddîn el-Eyyûbî, Dar el-Ceyl, Beyrût, n. d. (tarîxa çapê tine), çap 2, r. 82-83)

Li gor agahdariyên ku Ferdînad Tûlû di Muncidê de dide: Heşaşî naveke ku ji peyva Frengan ya Assassîns (Mêrxasan) hatiye girtin û bûye nav ji bo Îsmâ'îliyên Nezarî yên ku peyrewê Hesên es-Sebah in. Tarîxa wan bi "Serhildana Mirînê" ya ku di sala 1090î de li Îskenderiyeyê di bin serokatiya Hesên es-Sebah de qewimiye, dest pê kiriye û hêza wan jî bi kuştina wezîrê navdar yê Selçûqîyan Nîzam el-Mulk ya 1092yan xurt bûye û nav û dengê wan belavbûye. Heşaşî [Hesasî] heya piştî xelîfetiya Mustensîrê Fatimî bi îsmâ'îliyan re bûn, lê dema xelîfeti gihîştê kurê wî Ehmed el-Muste'î hingê ew ji wan qetiyane, bi Nezarê Birayê wî re peyman çêkirine û di bin pêşengiya Hesên es-Sebah de li Îskenderiyeyê serî hildane, lê li wir şikestine û berê xwe dane Keleya Mirînê. Piştî Nezarî yan jî Heşaşî diji rêgeha (mezhebê) îsmâ'îliyên Fatimî derketine, digel ku heya vêga jî ew navê îsmâ'îlî diparêzin û niha jî peyrewên Axaxan in. (Ferdînad Tûlû, el-Muncid fi el-E'lam, r. 45 xala Îsmâ'îliyan û 238 xala Heşîşîyan.)

22. Ew bavikê ku bapîrên wan 'Ubeydullah el-Mehdî, hîmdar û xelîfeyê pêşî yê dewleta Fatimîyan bûye. (Ferdînad Tûlû, El-Muncid fi el-E'lam, r. 455)

# Mitîngên sala 1967an

Zinar Soran

Piştî şikestina serhildana Dersimê û zilm, zordarî û terora dewleta Tirkiyê tevgera neteweyî ya Bakurê Kurdistanê kete nav pêvajoyeke nû. Ewrekî reş û tarî xwe bera ser Bakurê Kurdistanê da û tevgera gelê Kurd kete nav bêdengiyeye ker û lal.

Di sala 1946an de, Komara Tirkiyê derbasî sîstema pirpartîtiyê bû. Ev guherandin daxwaza dewletên emperyalist jî bû. Piştî bicihanîna vê daxwazê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê "Dokturîna Turûman" û "Plana Marşalê" xistin jiyane. Sermeyayên biyaniyan bi berdahseke fireh berê xwe dan Kurdistanê. Ji bo firotina malên xwe û talankirina dewlemendiya sererd û binerdê Kurdistanê gelek riyên nû hatin çêkirin. Bi vî awayî pêwendiyên nav gund, bajar û herêman Kurdistanê jî roj bi roj geştir û berfirehtir dibûn.

Piştî derbesbûna sîstema pirpartîtiyê, berberî û nakokiya desthilatiyê ya di nav çin û hêzên desthilatdar de her ku diçû kurtir û eşkeretir dibû. Kurdistan ne tenê ji bo dewlemendiya xwe, herweha ji bo hesab û planên hilibijartinan jî dibû navendeke gelek girîng. Hesab û planên hilibijartin û reyan, dibû sedemê ku zilm û zordariya giştî ya polis û leşkeran hinekî siviktir bibe. Guherandin, bûyer û pêşketinên ku li Tirkiyê û Kurdistanê çêdibûn, tesîra xwe di warê aborî, civakî, kulturî û fikrî de li ser gelê Kurd jî dikir. Hinek kurdên ku hatibûn sirgûn kirin, ji vê kês û rewşa nû îstifade kirin û vegeyriyan welatê xwe. Li Bakurê Kurdistan tovê pêvajoyeke nû careka din hêdî hêdî zîl dida.

Di 27ê gulana 1960î de, li Tirkiyeyê cûntayeye leşkerî iqtidara dewletê xiste destê xwe. Piştî mudaxelayê bi çend rojan, di 1ê hezîrana 1960î de, ji gelek navçeyên Kurdistanê 485 axa, şêx, serokeşîr, welatparêz û kesên navdar hatin girtin. Ew li bajarê Sîwasê, li kampekê xistin bin çavan. Ew kes bi qasî şeş mehan, di vê kampê de man. Piştî vê girtinê bi çend mehan, di 18yê çirya pêşîn ya 1960î de, "*qanûna sirgûnê ya bi hejmara 105an*" ji aliyê Komîteya Neteweyî ya Yekgirtî ve, hate qebûl kirin. Bi gotineke pêşiyên tirkan; "*pêşî minare hate dizîn û dûre xwestin kirasekî li gor bejna wê bidrûn*". Cûntaya leşkerî, ji nav wan girtiyan 55 kes neqandin û yên mayî berdan.

Ew 55 kes, di çeleya pêşîn ya 1960î de li gor qanûna surgûnê ya 105an, li wîlalayetên Antalya, Burdur, İzmir, Muğla, Afyon, İsparta, Manisa, Çorum, Denizliyê hatin bi cîwar kirin û bi qasî du sal û nîvan ji welatên xwe dûr, derbeder û mehacir hatin hiştin. Di nav van kesên ku hatibûn sirgûn kirin, Av. Faik Bucak û Kinyaz Kartal jî hebûn. Wan li ser navên xwe broşûrek weşandin û di vê broşûrê de zilm û zahmetiya ku hatiye serê wan dan diyar kirin (1).

Karbidestên leşkerî dijîtî û dijminatîya xwe ya li hemberî gelê Kurd, ne tenê bi girtin û sirgûnkirina wan kesan dan diyar kirin; herweha wan ev helwesta xwe di efûya giştî de jî berdewam kirin. Piştî ku leşkeran desthilatî xistin destên xwe, efûyeke giştî derxistin. Lê belê, Komîteya Neteweyî ya Yekgirtî 49 girtiyên siyasî yên kurdan ji derveyê vê efûyê hiştin. Cûntayê li hemberî gelê Kurd polîtîkaya resmî ya berê ku li ser bingehê asîmlasyon û înkare hatibû ava kirin, bi awakî berfirehtir û diwartir didomand. Piştî destguherandina desthilatîyê, li ser esasê înkare kirina neteweyê Kurd û zimanê kurdî kampanyayên nû yên berfireh hatin li dar xistin; ji bona ku kurd bi tirkî bipeyivin program û hewldanan taybetî hatin amade kirin û meşandin. Navên gund, hinek bajar û navçeyên Kurdistanê yên kurdî hatin guherandin û navê tirkî li wan kirin. Ji bona guherandina navên kurdî û ermenî qanûneke taybetî ya bi hejmara 1587an derxistin. Di vê qanûnê de, sedemên guherandina navên kurdî weha dihate diyar kirin: *“Navên ku ne li gor kultura me ya neteweyî ne û qaîdeyên ehlaqî, urf û adetên me û yên raya giştî diêşîne, wê bêne guherandin”* (2).

Teva vê helwesta nijadperest û kolonyalist jî, piştî qebûlkirina qanûna bingehîn ya 1961ê, ne pir zêde be jî di warê serbestî û azadiya giştî de, hinek pêşketin dihatin dîtin. Rewşenbîr û welatparêzên kurdan jî xwestin ji vê rewşa nû îstifade bikin û dest bi hewldana weşandina hinek kovar û rojnameyan kirin. Di van kovar û rojnameyan de, bi awakî sergirtî ya jî sînorkirî be jî, li ser hinek derd û kulên gelê Kurd jî dihate rawestandin. Lê karbidestên dewlata Tirkîyeyê tehamulî vê yekê jî nedikirin. Ji ber zilm, zordarî û çavSORIYA dewletê, ev kovar û rojname nedibûn xwediyê jiyaneke dirêj.

Ev zilm û zordestiya li ser kovar û rojnameyên kurdî, bahoza firtoneyeke nû bû. Ji ber sedemê vê bêtehamuliyê û helwesta nijadperest ya dewleta Tirkîyê, hinek xwendekarên kurd yên ji perçeyên Kurdistana Iraq û Îranê hewl didin ku li Stenbolê liqekî *“Komeleya Xwendevanên Kurd li Ewropayê”* bi awakî weşartî damezrînin. Di 4ê hezîrana 1963an de bi fermana wezîrê karê hundur Hıfzı Oğuz Bekata operasyoneke berfireh li ser xwendekar, rewşenbîr û welatparêzên kurdan dest pê kir. Polisên siyasî yên Stenbolê, di eynê wext û seatê de girtin ser malên Awûqat Ziya Şerefhanoglu, Musa Anter, Doğan Kılıç Şihhasenanlı, Sait Elçi, Medet Serhat, Edip Karahan, Enver Aytekin, Ali Anagür û ew girtin. Di vê operasyonê de, 13 kes hatin girtin û bi dû re hejmara

girtiyên gihast 23 kesên. Ev bûyer, di dîroka nêzîk ya Kurdistanê de, weke bûyera 23an tê nas kirin.

Ji bûyera 23an jî diyar dibe ku rewşenbîr, xwendekar û welatparêzên kurdan, ji bo pirsê kurdî bînin rojevê, hewldanên xwe her berdewam kirine. Lê ev hewldan û xebatên dihatin kirin ji rêxistinên siyasî, demokratîk, kulturî û meslekî yê kurdan bêpar bûn. Pêwîstiya rêxistinîyê her ku diçû, bêtir xwe derdixist pêş. Lê dewleta Tirkîyeyê bi tu awayî kês û firset nedida kurdan ku komele û rêxistinên xwe yê eşkere û demokratîk damezrînin.

## Lêgerîna alternatîfan û damezrandina rêxistinên îlegal

Gava hat dîtîn ku karbidestên dewleta Tirkîyeyê tu maf, kês û firsetê nadin kurdan ku di warê weşanî û çandî de dahî xebatên xwe bi awakî eşkere û demokratîk bidomîne; nerîna damezrandina rêxistineke siyasî ya weşartî, bêtir derkete pêş. Ji bo vê armancê, di nav rewşenbîr û welatparêzên kurdan de, danûstendin roj bi roj xurttir dibû. Lê di warê damezrandina rêxistineke siyasî, îlegal û serbixwe ya kurdî de, rewşenbîr, xwendekar û welatparêzên kurdan weke hevdu nedifikirîn. Di vî warî de, êdî riya wan jî hevdu vediqetîya. Di wê demê de, hinek rewşenbîr û xwendekarên kurdan yê çep û komunist di nav TIPê (Türkiye İşçi Partisi) û hinek komeleyên çep yê tirkên de cih girtibûn û bi wan re dixebitîn. Lê hinek welatparêzên kurdan jî, ji bo damezrandina partiyek siyasî ya serbixwe û îlegal dest bi hewldan û xebateke taybetî kiribûn.

Di encamê van hewldan û têkiliyan de, di 11 tîrmeha 1965an li Diyarbekirê ji aliyê Saîd Elçî, Faik Bucak, Ömer Turhan û hevalên wan Partiya Demokrata Kurdistanî (PKK) hate damezrandin. Piştî serhildana Agriyê û rêxistina Xoybûnê, ev cara yekem bû ku kurdan bi awakî îlegal jî be, bi nasnameya xwe ya neteweyî rêxistineke serbixwe ava dikirin. Ev jî bo tevgera Kurdistanî Bakur destpêka pêvajoyeke nû bû.

Di tebaxa 1966an de, Mehmet Ali Aslan li Ankarayê bi navê Yen Akı dest bi weşandina kovarekê dike. Kovar bi tirkî û kurdî dihate weşandin. Di hejmara pêşîn ya vê kovarê de, nivîseke İsmet Tümtürk jî kovara “*Millî Yol*” û nivîseke Nihal Atsız jî kovara “*Ötüken*”ê hatiye girtin û weşandin. Di vê hejmarê de, li ser kuştina serokê PDKTyê Faik Bucak jî nivîsek heye. Kovara “*Yeni Akiş*”ê tenê çar hejmar derketiye. Xwedî û berpirsiyariya sê hejmarên kovarê, Mehmet Ali Aslan û yê hejmara çaran jî, Abbas İzol kiriye. Av. Mehmet Ali Aslan û Abbas İzol jî ber berpirsiyariya kovarê û nivîsên xwe û Kemal Burkay jî jî ber nivîsa xwe ya di vê kovarê de, hatine girtin.

Li Kurdistanî Bakur her ku diçû tevgera kurdî berfirehtir dibû. Hevalbendên

ku pêwîstiya rêxistinên serbixwe yê kurdî diparastin roj bi roj bêtir dibûn. Piştî avakirina PDKTyê, di payiza 1966an de jî, çend xwendekarên kurd yê ku li metropolê dixwandin, li ser pêwîstî û nepêwîstiya rêxistineke serbixwe ya kurdî dest bi gotûbêjan dikin. Di encamên wan gotûbêjan de, ew weke prensîb digihêjin wê baweriyê ku pêwîstî bi rêxistineke weha heye û dixwazin rêxistineke weha ava bikin. Ew 7 kes dest bi hewldan û haziriya vê xebatê dikin. Lê ew di warê rêxistin, destûr û programeke çawa de, ne zelal in. Di destên wan de ne program û destûreke ku bikaribin rast û rast jê îstifade bikin hebû û ne jî ew xwediyê tecrûbeyên rêxistiniyeke îlegal bûn.

Teva ku ew 7 kes di warê rêxistin, program û destûreke çawa de, zêde ne zelal in jî, wan xwestine ku rêxistineke neteweyî, rizgarîxwaz û pêşverû ava bikin. Ew hewl didin ku ji pirtûk û meteryalên giştî yê milletên din jî îstifade bikin û meteryalên pêwîst bidin hevdu. Çend heval ji wan di encamê xebat û lêgerîneke dûr û dirêj de, pêşgotin û destûreke muwaqet amade dikin. Li ser vê pêşgotin û destûrê hûr munaqêşe dikin û awayê dawî bi daktîloyê dinivîsîn. Ev xebat û hewldan heta serê sala 1967an tê tamam kirin û ji aliyê 6 kesan ve “Koma Azadiya Kurdistanê (KAK) li Ankarayê tê damezrandin. Yek ji wan enamên damezrîner Hikmet Buluttekîn (Çeko) bû...

Ev pêşketin û şiyarbûna neteweyî nedihat hesabê dewleta Tirkîyê. Bi taybetî nijadperestên tirkan ji vê şiyarbûna neteweyî ya kurdan û xebatên dihatin kirin gelekî nerehet dibûn. Vê nerehetî û dijîtiya xwe bi her weşîleyê dianîn zimên. Nihal Atsız di nivîsa xwe ya di kovara “Ötüken” de û İsmet Tüntürk jî di nivîsa xwe ya di kovara “Millî Yol”ê de, bi awakî eşkere ev nerehetiya xwe anîn zimên; bi tundî dijminatîya gelê Kurd kirinin û ji dewletê daxwaz kirin ku bi operasyon û tedbîrên taybetî pêşiya vê şiyarbûn û pêşketinê bigrin. Lê xwendekar, rewşenbîr û welatparêzên kurdan, li hemberî van weşanên nijadperestî bêdeng neman. Ji çar aliyên Kurdistanê telgrafên protestoyê hatin şandin. 19 komeleyên xwendekaran yê ku li ser navên bajarên Kurdistanê hatibûn ava kirin, bi belavokên hevbeş, ew nivîs û bîrûbaweriyên nijadperest protesto kirin...

Li Kurdistanê Bakur, êdî qapax ji ser beroja kelandî hatibû rakirin. Ji hêlekê PDKTyê xebata xwe ya siyasî û rêxistinî pêş ve dibir; ji aliyê din jî xwendekar û rewşenbîrên kurdan yê li metropolê dixwandin di nav lêgerîn, gotûbêjeke germ de bûn. Xwendekar û rewşenbîrên kurdan yê di nav TIPê û komeleyên çep yê tirkan de dixebitin jî, pîrsa milletê Kurd bêtir dianîn rojevê. Di gotûbêjên li ser pîrsa kurdî de, giraniyeke berbiçav nîşan didan û ew weke grûb derdiketin pêş. Teva hemû zilm û zordestiya dewletê, rewşenbîrên kurdan di warê weşanî de jî bê deng nediman. Heta ji dest dihat li ser pîrsa kurdî, paşdehiştin û feqîriya li navçeyên Kurdistanê ku bi navçeya “Rojhilatê” û “Rojhilata Başûr” bi nav dikirin, radiwestiyan; zilm û zordestiya li wan

deran û derd û êşa gel radixistin ber çavan.

Ev xebat û hewldan, bi awakî giştî tesîrên pozîtîf li ser geşbûna şiyarbûna neteweyî û pêşketina tevgera kurdî dikirin. Dengê şoreşa Kurdistanê Iraqê jî, di vî warî de tesîrên erênî dikir; hevî û moralê milletê Kurd geştir dikir. Dewleta Tirkîyeyê û nîjanperestên tirkan jî, ji vî warî û pêşketina tevgera kurdî gelekî nerehet dibûn. Ji ber vî yekê jî, wan bi dijwarî êrîşî ser neteweyê kurd, siyasatvan, nivîskar, welatparêzên kurdan dikirin. Qedexkirina kovara "Yeni Akış"ê û girtina nivîskarên wê, antî propoganda û dijminatîya nîjadperest û faşîstên tirkan û nivîsên di kovarên "Ötüken" û "Millî Yol"ê de, tenê çend nimûneyên berbiçav yên wê zilm û zordestiya kolonyalistin tirk bûn.

Ev dijminatî û êrîşên li dijî milletê Kurd bû sedemê ku xwendekar, rewşenbîr û welatparêzên kurdan bi awakî tevgerî xwe biparêzin û li hemberî van helwest û kiryanan bêdeng nemînin. Belavoka 19 komeleyên xwendekarên ji wîlayetên Kurdistanê ya li dijî nivîsa nîjadperestê tirk Nihal Atsız û ji çaralîyên bajarên Kurdistanê bi telgrafan protestokirina wê zihniyetê bû mizgîna çalakîyên hevbeş yên neteweyê Kurd. Ew çalakî û hewldan, di amadekirina Mitîngên 1967an de, roleke taybetî list.

## "Mitîngên rojhilat û rojhilata başûr"

"Mitîngên Rojhilat û Rojhilata Başûr" di 13. 8. 1967an bi Mitînga Silîvanê dest pê kirin û bi Mitînga Ankarayê ya di 18.11.1967an jî dawî hatin. Di nav wê demê de, heft mitîng hatin amade kirin. Ev mitîng berî damezrandina "Devrimci Doğu Kültür Ocakları- DDKO"yê hatibûn çekirin. Di îdeanameya Dadgirê Leşkerî yê Mahkemeya Fermendarê Îdareya Awarte ya Wîlayetên Diyarbekir û Sêrtê de ku di 23ê çiriya pêşîna 1971ê de hatiye amade kirin, li ser tarîx, komîteyên amadekar, beşdarî û kesên ku di van mitîngan de peyivîne de, weha hatiye nivîsandin:

### 1- Mitînga Silîvanê:

Di vî mitînga ku di 13.08.1967an de hatiye çekirin de, bi texmînî 1500-2000 kes beşdar bûne. Weke komîteya amadekariyê Mehdi Bilici, Niyazi Tatlıcı, İsmet Özcan muraceat kirine. Di vî mitîngê de Tarık Ziya Ekinci, Sait Elçi, Edip Karahan, Turgay Budak, İdris Arıkan, Mahmut Koçkaya, Nevzat Nas, Mehdi Bilici, Said Bektaş, Mustafa Karacadağ, Talat İnanç, Mehmet Can, Şemsettin Polat, M. Şerif İssı, Nihat Sargin, Fevzi Dağlı, Osman Aydın, M. Ali Aslan, Mehmet Yağmur axaftinên cûrbecûr kirine.

### 2- Mitînga Diyarbekirê:

Di vî mitînga ku 3.09.1967an de hatiye çekirin de, Necip Başak, M. Şerif

Issı, Talat Inanç, Mustafa Karacadağ weke komîteya Amadekariyê muraceat kirine. Di mitîngê de; Tarık Ziya Ekinci, Sait Elçi, Edip Karahan, Turgay Budak, İdris Arıkan, Bahri Koçkaya, Nevzat Nas, Kemal Burkay, İslam Azizoğlu, Adil Rastgeldi, Mustafa Düşünekli, Necip Başak, Nurettin Yılmaz, Tahir Ökten, Huseyin Kiraz, Hasan Akkuzu, Yahya Bozkurt, Cahit Bilgen, Yunus Kavak, A. Kadir Yazıcıoğlu di lehê kurdperestiyê û îdeolija çep de axaftin kirine.

TÎPê xwestiyê ku vê mitîngê li ji tevayê wîlayetên Rojhilatê û Rojhilata Başûr bike mal û belav bike; lê ji ber ku teşkilatên din bêdeng mane, dev ji vê fikra xwe berdaye, hewl daye ku mitîngê ji ciwanan re bike mal. Tê dîtîn ku bi kesên ji derve hatine, bi texmînî 3000- 3500 kes beşdar vê mitîngê bûne.

### 3- Mitînga Sêwrekê:

Komîteya amadekar ya vê mitînga ku di 24.09.1967an de hatiye çêkirin, ji Mustafa Düşünekli, Hamza Kaynak û Cemal Karahan pêk hatiye.

Hatiye tespît kirin ku ji navçeyên Riha, Silvan, Wêranşehr, Diyarbekir, Lice, Hilwan (Curnê Reş), Mêrdîn, Dêrik, Kızıltepe (Tilermenê), Sêrt, Batman, Tunceli (Dersim), Bingol (Çepexûrê), Genç (Dara Hênê), Bidlîs û Tatwanê nûner hatine vê mitîngê. Li meydana mitîngê bi qasî 1000- 1300 kes civiyabûn. Yê di mitîngê de peyivine jî Tarık Ziya Ekinci, Sait Elçi, A. Kadir Kadırağagil, İdris Arıkan, Bahri Koçkaya, Kemal Burkay, İslam Azizoğlu, Adil Rastgeldi, Mustafa Düşünekli, Sadık Eren, Behice Boran, Nevzat Sağniç, Kemal Fevzi Bilgin, Himet Buluttekin, Ahmet Kotan, Cavit Coşkun ne (971-171 Dosya Esasî).

### 4- Mitînga Batmanê:

Di vê mitînga ku di 8.10.1967-an de hatiye çêkirin de, bi mirovên ji wîlayet û qezayên derdorê hatine, bi texmînî 2000- 2500 kes beşdar bûne. Weke Komîteya Amadekar, A. Kerim Ceylan, İbrahim Ramanlı, Haydar Azizoğlu, İhsan Ekinci, Sabri Yıldız muracat kirine. Di mitîngê de Tarık Ziya Ekinci, Davut Özkan, Münir Öztürk, İdris Arıkan, Nevzat Nas, İslam Azizoğlu, Cemil Aygün, Mustafa Düşünekli, Behice Boran, Nevzat Sağniç, Veysi Baykara, Nebil Oktay, Haydar Koyuncu, Tahir Sakin, Kemal Bandirli, M. Ali Aslan, Tahsin Ekinci, Haydar Azizoğlu, A. Kerim Şerefhan, M. Sıraç Bilgin, İ. Hakkı Yücel peyivine.

### 5- Mitînga Tunceliyê (Dêrsimê):

Di vê mitînga ku di 15.10.1967-an de hatiye çêkirin de, bi mirovên ji wîlayet û qezayên derdorê hatine, bi texmînî 1500 kes beşdar bûne. Weke Komîteya Amadekar; Kemal Burkay, Kalman Yüksel, Hasan Aydın muraceat kirine. Kesên ku peyivine jî Tarık Ziya Ekinci, Kahraman Ataç, İsmail Keskin, Dursun Söylemez, Bahri Koçkaya, Şaban Erik, Kemal Burkay, Ali Karıcı,

Mustafa Düşünekli, Sabit Eren, Kalman Yüksel û Ecdel Cineli ne.

#### 6- Mitînga Agriyê (Qerekoseyê):

Di vê mitînga ku di 22.10.1967-an de hatiye çêkirin de, ji wîlayet û qezayên cihê kesên ku kurdperest tên naskirin beşdar bûne. Kesên peyivîne; Tarık Ziya Ekinci, M. Ali Aybar, İsmail Keskin, Turgay Budak, Ahmet Aras, Naci Kutlay, Kemal Burkay û Behice Boran ne.

#### 7- Mitînga Ankarayê:

Di vê mitînga ku di 18.11.1967-an de hatiye çêkirin de, bi texmînî 350- 400 kes beşdar bûne. Piraniyek mezin ya beşdaran ji xwendekarên Rojhilatê û Rojhilata Başûr pêk hatibû. Li gor çavnêriya ku hatiye kirin; ev xwendekar sempatîzanên TÎPê bûn û di mitîngê de hewldane ku beşdaran ber bi bêqanûniyê bikêşîne. Kesên di mitîngê de peyivîne, M. Sıraç Bilgin, Nevzat Nas, Hacı Tahir Kızılkaya, Turgay Budak, Kemal Fevzi Bilgin, İdris Arıkan, Mahmut Esat Aslan, İbrahim Şahin, İskan Azizoglu, Nezir Şemikanlı û Mustafa Düşünekli ne (3).

Li hemberî van mitîngan, bi qasî 40 komele û rêxistinên rast û nîjadperest yên tirkên jî belavokeke hevbeş belav dikin û didin diyar kirin ku *“bi çi awayî dibe bila bibe, em dê her gav li dijî zihniyeta hewl dide ku welêt perçe bike, rawestin”*. Di 12.11.1967an de, ji aliyê Komeleyên Esnafan, Komeleyên Têkoşînê yên li Dijî Komunîzmê, Komîteya Birêvebir ya Yekitiya Neteweyî ya Xwendekarên Tirkan ya Erziromê û Yekitiya Mamosteyên Neteweperest li Erziromê bi navê *“Anadolu Şahlanış Mitingi”* mitîngê hate çêkirin (4).

Di dîroka nêzik ya tevgera Kurdîstana Bakur de, cihekî gelekî girîng û taybetî yên van mitîngan hene. Care yekem bû ku kurdên Kurdîstana Bakur bi vê berfirehiyê jî ji her çar aliyên Kurdîstanê beşdarî çalakî û tevgerê weha êşkere û demokratîk dibûn. Ev tevgerê muxalefetî ya girîng bû. Di rastiya xwe de, hejmara beşdarên van mitîngan, ji hejmarên ku di wê îdeanemeyê de hatiye nivîsandin gelekî bêtir bû. Teva ku giraniya beşdaran ji rewşenbîr, gundiyan feqîr, karker û xwendekarên kurdan pêk dihat jî, ji her beşên civatê, ji her çîn û tebaqeyan însan beşdarî van mitîngan bûne. Heta hinek xwedîerd û dewlemendên kurdan ku li derdora xwe weke axa û serokeşîr dihatin naskirin jî ya rast û rast beşdarî van mitîngan bûne ya jî bi name û telgrafan piştgiriya xwe dane diyar kirin. Ev jî dide diyar kirin ku ji her beşên civatê welatparêzên kurdan bi ruh û hesteyekî neteweyî beşdarî vê xebat û çalakiyê bûne.

Ew kesên ku ev mitîng amade dikirin, kesên xwenda û şareza bûn. Wan rewşa têkiliyên siyasî, civakî, aborî û kulturî yên Tirkiyê û Kurdîstanê, sedemên paşdemayîn û paşdehiştina Kurdîstanê ji nêzik ve dizanîbûn. Wan dixwastin ku di nav sînorên qanûna bingehîn de û bi qasî ku bikaribin vê



rewşê ji gelê Kurd re bidin diyar kirin, bala gel bikşîne ser van pirs û pirsgirêkan. Bi çalakîyên weha hevbeş û girseyî gelê Kurdistanê bikşîne nav xebata siyasî. Ji ber ku çavên gelê Kurdistanê ji demeke dûr û dirêj ve bi zilm û zordariyeke hov, bi qirkirin û sirgûnên berfireh hatibûn tirsandin. Dewleta Tirkîyeyê bi hemû hêz û îmkânên xwe dixwast gelê Kurd asîmle bike û wî ji kurdariyê dûr bike. Rewşenbîr, welatparêz û siyasethavên kurdan jî dixwastin bi van mitîngan bêtir xwe bighêjinin gelê Kurd û wî di warê neheqiyên ku lê dibûn û sedemên van neheqîyan de şiyar bike.

Di van mitîngan de, bi giranî li ser newekheviya Tirkîyeyê û “Rojhilatê û Rojhilata Başûr”, paşdehiştina heremên kurdan û sedemên vê yekê dihate rawestandî; bêtir daxwazên aborî, çêkirina dibistanan û rîyan, çareserkirina pirsên tendirûsî derdixistin pêş. Herweha di axaftinan de, li ser zilm û zordestiya li van herêman, nasnameya kurdî, sirgûna 55 axa û navdarên ji Kurdistanê û weşanên nijadperestên tirkan, weke kovarên “*Ötüken*” û “*Millî Yol*”ê ku dijminatîya milletê Kurd dikirin, dihate rawestandî. Axtewevana dixwastin bi mînakên weha taybetî, bala milletê Kurd û raya giştî bêtir bikşîne ser pirs û pirsgirêkan.

Hinek şîarên ku di van mitîngan de dihatin gotin û nivîsandin ev bûn:

- *Yên Rojhilatî ji bo mafên xwe yê qanûnî bixebitin!*
- *Bi daxwazkirina mafan, yekîtî xerab nabe.*
- Armanca me pêkanîna biratî, wekhevî û dilgeşiyê ye.
- Em bi hemû têkoşer û gelên ku li dijî faşîzmê û emperyalîzmê şer dikin re ne.
- Ji Rojavayê re medeniyet, ji Rojhilatê re cehalet.
- Em cendirman naxwazin, mamosteyan dixwazin.
- Em qereqola naxwazin, dibistanan dixwazin.
- Em bi Rojhilat û Rojava tune ye hatin xapandin.
- Çarenûsa Rojhilatê birçîbûn, bêkarî û kêmdîtin e.
- Rojava welat e, ya Rojhilat çi ye?
- Yê Rojhilatî wê bi misogerî mirovatî û hevweletîya xwe bide qebûl kirin.
- Ji Rojavayê re fabrîqe û rê, ji Rojhilatê re qomando û qereqol.
- Em qondaxan naxwazin, destên alîkariyê dixwazin.
- Yê Rojhilatî şiyar bibe!
- Demokrasî li ku derê ye?
- Di şer de yê Rojhilatê lêdixe, di aşîtiyê de ledanê dixwe.
- Rojhilat ne cihê sirgûna ye.

- Petrol, sifir, krom li cem me, jiyana li cem we.
- Em ê jî rojekê bikenin.
- Li min binere hevalo!
- Yekitî bi wekheviyê dibe.
- Yê Rojhilatî şiyar bûye, wê doza mafê xwe bike.
- Maf nayê dan, tê stendin.
- Rojhilat ne mustemleke ye!
- Ma heta kengî xwînmijandina maddî û manewî!
- Ji zimanê me re hurmet bikin!
- Bese sêkuçikiya axa, şêx û kompradoran!
- Yên ku dixwazin bera rojhilatîyan bidin, wê ew bê qewirandin.
- Tu hêz nikara qêrîna me ya bi heq bitefîne.
- Zordestiya we ya aborî û siyasî, wê nikaribe agirê hundurê me bitefîne.
- Dev ji miameleya dêmaritiyê berdin!
- Em azadiya qanûnî, azadiya mirovî û azadiya xwendinê dixwazin.
- Em veqetandinê naxwazin, wekheviyê dixwazin.
- Dev ji peyvê berde, li Rojhilatê binere!
- Ji Rojavayê re îmar, ji Rojhilatê re îstismar (5).*

Bi van şîaran, amadekarên van mitîngan dixwastin ku ji karbidestên dewletê re bidin diyar kirin, ew perçebûn û veqetandinê naxwazin; armanceke wan ya siyasî weke kurdperestiyê tune. Tenê ew dixwazin ku hinek mafên di qanûna bingehîn de hatine garantî kirin, bi dest xînin û newekheviya ku di nav navçeyên Rojhilatê û Rojavayê berteraf bikin.

Mehdi Zana, di pirtûka xwe ya bi navê *“Bekle Diyarbakır”*ê de, li ser amadekirina mitînga Silivane û rewşa wê demê jî rawestiyaye. Li gor agahdariyên ku ew dide; wî bi navê *“Zana”* belavoka mitîngî hazir kiriye û li wîlayet û qezayên derdorê yê Kurdistanê belav kiriye. Hemû teşkilatên wîlayet û qezayên derdorê yê partîyan, ji bo beşdariya mitîngê dawet kiriye. Ji ber belavkirina wê belavokê, çend kes hatine girtin û polis dest bi zilm û zordariyê mezin kiriye. Yek ji wan kesên ku di komîteya amadekirina mitîngê de bû, ji ber zordestiya polîsan ji Silivane xwe daye alî û li Mûşê li Mehdi Zana rast hatiye. Ew li ser rewşa li Silîva, ji Mehdi re weha dibêje:

*“Birayo, li Silivane qiyamet radibe. Em hemû reviyane. Polis terorê dibarîne; zordestî nayê gotin! Herkes ketiye tatoleka xelaskirina canê xwe. Me jî înzayên xwe ji arzûhala serlêdanê paş ve girtin, tu tenê maye. Ez niha li vê derê li cem merivên xwe dimînim, rewş gelekî xerab e”.*

Ji ber ku komiteya amadekariya mitîngê ya berê ji holê rabûbû; ji Mehdi Zana, Mele Mahmut Okutucu û Şêx Mahmut Yeşil komiteyek nû tê amadekirin û qaymîqam bi wî awayî destûra amadekirina mitîngê dide. Li ser rewş û beşdariya mitîngê jî Mêhdi Zana weha dinivîse:

“Piştî du rojan herikandina beşdarên mitîngê dest pê kir. Ji her navçeyên însan dihatin. Di nav kesên dihatin de, mele û xwendekarên unîversîteyê di giraniyê de bûn. Ji nav ciwanên unîversîteyê çend kesan, ji sibeha mitîngê, li ser mitîngê dest bi îtirazan kirin. Ji bona ku yên mitîng amade kiribûn em bûn, wan ger digotin: ‘Ev mitînga Kurdan e, em naxwazin çep werin mohra xwe li vê mitîngê xîne’. Min jî got ku Min ji navendên hemû partiyan re, ji hemû parlamenterên Rojhilat û Rojhilata Başûr re û herweha ji hemû teşkîlatên Rojhilat û Rojhilata Başûr yên partiyan re dawetname şand. Kesek nehat. Tenê TÎPê dawetiya me qebûl kir. Ji bo ku hatine, wê biaxivin’ û min ew pêşneyara wan bi zimanekî misoger red kir.

*Ji rojnamevanan jî kes hatibûn. Şîarên mitîngê ev bûn: “Bese zilm û xwînmiyî”, “Ji erdên bi mayin, ber bi fabrîqeyan”, “Bese miamela zirewladîyê”, “Zarokên Mezra Botan Şiyar Bibin”. Silûvan weke ku hatibe dagir kirin. Her der bi beşdarên mitîngên tije bibûn. Mitîng bi axavtina min ya vekirinê dest pê kir. Piştî min, Tarîk Ziya Ekinçi, M. Ali Aslan, Nihat Sargin, Sait Elçi, Osman Aydın, Mustefa Düşünekli peyivîn” (6).*

Dadgirê Leşkerî yê Dadgeha Fermandarê Birêvebirina Awarte ya Wîlayetên Diyarbekir û Sêrtê, Sait Dabak li ser armanca çekirina van mitîngan radiweste û di îdeanameya xwe de weha dinivîse:

“Mitîngên Rojhilatê û Rojhilata Başûr ne weke reaksiyonek ji ber tevgerek diyar û ji nişka ve derketiye holê. Gava ji nêzîk ve lê bê nerîn, wê bê dîtîna ku armanca rastî ya van mitîngên Rojhilatê û Rojhilata Başûr, di binê armancên êşkere de hatiye veşartin. Li gel partiyek siyasî, di nav grûbên cûr be cûr de, di warê daxwazên armanca dawîya dawîn de, hinek newekhevî heye.

Bi qasî ku ji dest hatiye, ji bona menfaetên xwe yên siyasî TÎPê ev rewşa hazir îstismar kiriye û bi kêmanî hewldanek hesabê hîlbijartinê kiriye. Kesên ku armanca wan damezrandina Kurdistaneke serbixwe ne jî, hewl dane ku ji bo armanca xwe vê partiyê weke wasiteyekê bi kar bîne. Digel vê yekê, di tevger û helwestên kesên kurdperest (komunîst- nasyonalist) de jî cihê tîna dîtîna. Ji bona têgihiştina van hemû tiştan, wê feyde tê de hebe ku armancên van mitîngan ji nêzîk ve bête analîz kirin...”

### **a) Armanca diyar**

Ji belavokên hatine belav kirin û agahdariyên hatine kom kirin, tê zanîn ku armanca diyar ya van mitîngan, di du xalên bingehîn de hatiye civandin.

1- Daxwaza li hemberderketina nerîn û îdeayên li ser hevvelatîyên me yên

ku li Rojhilatê dijîn ku li cem rewşenbîrên Rojhilatê hêrsketinek mezin çêkiribû.

2- Rojhilat bi zanebûn paşde hatiye hiştin. Di planê pênc salîya duyem de dahî eleqeyek pêwîst nehatiye dîtin, îhmalî heye. Nîşanên ku bi herêmpereştî tê hereket kirin hene û divê ev helwesta bêrê û kirêti, bête dîtin.

### **b) Armanca rastî**

Ji xebatên di pêvajoya amadekirina mitîngan û ji helwest û axaftinan diyar dibe ku du eniyên armanca rastî ya amadekirin û pêkanîna mitîngan hebûn. Bi îfadeyek hîn vekirîtir, armanca heqîqî ya mitîngan;

1- Propogandeya îdeolojiya çep.

2- *Di nav girseya xelkê de geşkirin û bicîkirina bîr û bawerîya kurdperweriyê”* (7).

Di van mitîngan de, hevalbendên PDKTyê û TIPê bi aktîfî cih girtine. Sekreterê PDKTyê Sait Elçî bi xwe di mitîngên Silîvan, Diyarbekir û Sêwrekê de peyiviye. Herweha Serokê giştî yê TIPê Mehmet Ali Aybar û endamên komîteya birêvebir Behîce Boran û Tarîk Ziya Ekinci jî beşdarî van mitîngan bûne û axaftin kirine. Di axaftinên ku di van mitîngan de dihate kirin de, bi awakî zelal derdiket holê ku di warê pîrsa kurdî de, nerînên hinek endamên komîteyên amadekar yê mitîngan û welatparêzên din yê kurdan û yê berpîrsiyarên TIPê ji hev cûda bûn. İsmail Beşikçi di wê baweriyê de bû ku înterensa TIPê ya li hemberî van mitîngan, bûyereke geleke girîng û pozîtîf bû:

*“Li gor bawerîya min nîşandana întereseya TIPê ya ji mitîngan re, bûyereke pozîtîf bû. Ji ber ku hinek komîteyên amadekar yê mitîngan, hewl dane ku bi Mitîngên Rojhilatê ji raya giştî ya tirk re bide nîşan dan ku pîrsek Rojhilatê ya serbixwe heye. Lê kesên navdar yê TIPê weke Mehmet Ali Aybar, Behice Boran û Tarîk Ziya Ekinci digotin ku pîrsek serbixwe ya Rojhilatê tuneye, divê pîrsa Rojhilatê bi awakî misoger di nav pîrsa giştî ya pêşvebirina Tirkiyeyê de bê çareser kirin...”*

İsmail Beşikçi di warê awaya lênerîna pîrsa ”Rojhilat” de jî, piştgiriya siyaseta TIPê ya li jor dike û weha dibêje:

*“Jixwe armanc, çi li Rojhilatê û çi ji li Rojavayê be, azadkirina gelê kedkar û afirandina hebûna wî bû. Ji bo ku pîrsa Rojhilatê ne weke pîrseke serbixwe, weke pîrseke di nav pîrsa giştî ya pêşvebirina Tirkiyeyê de dihate pêşkêş kirin; ev pîrs ji bikaranîna hinek siyasatên bi meqsed yê weke kurdperestiyê, hate rizgar kirin û li ser bîrûbawerî û bingehekî rast hate bi cih kirin”* (8).

Karbidestên dewletê û partiyên siyasî yê Tirkiyê, Mitîngên Rojhilatê ji nêzîk ve taqîb dikirin. Piştî mitînga Sêweregê hinek kesên ji doza 49an cezayên sirgûnê jî girtibûn, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin û ew şandin

cihê sirgûnên wan. Bi vî awayî xwestin ku hinek rewşenbîr û welatparêzên kurdan ji van xebat û çalakîyan bi dûr xînin. Walî, qaymeqam û polîsan ji komîteyan amadekar yê mitîngan re gelek asteng û zahmetî derdixistin. Ji bona kesên ji derve beşdarî van mitîngan nebin, rîya beşdaran dibirîn. Herweha ji bo ku bala xelkê ji mitîngan bi dûr xîne, musabeqeyeyên taybetî yê navê û hesabana amade dikirin. Agahdariyên taybetî ji memûran re dihatin şandin ku ew beşdarî mitînga nebin û li kesên diaxivin guhdar nekin. Di mitîngan de, bi awakî berfireh polîs û cendirme dihatin bi kar anîn. Di wê dema ku mitîngên Rojhilatê hîn dom dikirin; "Türkiye İşçi Partisi" (TİP), di serokatiya serokê giştî Alpaslan Türkeş de "Cumhuriyetçi Köylü Millet Partisi" (CKMP), di serokatiya sekreterê giştî Bülent Ecevit de "Cumhuriyet Halk Partisi" (CHP) û "Adalet Partisi" (AP) her yek bi heyeteke taybetî dest bi gerên wîlayetên Kurdistanê kirin. Hukûmeta APyê ji destpêkê de bi awakî taybetî ev mitîng taqîb dikir û kesên ev mitîng amade dikirin bi "îxaneta welêt û perçekirinê" gunehar dikir. Di civînên Komîteya Ewlekariya Neteweyî de jî bi taybetî li ser mitîngên Rojhilatê û bûyerên li Kurdistanê çêdibûn, hatiye rawestandî (9).

Di bersîva îdeanameya DDKOyê de, li ser encamên mitîngên Rojhilatê yê pratîk weha hatiye rawestandî:

"1- Rewşenbîrên Rojhilatî li dijî feodalên weke axa, şêx, serokeşîran û sîstema sîtemkariyê ya ku wan pêkanîne ne. Ew di vê baweriyê de ne ku çînen serdest yê Rojhilatî bi hevkarîya çînen serdest yê Rojavayî keda gelê Kurd dixwin.

2- 'Siyaseta surgûnê' ya ku hukûmeta Cumhûriyetê sê caran pêk aniye, ne xwediyê bingeheke zanyarî ye; berhemê helwesteke şovenîst e. Rewşenbîrên Rojhilatî li dijî vê helwestê ne.

3- Ligel paşdemayîna Rojhilatê Anadoluyê, pîrseke wê ya etnîkî jî heye.

*Ji xwe, piştî mitîngên Rojhilatê zanebûneke berbiçav dest pê kiriyê û roj bi roj bi awakî berfirehtir pêşve çûye. Di 16ê sibata 1969an de, li Entabê amadekirina 'mitînga şerê li dijî emperyalîzmê', di 22ê sibata 1969an de li Meletê 'mitînga bêkarî, birçîbûn û şerê li dijî emperyalîzmê', di 17ê adara 1969an de li Qersê amadekirina 'meşa gundiyan', di 13ê nîsana 1969an de li Diyarbekirê 'mitînga protestokirina pêşneyara parastina nîzama qanûna bingehîn û azadiyê', di 19ê nîsana 1969an de li Agriyê amadekirina 'mitînga li dijî bêkarî û şer' encamê afirandina potansiyela mitîngên Rojhilatê ne" (10).*

## Têbinî û çavkanî

(1) Ev broşûra ku li ser navê Av. Faîk Bucak û Kinyaz Kartal hatiye nivîsandî, di pirtûka İsmail Beşikçi de hatiye weşandin. Binere: İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni, Sosyo-

- Ekonomik ve Etnik Temeller, cild 2, Yurt Kitap yayınları, Ankara, Sibata 1992 r. 463- 468.
- Ji bo bahsa surgûna 55an, binere: Yeni ve Yakın Çağda Kürt Hareketlerî, Weşanên Jîna Nû, Swêd, Îlona 1991, r. 307- 308.
- Îsmail Beşikçi, Doğu Mitingleri'nin Analizi (1967), Yurt Kitap yayınları, Ankara, adara 1992, r. 65.
- (2) Binere: Sosyalizm ve toplumsal Mücadeleler Ansiklopedisi, İletişim Yayınları, cild 7, r. 2116.
- (3) Îsmail Beşikçi li ser analîza van mitingan bi navê “Doğu Mitingleri' nin Analizi -1967” pirtûkek weşandiye. Hinek tarîxên di Îdeanameyê û yên di pirtûka Îsmail Beşik çi de, hevdu nagrin. Li gor ku di pirtûka Îsmail Beşikçi de hatiye nivîsandin: Mitînga Diyarbekirê di 16. 09. 1967an de, mitînga Silvanê di 24. 09. 1967an de, mitînga Sêweregê di 1. 10. 1967an de û mitînga Ankarayê jî di 19. 11. 1967an de hatine çekirin.
- Ji bo vê bahsê binere: Îsmail Beşikçi, Doğu Mitingleri' nin Analizi (1967), Yurt- Kitap Yayınları, Ankara, adar 1992, r. 15.
- Li gor agahdariyên taybetî yên M. Siraç Bilgin didin: Komîteya Amadekirinê ya Mitînga Ankarayê jî M. Siraç Bilgin, Nusret Kılıçaslan, Mehmet Demir, Mevlut Özarpacı, serokê Komeleya Sêrti ya Ankarayê û hevalêkî jî Rihayê ku navê wî nedihat bîrê, pêk hatibû.
- (4) Ji bo vê bahsê binere: Îsmail Beşikçi, b.n.d, r. 15, 70- 71.
- (5) Ji bo vê bahsê binere: Îsmail Beşikçi, b.n.d, r. 24- 25. Sosyalizm ve Toplumsal Mücadeler Ansiklopedisi, cild 6, r. 2129- 2130.
- (6) Binere: Mehdi Zana, Bekle Ey Diyarbakır, Doz Yayınları, r.92- 93.
- Li gor ku di îdeanameyê de hatiye nivîsandin: Komîteya Amadekariya mitîngê jî Mehdi Bilici (Zana), Niyazi Tatlıcı û İsmet Özcan pêk hatiye; kesên ku di mitîngê de peyivîne jî ev bûn: Tarık Ziya Ekinci, Sait Elçi, Edip Karahan, Turgay Budak, İdris Arıkan, Mahmut Koçkaya, Nevzat Nas, Mehdi Bilici, Said Bektaş, Mustafa Karacadağ, Talat İnanç, Mehmet Can, Şemsettin Polat, M. Şerif İssı, Nihat Sargin, Fevzi Dağlı, Osman Aydın, M.Ali Aslan, Mehmet Yağmur.
- (7) Îdeanameya Dadgirê Leşkerî yê Dadgeha Fermandarê Birêvebirina Awarte ya Wîlayetên Diyarbekir û Sêrtê ku di 23ê çiriya pêşin ya 1971ê de ji aliyê Sait Dabak ve hatiye amade kirin. Binere: Diyarbakır İddianamesi, weşanên Ronahî, Tebax 1972, r. 12.
- (8) Binere: Îsmail Beşikçi, b.n.d, r. 68.
- (9) Ji bo dirêjaya vê bahse binere: Îsmail Beşikçi, b.n.d, r. 64- 72.
- (10) DDKO Dava Dosyasi, Komal basım yayım dağıtım, r. 240.

# Di medya tirkî de karîkaturîzekirina serhildana (1930î)

Rohat Alakom

Di navbera salên 1925-1940î de li Kurdistanê Tirkîyê gelê Kurd zordestî, lêdan, ezîyet û îşkenceyên gelek mezin dîtine. Ji cîh û warê kal û bavên xwe bi darê zorê hatîye dûr xistin û jê re rîya sirgûnê hatiye xuya kirin. Bi hezaran malbatên Kurd ber bi Rojavaya Anadolîyê hatine sirgûn kirin. Di navbera van salan de sê serhildanên Kurdan yê mezin pêk hatine, wek Serhildana Şêx Seîd 1925, Serhildana Araratê 1930, Serhildana Dersimê 1937. Ji bo Kurdên Tirkîyê periyoda zordestiyê ya herî mezin bêgum ev periyod e. Dewr, dewra Mistefa Kemal Atatürk e. Ew, di navbera van salan de serokkomarê Tirkîyê ye.

Van zordestî û êrîşên li dijî Kurdan bi metodên mayîn ve jî berdewam kirine. Bi taybetî medya Tirkî di vî warî de roleke mezin lîstîye û wek hêzekê li dijî gelê Kurd cîh girtîye. Di van salan de li hemberî Kurdan di medya Tirkî de sefereke vir-derewan û reşkirinê dest pê kirîye. Navê Kurdan wek rêbir, talanker, eşqiya û mirovkuj derketîye. Medya Tirkî hertim li ba dewletê cîh girtîye, nêzîkî hêzên resmî bûye û tu wextî nebûye hêzeke serbixwe. Ev jana medya Tirkî heta rojên me yê îroyîn jî berdewam kirîye. Dema carina dengên serbixwe peyda bûne, ew deng di cih de hatine qedexekirin û fetisandin.

Dem a min li ser rêxistina Xoybûnê û serhildana Araratê lêkolînek amade dikir, car caran min medya Tirkî raçav dikir ka bizanibim gelo li ser vê babetê medya Tirkî çawa tevgeriyaye (hereket kirîye). Min hejmarên rojnameyên wek *Milliyet*, *Vakit û Cumhuriyet* yê havîn û payîza sala 1930î di ber çavan re derbas kirin, tiştê ku bala min kişand zêdebûna hejmara karîkaturên li ser Kurdan bûn. Min dît ku di rojnameyên Tirkî de gelek karîkaturên cihê cihê li dijî serhildana Araratê hatine çêkirin û di van rojnameyan de hatine

weşandin. Hejmara wan gelek zêde bû. Ji ber kêmbûna îmkana kopîkirinê min mecal nedît van hemû karîkaturan kopî bikim, min tenê bi qasî 15 heban kopî kir. Van karîkaturan ji nivîsên ser Kurdan zêdetir bala min kişand. Ji ber ku gelek tişt bi heşkere li ber çavan bûn.

Di van karîkaturan de motivên gelek cihê cihê hatine bi kar anîn. Motîva here balkêş motîva êrîşkarî û mîlîtarîzmê ye. Li alîkî leşkerekî Tirk yê hêzdar, mezin û çekdar, li aliyê din komek Kurd hatine dîl kirin (esîr bûne), bêhez in û tîn kuştin, angorî mesaja karîkaturê êdî koka Kurdan tê anîn. Êrîşkarî di van karîkaturan de motîva herî balkêş e û di gelek karîkaturan de hatîye bi kar anîn. Motiveke nêzîkî vê motivê jî motîva "paqijkirinê" ye. Di van karîkaturan de tu mêze dikî leşkerekî Tirk gêzîke mezin di dêst de Kurdan paqij dike, koka wan tîne û ji nav xwe davêje.

Çawa tê zanîn di serhildana Araratê de balafirên Tirkîyê roleke mezin listine. Çend heb ji wan ji aliyê Kurdan ve hatine xistinê. Di karîkaturên Tirkî yên van salan de temake din jî êrîşkirina balafiran û reva Kurdan e.

Di karîkaturên van salan de motîva herî balkêş û bingehîn ku li ber çavan dikeve, Kurd wek leyîstokê Îran, Suriyê û Iraqê hatine nîşandan. Bi vî tehrî daxwazên Kurdan yên etnîkî û netewî hatine veşartin, Kurd wek sîyarên hêzên mayîn di van karîkaturan de hatine bi cîh kirin. Angorî karîkaturan hefsarê Kurdan hertim di destê devletên mayîn de ne, bi taybetî jî Îran. Mirov van karikatûran wek karîkaturên berevajîkirinê jî dikare rave bike. Ji ber ku realîte hatîye veşartin û her tişt hatîye berovajî kirin.

Vê periyoda karîkaturîzekirina Kurdan bêguman îmajeke nebaş li Tirkîyê di derbarê Kurdan de peyda kirîye. Bi saya van karîkaturan sûretekî Kurdan yê şaş û xerab di hişê xwendevanên Tirk de cîh girtîye, vê yekê bandora xwe ya xerab heta niha jî berdewam kirîye. Wek dokumentên dîrokî ji van karîkaturan çend heban em li vir di kovara *Çira*'de careke din diweşînin. Bi saya wan, xwendevanên Kurd dikarin xwe dirêjî salên 1930î bikin û propaganda van salan ya li dijî Kurdan baştir bi çavê xwe bibînin. Ne tenê ev karîkaturên di derbarî serhildana Araratê de, him ev serhildana, him jî karîkaturên di derbarî serhildana Şêx Seîd û serhildana Dersîmê de, ev hersê serhildanan bi tevayî û bi metodekî rûberîhevkirinê (danberhevandinê) dikarin bibin babeta lêkolîneke gelek fireh û balkêş. Ev kar û bara wusan dixuye ku dikeve ser milên hunermendên Kurd an jî kesên ku bi dîroka hunerê ve mijûl dibin.



# nuriyet

MÜDDET:	TÜRKİYE İÇİN	HARİ
Seneligi	1400 Kr.	270
6 Aylığı	750 Kr.	145
3 Aylığı	400 Kr.	80
Nüshası her yer		
= 5 Kuruştur		

## nde İmha Edildi

### tebliği

eki siyasi ve  
n bulmuştur

er bulunmayan yerlerde  
rimız müdafaa etti

ncılar  
ma di-  
erinin  
mın-  
ilhas-  
yamı  
ir.  
daki

lahi-  
rina  
akat  
nden  
esine  
anun  
nuna  
şkeri

kıtaata havale edilmesi za-  
ruri bir hale geldiğinden ted-  
ip ve tenkil için kıtaat 5  
temmuzda harekete başla-  
mış ve 10 temmuz akşamı a-  
silerin tedip ve tenkilini hi-  
tama erdirmiştir.

Hariçten ve dahilden olan asi-  
lerin yekünü 1500 ü geçiyordu.  
İran'ın Halikanlı aşiretinden 20  
kişi Erciş'te ve 60 kişi Zeylan'da  
maktuller arasında olduğu bildi-  
riliyor. Pek çok rüesa ve eşkiya  
kâmilen imha edilmiş ve tahmine  
göre çetelerin az efradı İran'a  
kaçabilmişlerdir.

### Gazi Hz.

Dün Yalova'ya  
avdet buyurdular



Son vaziyetin hulâsası işte budur

### “Zeylân” hâdisesi

İbrahim Tali Bey b  
beyanname neşrett

İki zabıt ve dokuz neferimizin ş  
düştüğü hâdisе nasıl oldu ?

Eşkiyaya yardım  
eden beş köy!



13. 7. 1930

YUNUS NADI

İDAREHANESİ:

Yunus Nadi İdarhanesi  
Telefon: İstanbul Cumhuriyet  
Pasta kutusu: N° 246

Telefon: 2356  
Tahrik müdürlüğü: 2328  
Kıbrıs: 2363, Kızıl Kalem: 2372

# Cumhuriyet

17.7.1930

## İsanımız

ide ve şive hatıralarına dair

Amik Kemal zade  
Ali Ekrem Beyin  
üçüncü mektubu

Yunus Nadi Beyefendiye

Şahitlerim beyim efendim,  
